

K.T.

**ZANÎNGEHA VAN YUZUNCU YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ yê li TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**DI ÇÎROK Û STRANÊN GELÊRÎ YÊN COLEMÊRGÊ DE NASNAMEYA
JIN**

TEZA LISANSA BILIND

HATICE ÜCAR

VAN/2019

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YUZUNCU YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ yê li TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

**DI ÇÎROK Û STRANÊN GELÊRÎ YÊN COLEMÊRGÊ DE NASNAMEYA
JIN**

TEZA LISANSA BILIND

Amadekar

Hatice ÜCAR

Şewirmend

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

VAN/2019

T.C.

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

HAKKARİ HALK MASAL VE ŞARKILARINDA KADIN KİMLİĞİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HATİCE ÜCAR

VAN\2019

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU danışmanlığında, Hatice ÜCAR tarafından hazırlanan “**Di Çîrok Stranên Gelêrî Yên Colemêrgê De Nasnameya Jin**“ adlı bu çalışma, 01/11/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ

İmza: 


ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.


01./11/2019


Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ
Enstitü Müdürü

BİLDİRİM

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği'ne göre hazırlamış olduğum “Di Çîrok û Stranên Gelêrî yên Colemêrgê de Nasnameya Jin” adlı tezin tamamı kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerde erişime açılabilir.
- Tezim sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkelerinde erişime açılabilir.
- Tezimin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.


(Şanenav)

(Hatice ÜCAR)

Teza Lîsansa Bilind

Hatice ÜCAR

Şêwirmend: Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU
2019, IX+170 rûpel

DI ÇÎROK Û STRANÊN GELÊRÎ YÊN COLEMÊRGÊ DE NASNAMEYA JIN

KURTE

Jin, hebûna xwe ji hebûna mirov pê ve şanî dide. Heta gotina hunermend Neşet Ertaş dê bibe vegotîneke rastir. Ew dibêje: ‘jin adem e, zîlam benîadem’.

Ev kirde (subje) ya ku ewqas baş hatiye îfadekirin çawa çêdibe ku di nava civakan de caran di asta duduyan heta caran asta sêyem de jî bona xwe cih nabîne. Mixabin çiqas hunermend, nivîskar, ol, baweriyên felsefî dema dora wê hat, nizanîn ji wê (jinê) çawa bikirana di gelek civakan de di nav jiyana rasteqîn de wek jêmahî jî nayê dîtin. Wekî; namûs, piştkov, bela, malê xelkê hwd tên binavkirin. Lê belê ya rast ew e ku jin e, jiyana e, hevser e, heval e, vîn e, evin e, xwîşk e û dayîk e.

Jin, di jiyana xwe ya rast de van nasnameyên xwe çawa dike û dide jiyandin em dê di xebata xwe de li ser vê bisekinin. Di xebatê de bi hemû wateya xwe ve xwe û nasnameyên xwe yên (jinên) dijîn çawa ku hene, yên nasnameya wan ji wan û bedena wan teng yan jî mezin tên jî dê hebin. Armanca me tenê rewşa hebûna (nasnameyên) wan bi mînak dayîn û dahurankirin e.

Mebesta xebatê ev e ku li herêma Colemêrgê hebûna jin û nasnameyên wê danasîn, bi riya stran û çîrokên gelêrî yên herêmê tene gotin ve dahurankirina van kesayeteya ye.

Ji ber vê jî çil û pênc berhem hatin berhevkerin. Di civakê de jin li her derawayan çawa hatiye watedarkirin dê bînan nîşandan. Li nav civaka xwerû û heta ya ku bi eşîrî ve tê temsîlkerin de rola jinê bi van metnan ve dê bê analîzkerin.

Bêjeyên Sereke: Jina Kurd, Nasname, Avaniya Eşîrê, Çîrok, Çîrokên Gelêrî, Stranên Gelêrî.

Yüksek Lisans Tezi

HATİCE ÜCAR

TEZ DANIŞMANI: Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU
2019, IX+170 Sayfa

HAKKÂRİ HALK MASAL VE ŞARKILARINDA KADIN KİMLİĞİ

ÖZET

Kadın, insanlığın oluşumundan itibaren varlığını göstermiştir. Hatta Neşet Ertaş'ın ifadesi daha doğru olacaktır. Der ki: 'Kadın insandır, erkek insanoğlu.'

Bu kadar iyi ifade edilmiş bir özne nasıl olur da toplumlar içinde bazen ikinci hatta üçüncü düzeyde (sınıf) bile kendine yer bulamaz. Ne yazık ki ne kadar şairler, yazarlar, dinler, diller, felsefeler açısından yeri geldiğinde yere göğe sığdırılmayan kadınlar olsalar da gerçek hayatın içinde çoğu toplumda bir kırıntı olarak bile görülüyorlar. Namus, kambur, bela, elalemin malı vs olarak isimlendiriliyorlar. Hâlbuki kadındır, hayattır, eştir, aşktır, kardeştir, anadır.

Kadın, gerçek hayatta üstlendiği bu kimlikleri nasıl yaşıyor ve yaşatıyor çalışmamızda buna bakacağız. Tam anlamıyla kendini ve kimliğini yaşayanlar da olacağı gibi, kimliği kendisine dar ya da büyük beden olan kadınlar da olacaktır. Amaç sadece varoluş şekillerini irdelemektir, örneklemektir.

Çalışmadaki amacımız Hakkâri'de kadının ve kimliğinin varoluş şekillerini anlatmakla birlikte yörede söylenen masal ve şarkılardaki kadın kimliklerine örnekler eşliğinde analizler yapmaktır.

Bunun için de kırk beş eser derledik. Toplumda kadının hangi pozisyonlarda ve nasıl ifadelendirildiği gösterilecektir. İlk toplumdan tutunda aşiret yapısı içindeki temsillerine kadar, bu metinlerle örnek verilip analizleri yapılacaktır.

Anahtar Kelimeler: Kürt Kadını, Kimlik, Aşiret Yapısı, Masal, Halk Hikayesi, Halk Şarkısı.

M.Sc. /Ph. D. Thesis

Hatice ÜCAR

Supervisor: Assoc. Prof. Dr. Seyit Battal UĞURLU
2019, IX+170 Pages

MASTER'S THESIS
WOMEN'S IDENTITY IN FOLKTALES AND FOLK SONGS OF HAKKÂRİ

ABSTRACT

Since the formation of humanity women have shown their existence. Even Neşat Ertaş's expression would be more accurate. He said "female is human, male is mankind."

How can a subject that was well expressed cannot find a place in societies sometimes even at the second or third level. Al though women have been the subject of poets, writers, religions, languages and philodophy, unfortunately they are not even seen as a crumb in most socities in real life. They called as honor, humpback, trouble and so on. Whereas, women is life, wife, love, sister and mother.

In our study, we will look at how female live these identities she had assumed in real life and how she lived them. There will also be women who have a narrow or large body, as well as those who have experienced themselves and their identity.

Along with explaining the existence of women and their identity in Hakkari, the aim of this study is to analyze women's identities in tales and song in the region.

So, we complied forty-five works. The positions of women in society and how they are expressed will be shown.

Form the first society to the representation within the tribal structure, examples will be given and analysis will be made.

Key Words: Kurdish Women, Identity, Tribal Structure, Tale, Folk Story, Folk Song.

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
NAVEROK	IV
KURTEBÊJIYA PEYVAN	VII
PÊŞGOTIN	VIII
DESTPÊK	1
I. Danasîna Tezê, Rê û Rêbazên Wê	1
II. Lêgerîna Lîteratûrî	3
BEŞA YEKEM: 1. JINA KURD Ê NASNAMEYÊN WÊ	6
1.1. Di Derheqê Colemêrgê De Agahiyên Giştî	6
1.1.1. Avayiya Colemêrgê ya Dîrokî	6
1.1.2. Rewşa Nifûsê	7
1.1.3. Erdnigarî.....	8
1.1.4. Avaniya Aborî.....	8
1.1.5. Avaniya Sosyo-Kultûrî	9
1.2. Jina Kurd	10
1.2.1. Di Qanûnan de.....	10
1.2.2. Di Perwerdehiyê De	11
1.2.3. Di Siyasetê De.....	12
1.2.4. Di Jiyana Xebatê De.....	12
1.2.5. Di civakê de.....	14
1.2.6. Di kultûr û wêjeyê de	15
1.3. Di Colemêrgê De Nasnameyên Jin û Rîtuêlên Pêkhatina Wan	16
1.3.1. Nasnameyên Jin.....	17
1.3.2. Rîtuêlên Pêkhatinê.....	25
BEŞA DUYEM: 2. DI ÇÎROK Ê STRANÊN GELÊRÎ YÊN COLEMÊRGÊ DE NASNAMEYA JIN	30
2.1. Berhemên Berhevkarî	30
2.1.1. Berhemên Çîrokî	30
2.1.1.1. Dindikhinar.....	30
2.1.1.2. Hakim û Jina Xwe û Ehmed Çelebî	36

2.1.1.3. Tûsî Mirarî.....	40
2.1.1.4. Gulistan	42
2.1.1.5. Ehmed Xerîbe.....	45
2.1.1.6. Şens û Aqîl	54
2.1.1.7. Melayê Fend	59
2.1.1.8. Hevmehiya Jin û Çêlê	65
2.1.1.9. Melik Simaîlê Deravê.....	66
2.1.1.10. Pîra Mirovxwer	69
2.1.1.11. Çîlnaza Çîlkezî	72
2.1.1.12. Sê Diz	75
2.1.1.13. Xaîn û Faîn	82
2.1.1.14. Keça Mîrî.....	86
2.1.1.15. Bersêl Beg û Ehmedê Milî	91
2.1.1.16. Bêaqilî	93
2.1.1.17. Hacîreşk.....	97
2.1.1.18. Gulbeyaz.....	99
2.1.1.19. Qumrî	102
2.1.1.20. Darka Berhêk.....	104
2.1.2. Berhemên Stranî.....	107
2.1.2.1. Vê Narê Tevnek Çêkir.....	107
2.1.2.2. Hay Sînemê Sînemê	109
2.1.2.3. Warê Mendana	112
2.1.2.4. Hêy Hêy Çûme Suwara Xelê Wa.....	114
2.1.2.5. Dîlber.....	116
2.1.2.6. Ber Mizgeftê Nişivî.....	118
2.1.2.7. Bejna Bilind.....	119
2.1.2.8. Zêmara Dayîkê	120
2.1.2.9. Xecukê Sêhlê Bîne	122
2.1.2.10. Hicrokim.....	123
2.1.2.11. Dêp Nîmo	124
2.1.2.12. Werî lê lê	125
2.1.2.13. Wey Te Bar Kir	127
2.1.2.14. Melîlo	129
2.1.2.15. Hacan.....	131

2.1.2.16. Kavrê Kur	132
2.1.2.17. Cotyar	133
2.1.2.18. Mominê (1).....	136
2.1.2.19. Mominê (2).....	140
2.1.3. Berhemên Çîrokî û Stranî	143
2.1.3.1. Emer û La'lê.....	143
2.1.3.2. Dirê û Jinbira.....	145
2.1.3.3. Dirik	148
2.1.3.4. Feqe	150
2.1.3.5. Eşîr	152
2.1.3.6. Cînar	155
ENCAM.....	156
ÇAVKANÎ.....	159
A. Çavkaniyên Eslî	159
B. Çavkaniyên Zindî:	164
FERHENGOK.....	167

KURTEBÊJIYA PEYVAN

amd.	: amadekar
b.n.	: berhema navborî
bnr.	: binêrin
c.	: cîld
ç.	: çap
d.g.	: dema gihaniyê
h.b.	: heman berhem
hwd.	: her wekî din
h.ç.z.	: hejmara çavkaniyên zindî
j.	: jimare
K.T.	: Komara Tirkiyeyê
n.d.	: nivîsandina navên berhemên pîrnivîskar
r.	: rûpel
s.	: sal
vgz.	: veguhêzer
wer.	: wergêr
weş.	: weşanxane

PÊŞGOTIN

Nasname, di nava jiyane de hema hema ji bona herkesê nirxek subjektîv digire ser xwe. Ji ber ku her kesek nasnameyek e. Kî ev nasname ne ku ew belgenamaye ku tebaya meriv nîşan dide. Ev nasname ew e ku kesî ji aliyê psîko-civakî ve ji hemû mirovan cuda dike û taybetmendiyên bişexsî nîşan dide.

Wekî tê gotin civak, di nava xwe de ji cure cure nasnameyan û asûnên civakî çêdibe. Mînak; nasnameya bi bawerî, nêrîna siyasî, kar û bar, bajar, cihê nava civakê; wekî taybetiyên erênî baş, durist, dildar û wekî yên neyînî diz, ereqvexwer, sar, derewker ve jî tîn wesfandin. Li gorî van taybetmendiyên nasnameya meriv hilgirtiye ser xwe cîvaka kes li nav de dijîn jî xwe avadike û dide pêşçav. Lê belê hin caran ji bona jiyane çî ditîne ber meriv yan jî temen çî ditîne ber wan, insan jiyana xwe li gor wan diguherînin. Yanî yan hezkirî yan nehezkirî jiyane û nasname xwe diguherin. Mînak ev rewş bipirani di nava ciwanan de xwe nîşan dide. Di nava ciwanan de rewşên bê ecibandin, bê qebûlkirin, xwe bidin îspatkirin halên ku tîn li pêş me yê herî balkêş in. Her çî bibe bila bibe di her temenê de her mirov nasnameyekê û bi wê re ji girêdayî civakekê avadike.

Eger di civakê de zayend li ser nêr û mêyê bê îfadekirin wê gavê em jî dê şên bejin ku nîviya civakê jin avadikin. Û jin jî bi nasnameyekê û bi civakekê ve tîn nasîn, zanîn. Tenê jin ji ber ku, li gorî nasnameya nîviya civakê yan din, li gorî zayenda din, yan zorî lê tê kirin yan jî bêçare tê xistin xwe û nasnameya xwe ya azad nadije. Ji ber wê jî dê xebata xwe de di nava civakê de li ser nasnameya jin bisekinin. Jinê û nasnameyên wê dê bêtêkilahî bixebitin. Divê bê zanîn ku di xebatê de nêzîkahiyeke femînîstî çênabe. Mijara jin bi xwe wekî bireke kûr û dûr û dirêj e. Lê belê em dê mijara xwe tixubên wê diyar bikin. Xebata me dê li ser çîrok û stranên gelerî yê di Colemêrgê de jin û nasnameya jin çawa tê ber çavan, çawa tê teswîrkirin dê li ser wê bisekinin.

Di destpêkê de; ‘Danasîna tezê, rê û rêbazên wê’ de mijar, mebest, vegir-tixûb, metod û teknîkên wê hatin dayîn. Di dawiya beşê de lînerîneke lîteratûrî jî hatiye dayîn.

Di beşa yekemîn de li ser jina kurd û nasnameyên wê sê heb beş hatin çêkirin. Cara pêşî danasîna herêma Colemêrgê hate kirin, cara duyê jina kurd bi agahiyên giştî

ve hate danasîn û dawiyê jî di herêmê de nasnameyên jinê û rîtuêlên pêkhatinên wan hatin dayîn.

Di beşa duyemîn de mijara tezê ‘ Di çîrok û stranên gelêrî yên Colemêrgê de nasnameya jin’ hatiye dayîn. Ev mijarene jî li gorî her sê şeweyan hatine dayîn. Pêşî li gor hejmara zêde çîrok, paşê stran û dawiyê ji berhemên çîrok û stran tevlihev hatine dayîn.

Her berhem piştî ku hatiye dayîn yek bi yek analîzkirina wan jî hatiye kirin.

Di dawiya her tiştî beşek zêde hatiye dayîn. Li bin sîwana ‘Pêvekê’ de ji ber ku berhemên hatin dayîn bi devokî ne û divê baş bîn sehkirin ferhengokek jî hatiye amadekirin.

Di beşa çavkaniyê de çavkaniyên zindî hatine hejmarkirin û li cem navê stran an jî çîrokê ev hejmarane wekî şîfre hatine bikaranîn û ev şîfreyene navdanka bêjêran nîşan didin.

Di serî de ji mamoste û şewirmendê xwe Doç. Dr. Seyit Battal Uğurlu re spas dikim. Wî bi fikr û ramanên xwe ve û zanîna xwe ve gelek alîkarî da min. Her wiha bi mamoste Dr. Metin Eren û Qahir Bateyî re, bi mamoste û jûriyên parastina tezê Dr. Kemal Kaya û Dr. Canser Kardaş re gelek spas dikim. Mamoste Seyit Battal Uğurlu û Metin Eren bi bêhneke fireh û sebrekî mezin nîşanî min dan, ez guhdar kirim û bi pêşniyazên xwe ve alîkarî dane min. Ji çîrokzan, vebêj û dengbêjên (ku navên wan û taybetiyên wan yek û yek di çavkaniyê de hatin dayîn) alîkariya xwe ji min kêr nekirin, hevalên ku di peydakirina çavkaniyan de alîkarî dayîne min Belgîn û Şîlan Adıyaman, Efe Aydemir, di her tengasiyê de ku alîkarî dayîne min û ez dilbawer kirim Rabia Orak Elçiçek û Sevda Orak Reşitoğlu, di dawiyê de jî ya ku di her pêngavê de li cem min mayî û bi zanîn û sebra xwe ve alîkarî daye min dayîka min Ayşe Ücar re gelek spas dikim.

Hatice Ücar

Wan 2019

DESTPÊK

I. Danasîna Tezê, Rê û Rêbazên Wê

1. Mijar

Mijara teze; di dîroka Colemêrgê ya kevin heya ku ya roja em têde dijîn de rewşa jinê û nasnameyên li xwe de dayîne jiyandin bi rêya çîrok û stranên gelerî yên herêmê vê danasîn e.

Jin bi hebûna deraxa mirovan ve di nava jiyane de cih girtiye. Ev cihê girtî li gorî civakê, netewê, malbatê û di gelek cihan de jî li gorî taybetiyên şexsî yên jinê pîrcure cudahî pêk anîne.

Di xebatê de ev cudahî ango nasnameya jinê û dab û pratîkên wan avadikin dê bên dayîn.

Piştî nasnameyên wê hatin dayîn, beşa teza me ya bingehîn ‘Di çîrok û stranên gelerî yên Colemêrgê de nasnameya jin’ dê bê dayîn. Di vir de çîrok û stranên gelerî yên ji bêjêran hatin guhdarkirin yek û yek bên dayîn.

Di serê çîrok û stranên de navdanka bêjê, di dawiya wan de jî dahûrankirinên nasnameyên jinan yên di çîrok û stranên de diborin dê bên dayîn.

2. Mebest

Wekî jinên cîhanê jinên kurd û jina Colemêrgê jî di nava dîrokê de keftiye nav şiklên jinê yên cuda û nasnameyên cuda derxistine holê. Ji maderşahî hatiye qetandin û ketiye bin zextên pederşahiye, ji koçeriyê ketiye niştecihiyê, ji jiyana gund çûye nav jiyana bajarî, ji malbatê çûye nav mala mêrî. Heta di şerên nava wê de çêdibin wê dixin nav bûyîngên -kî başbûn an jî xerabûn ne diyar e- nû.

Bi taybetî jina kurd, bi dab û nêritên di civaka wê de dihewin û lê tîr ferz kirin ve dikeve nav deraxek zehmetir. Lê belê ev jî bo her jina kurd di eynî astê de çênebûye. Ji ber ku avaniya civakî, cih û nasîna malbatê, statûya jinê bixwe bandorê li vê deraxê dike. Mînak; jinên koçer hem azadtir in û hem jî şervantir in ji yên niştecihî. Yên xwecih gelectirê di nav jiyana malî de ne û kabanî ne. Yan jî di mafê axiftin û bicihanîna daxwaziyan de keç û jinên ji malên mîr û paşayan tîr, ji jinên ji nav xelkê tîr bandortir bûyîne. Heta gelemperî van jinan rêveberiya civaka xwe gelek caran jî dest xistine.

Mebesta me ev e ku bi riya çîrok û stranan ve; ku cureyên wêjeyê yên balkêş in û erka neynikê li civakê de dikin, bi sinorkirina herêma Colemêrgê ve jina kurd û nasnameyên bidin nasîn e. Ji demên berê û heta ku roja me di statû û nasnameyên jinan de çi guhertin çêbûyîne dixwazin bînin berçav, şênber bikin.

3. Vegir û Tixûb

Lêkolîn hem ji hêla mijar û hem jî ji hêla deverê ve sînorkirî ye. Herî pêşiyê lêkolîn li ser ‘jin û nasnameya jinê’ anîne ser jina kurd.

Di gel vê yekê, di lêkolînê de çîrok û stranên tenê wekî berhemên ku xwedan nasnameya jinê ne têne hesabandin. Nimûneyên bê jin û nasnameya wê bi lêkolînê re nehatin têkilkirin.

Xebat di nav parêzgeha Colemêrgê de hatiye karkirin. Navçeyên Colemêrgê; Gever, Şemzînan, Çel; bajarokê Silehê û çend gundên parêzgehê di nav çarçoveya qada lêkolînê de ne.

4. Metod û Teknîk

Herî pêşiyê lêkolînên berê yên têkildarî xebatê hatine kirin û çavkaniyên niviskî hatine lêgerîn. Bi riya wê lêkolînê rêzên sereke yên tezê hatin avakirin.

Piraniya çavkaniyên zindî yên tezê bêjerên dilxwaz in. Tenê tiştê ji wan hatiye xwestin; di çîrok û stranên digotin de hebûna nasnameya jin an jî jinan bû. Ji ber ku dema xebatê de gelek çîrok û stranên gelêrî hatin destxistin. Lê belê piraniya wan ji jin û nasnameyê dûr bûn. Gelektirê şeweya şer, lehengî, dîrok, cefen (fabl) û hwd bûn. Ji ber vê yekê, tenê karên ji jinan re têkildar hatine hilibjartin.

Hevdîtin li gel kesên çavkanî yek bi yek hate kirin. Tenê ji du kesan; yek bi riya telefonê û yê din jî bi riya hevaleyê re ji ber dem û pîrsgirêka veguhastinê têkilî hat peydakirin. Hemiyar tomarên dengî hene. Lê di heman demê de li gorî daxwaza bêjeran çavkaniyên vîdyoyê (dîmen) jî hene.

Ji bilî çar kesên çavkanî, hevpeyvîn li malê û di wextê diyarkirî de hate çêkirin. Ji ber ku ev çar kes ji komên xebatkar de bûn di bernameyê de çaksazî hate kirin.

Berhemên hatine qeykirin paşê wekî vegotinê hatin nivîsîn. Bi şikil manê hatiye mêzekirin ku gelo ev çîrok e, yan stran e û yan jî tevlihev e. Şûnde ji aliyê

hejmarê ve, ji piranî heta ya kêma hatine rêzkirin. Ango rêzkirina wan li gorî çîrok, stran, çîrok û stran hatiye çêkirin.

Berhemên hatine komkirin berhevok in û ya yêna herêma Colemêrgê ne yan jî li wir tîn zanîn û vegotin. Da ku taybetiyên zaravayên wê çêtir bîn tîgiştin jî ferhengokek hatiye amadekirin. Li gel wê ferhengokê nasnameyên çavkaniyên zindî di dawiya teze de bi bibliyografyayê ve hatine dayîn.

II. Lêgerîna Lîteratûrî

Xebatên li ser herêma ku me lê kar dikir û bi taybet jî yêna li ser jina kurd gelek kêma bûn. Jixwe yêna kurdî hatine çêkirin, çî nebûn. Lê car din jî li bin sîwana giştî de çend heb çavkaniyên ku bi xebata me re alîkarî didaye, me ji we re parve kirin. Jêgirtin û rêzkirina van berheman tenê tîkildariya wan ya bi herêm û çanda li wir ve girêdayîbûn e.

Güler Yılmaz- Hasan Buğrul- Muhammed Al Haddar (2019). “Hakkâri Yöresinde Doğum Kültürü ve Ahşap Beşikler.” *Sosyal Bilimlerde Akademik Araştırmalar*. (Ed. Zeki Taştan vd.). İstanbul-Hiperlink: Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Edebiyat Yayınları. s.319-336.

Ev xebatê li ser çanda herêma Colemêrgê ya zayînê û li ser landikên darî hatiye kirin. Li ser civak, sin'et û kevnaşopan û bandora wan ya li ser rewşa sosyo-aborî û baweriyên civakê lêkolîn û dahurinkirin hatine kirin. Herêma Colemêrgê bi van taybetiyên xwe ve hatiye xebîtin û muqayeseya wê bi herêmên din ve hatiye kirin. Ji bo me jî bi rewşa sosyo-aborî ve mînakek baş hate dîtin.

Lale Yalçın-Heckmann (2016). *Kürtlerde Aşiret ve Akrabalık İlişkileri*. (Çev. Gülhan Erkaya). İstanbul: İletişim Yayınları.

Ev çavkanî bi dest û lênerînen nivîskarê bi xwe hatiye amadekirin. Salên 1980an şûnde nivîskar bi xwe çûye herêmê û berhema xwe li cih dest pê kiriye. Ji jiyana kurdan ya siyasî heya erdnigariya herêmê, rayên eşîran û heya ku xizmaniya di civakê de û çêbûna zewacan di bin sîwanek fireh de meriv agahiyan bi dest diêxe.

Editörler Vahit Tane ve Kemal Varol (2011). *Hakkâri Üniversitesi Uluslararası Kürt Kadın Kongresi (1-5 Ekim 2009) Bildiri Kitabı*. Hakkâri. Hakkâri Üniversitesi Yayınları.

Ev çavkaniye bi naveroka xwe ve gelek berfireh e. Li ser jina kurd hema hema di her mijarê de mirov dikare agahiyên bi dest bixîne. Lê belê divê bê zanîn ku ev agahiyane ne bikûrahî hatine lêkolînkirin.

Îhsan Colemêrgî (2001). *Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan*, Stenbol: Weşanên Avesta.

Ev pirtûk di dîroka Colemêrgê de ku dema mîrekiyan de hatiye nivîsîn. Çîrok li ser evîna Binefşa Narîn û Cembeliyê Kurê Mîre Hekaryan hatiye nivîsîn. Ji ber ku di wêjeya kurdî de Binefş nasnameyê jinê ya balkêş temsîl dike û hem jî ji bo zewaca niqirkîrî (Binefş û pîsmamê wê Ehmed) mînak di xwe de dihevine ji bo xebata me çavkaniyek bicih xuya dikir.

Ersan Ersoy (2009). “Cinsiyet Kûltûrê Îçerisinde Kadın ve Erkek Kimliği: Malatya Örneği”. *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 19 (2): 209-230.

Ev xebate di civakê de çand li ser statûya jin û mêr çî guherînan dike tîne berçav. Di vê qonaxa guherînan de rol û modelên ku çand li ser her du zayenda dike, her tim li ber zemanî xwe diguherînin. Ev xebate li ser rolên jin û mêrên xebatkar ên bajarê Meletî hatiye kirin. Bi riya anketê ve çêkiriye.

Berrin Mazıcı (2012). “Safranbolu İlçesi Halk Edebiyatı ve Halkbilimi Ürünleri Üzerine Bir Araştırma”, Balıkesir: Balıkesir Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi).

Ev xebata ne li ser herêma xebata me hatiye amadekirin. Lê belê di xebata me kirî de alîkariyê mezîna nîşanî me daye. Axlebe di mijarên cureyên zewacê de, di rituelên zewacê de rê û rêbaz nîşanî me daye.

Leyla Yiğit (2007). “Ferit Edgü'nün Roman ve Öykülerinde Yapı ve Tema”. Van: Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi).

Ev xebate bi kurahî ne li ser Colemêrgê hatiye çêkirin. Lê bele li ser temaya pirtûkên Ferit Edgü hatiye çêkirin û em zanîn ku pîranî pirtûkên wî li ser herêma ku em li ser xebitê hatine nivîsîn.

Tuğba Metin (2013). “Hakkari’de Yaşayan Kadınların Geleneksel Rol Sahiplenmeleri ile Toplumsal Hayata Katılımları Arasındaki İlişki”. Bolu: Bolu Abant İzzet Baysal Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü. (<https://www.researchgate.net/publication/272665823>), (d.g. 03.03.2019).

Ev gotara ku hatiye nivîsîn tenê li ser çend pirsan rê ve çûyiye. Wekî pirsên; ‘mêr serekê malê ye, jin bêxeberiya mêrî naketin’ re statîkîyên li gorî bersivên ji 1177 (temenên wan 15 salî û jorî ne) jinan dayîn ve nêrnek li ser herêma û zayendiya kesayetan hatiye kirin.

Tuğba Metîn ve Pınar Enneli (2017). “Hakkari’de Kürt Müslüman Kadınların Öteki İnşası-Çocuklarım Kiminle Evlensin ve Komşum Kimlerden Olsun?”. *Alternatif Politika*. 9 (1): .61-84.

Ev gotar jî ne tenê pirs û wekî anketên statîkî hatiye çêkirin. Bi çavê miletê Rojavayî û yên olên din, yên Rojhilatî û kurd çawa têne dîtin jî nîşa daye. Herêma Colemêrgê ji bo xebatê hatiye jêgirtin. Li gorî min ji ber ku nifûsa herêma nêzîkî %100 misilman û sûnnî ye, loma hatiye jêgirtin.

Ferit Edgü (2019). *Hakkari’de Bir Mevsim*, İstanbul: Alfa Yayınları.

Pirtûkên Ferid Edgü pîranî şêwazên wan roman û çîrok in û li ser herêma Colemêrgê nivîsîne. Van berheman de xwezaya herêma, janên wan, zordariya jiyana kesên gundî, peşvemayîna wan ya li hemberê pêşveçûnên serdemî de nîşan dide. Çiqas li ser herêmê nivîsandibe jî divê bê zanîn ku bi nêzîkahî û kûrahiyeke wêjekarekî ve berhemên xwe derxistine holê. Lê car din jî agahî û zanînen herêmê li ber çavên xwendevanan de dide teswîrkirin.

BEŞA YEKEM: 1. JINA KURD Û NASNAMEYÊN WÊ

1.1. Di Derheqê Colemêrgê De Agahiyên Giştî

1.1.1. Avayiya Colemêrgê ya Dîrokî

Herêma Colemêrgê di dîrokê de teqabûlê sehayeke fireh dike û di herêma serên başur û rojhilat hevrişîn hev yê Tîrkiyê de cih digire. Ji ber ku xwediya erdnigariyeke dijwar û zehmet e, Colemêrg di nava dîrokê de çawa ji aliyê gelek împaratorî û dewlatan ve zor hatiye rêveberkirin wekî wiha bendewarî û bindestiya wê jî di şiklekî rûxarkî de maye. Ev jî bi rêya erdnigariya xwe ve peyde kiriye. Ji ber wana jî gel sosyo-polîtîk xwe wek eşîr rêxistine. Agahdariyên dîrokî yê derheqê herêma Colemêrgê heta ku sedsala dehemîn bisinorkirî ye. Ev rewş jî çawa bi kêm xebatên arkeolojîk ve çêdibe, her wisa bi erdnigariya wê ya ji aliyê dîroknas, seyah û erdnas ve nehatiye geryan ve jî girêdayiye. Piştî sedsala X. wir ve çawa ku di herêmê de tevgerdariya siyasî xuya kir, zanînen li Colemêrgê ve têkildar jî zêdebûneke pêşçav nîşan dayiye. Di sedsala XII. de mirên Colemêrgê derkeftine holê û di nava siyasetê de cih girtine. Mîrên Colemêrgê ji ber ku di nav dewletên Osmanî û Safeviyan de cihekê stratejîk digirtin, di erşîvên van her du dewletan de berfirehî cih digirin. Mîrên Colemêrgê jî bi riya nivîsvanên xwe ve berhemên têkildariyên dîroka xwe dayîne nivîsandin. Herî dawiyê di serê sedsala XIX. û heta ku sala 1914an de mîsyonerên rojavayî erşîvek bi eleqadariya Nasturiyên herêma Colemêrgê ve pêk anîne (Hakkari.ktb.gov.tr./TR-158549/hakkari-tarihi.html (d.g.:07.05.2019).

Di dîroka Kurdan de bajarê Colemêrgê gelek taybetiyên bi xasî xwe dide ber çavan. Erdnigariya wê wekî bajarên cîran nîn e. Tim xwezaya wê, xwe ji yê din cuda dike. Lê ne tenê bi xwezaya xwe ve bi çand, civak, folklor, cil û berg, hunerên destan, eşîr, devok, reqasa çepkî û hwd ve cudahiyan xwe pêşkeşî mirovan dike.

Bajarê Colemêrgê di vebijêrkên li jor hatine dayîn de wekî hatiye gotin xwe her tim ji bajarên din cuda nîşan dayiye. Her wisa Ewliya Çelebî di *Seyehatnameya* xwe de bona vî bajarî “xweyî avaniyek rêveberî ya wekî hikûmet bû” (Ewliya Çelebi (1655).<https://hakkari.ktb.gov.tr/TR-159001/osmanlilarin-bolgeye-gelisi-ve-hakkari-sancagi.html> d.g. : 07.05.2019) dibêje. Şerefxane Bedlîsî jî bona hikûmdarên bajarî wiha gotiye: “Ji aliyê kesên erbabên edebiyat û nivîsan ên qadirşînaz û payebilind,

xwedî dîtînen dûrbîn û zelal û nêrînen ronak jî ku bi awakî vekirî tê zanîn, hîm û koka fermanrewayên vê wîlayeta han, digihin xelîfeyên Ebbasiyan. Lê ciyê ax û kesere ye, kesekî ji me re negotiye ku nesla wan ji kîjan xelîfeyê mezin zêde bûne” (Bedlîsî, 2007:184).

Erdnigariya wê ya zor û zehmet destûr nedaye ku dewletên dor û rexên wê, wê bikin bindest yan jî sed û sed bandorê lê bikin. Vê sedemê ew di nav xwe de bi civakeke sosyo-polîtîk ya bin bandora eşîretan ve hatiye îdarekirin.

Navê Colemêrgê di çavkaniyên ereban de “her-kariyan” ango şervanê zîrek, mêrxas derbas dibe (Dündar, 2011: 57). Di dema Osmaniyan ya Kanûnî Sultan Suleymanî wir de bi navê “Hakkarî “ve hat binavkirin û tevî axa wê dewletê bû. Ji aliyê Ermeniyan ve “İlmar”, Sûryaniyan ve “Gularmak”, Memlûkiyan ve “Colemêrg” dihat gotin (Dündar, 2011: 66).

Kîteyên navê bajarî bi rêya etîmolojiya peyvên ‘Her’ ango ‘tim’ û ‘karî’ ango ‘qewet gihîştin’ ve hatiye çêkirin. Her-karî bûye wateya xurt, biqewet (<https://hakkari.ktb.gov.tr/TR-158986/hakkari-tarihi.html> d.g.: 07.05.2019).

Wekî hatiye gotin bajêr di bin bandora eşîretan ve dihat îdarekirin. Ertoşî û Pinyanişî her du yên herî mezin bûn û wekî şeklê konfederasyonê bûn (Dündar, 2011: 57-77). Ev bajar bi rêveberiya Urartuyan, Memlûkiyan, Selçûkiyan, Safeviyan, mîsyonerên Frensiz û Îngilîzan, Asûriyan, dema eşîran (mîrekiyan), Osmaniyan û komara Tirkiyeyê ve hatibû bandorkirin (Yalçın-Heckmann, 2016: 72-75).

Di nav van de yên ku nasnameya bajêr ya taybet avakirî dema mîrekiyan bû. Ew taybetiyên di pêşiyê de hatî zimên, gelemperî di vî demî de bingeha xwe saxlem kir û heta îro jî şûnên wan di civakê de tînen dîtînen.

1.1.2. Rewşa Nifûsê

Dema avaniya temeniya Colemêrgê hat lekolînkirin rewşek cuda ji ya giştî ya Tirkiyeyê tê xuyakirin. Tiştên ku bandorê li wê rewşa dike jî yek, koçên ji berê were tînen kirin û encamên wan yên neyînî ne. Ya din ji hebûna yekîneyên leşkerî ne. Nifûsa leşkerî ji ber ku temenên 20-24 vegirtine nav xwe li ser nifûsa ciwan bandor dike. Çiqas li gorî salên berê di koma temenê 0-4 kêmbûn çêbibe jî cardin li gorî wasatiya giştî ya Tirkiyeyê hêşta zêde ye. Yêk; zêdebûna komên temenên din çiqas zêde bibe jî li ber koma 20-24 temeniyê kêmasiyê dibîne û du jî; di wê hejmarê de mêr ji jinan

gelektir tên dîtin. Sedema van her du encaman nifûsa eskerî ye. Komên temenên 0-14 (%33,5) û 65+(%29) pola têber pêk tîne. Pola xebatkar ango ya hilberîner rastî pola têber rêjeya %58,2 yê pêşwazî dike. Ev rewş rastî wasatiya Tirkîyê ya giştî nêzikahiyeke %63,6 nîşan dide. Li gorî zayendê, nifûsa nêr çiqas zêde xuya bike jî dema mirov lê dinêre encamên cuda derdikevin holê. Di koma temenên 20-24 an de li rastî 100 hejmara jinan 203 zilam li ber tên. Di 54 saliyê wê de hejmara nêr û mê jêk cuda dibe. Nifûsa mê 54 heta ku 90 saliyê her zêde dibe û dom dike (<https://hakkari.ktb.gov.tr/TR-160244/hakkari-ilinde-nufus.html> d.g.: 12.05.2019).

1.1.3. Erdnigarî

Wîlayeta Colemêrgê di Devera Anatoliya Rojhilat de cih digire. Ev bajarê ser rojhilata başur ya Tirkîyeyê pêktîne xudana navend, 3 navçe (Gever, Şemzînan, Çel), 4 qeza, 136 gund û 377 mezraya ye. Li aliyê rojhilat bi tixubê Îranê û li başur ji bi tixubê Iraqê ve dor lê hatiye pêçandin. Li bakûr bi navçeyên bajarê Wanê; Elbak û Payizava ve, li rojavayê jî bi navçeyên Şirmexê; Bêşebap û Qilabanê ve dorpêç kiriye. Bajar bi karakterîstîka xwe ya çiyayên pir û bilind ve tê zanîn. Ji ber vê jî bilindahiya bajarî gelek e (<https://hakkari.ktb.gov.tr/TR-160245/hakkari-ilinde-nufusun-sosyal-ve-ekonomik--nitelikleri.html> d.g.: 12.05.2019).

1.1.4. Avaniya Aborî

Colemêrg li gorî dabeşbûyîna aboriya xwe ji pêşerojê heta ku roja me di faktora aboriyê de gelek cudabûn lê çênebûyîye. Mijûlbûnên aborî yên însanên berî komarê û piştî komarê jî gelek cihan hevşîbî xuya dikin.

Di serdema Osmaniyan de Nasturiyan bi giştî çandin û rezwanî, Ermeniyan bazirganî, misilmanan jî çandinî û ajaldarî dikir. Ji berê heta niha mijûlahiyên aborî yên herî girîng yên herêmê zozanwanî û ajaldarî pêk tîne. Li gel van çandinî, mêşvanî û masîvaniya kulturî dahatiyên aborî yên salên dawî ne. Ji ber şert û mercên Colemêrgê yên fizîkî pêşveçûna wê ya aborî hatiye astengkirin. Heta salên 1970 yan bi şertên aboriya girtî rewş dom dike û di encama wê rewşê de di têkiliyên aborî de jiyana çandî û gerdîşî tesîldar dibe. Ji ber ku cihekê çiyayî e, cihên çandinê jî bisinor in. Ev taybetî cih ji bo ajaldariyê kêrhatî kiriye. Sala 1975ê hejmara sektora

çandinî %88 bû, lê piştî sala 2000an dema cihnişînên gundewarî koç kirine bajêran. Ev hejmara sektora çandinî kete %52,4an. Li gel vê koçê qismê bi çandinî û ajaldariyê ve mijûl dibe kêm bûn, gelemperî di sektora xizmetê de araste bûn. Sektora xizmetê sal bi sal pêş ve çû. Lê belê dabeşîya sektorî pirsgirêka 'bêkarî' jî derxist holê. Rêjeya bêkariyê li Colemêrgê her tim li ser %10an çêbûye. Vê pirsgirêkê di pêşî û paşiyê de jî gelek pirsgirêkên din li gel xwe aniye.

1.1.5. Avaniya Sosyo-Kultûrî

Berî komarê, nifûsa Colemêrgê ji aliye olî û nijadî cur bicur bûye. Ji ber vê jî cihên perwerdehiyê pircure û zêde bûne. Di dema Osmanîyan de ji ber kultura Islamê cihên perwerdehiya olî û ilmî diden jî hebûn û yên ji bo kesên olên din jî ev saziyên perwerdehiyê hebûn.

Di senceqa Colemêrgê de Misilmanan 4, Ermenîyan 3, Keldaniyan 2 û Cihûyan 3 ango tewahî 12 dibistan hebûne. Ev hejmara dibistanan ji sala 1925an û heta ku roja me her tim zêde bûye. Ji zêdebûna dibistanên amadeyî û heya vebûna zanîngehê jî rewşa perwerdehiya bajarî nîşan dide. Rewşa xwendawariya Colemêrgê li gor salan; 1940an de %4,38, 1960an de %11,43, 1980an de %31,62, 1990an de %52,28 bûye. 2000an de %70,69 û 2014an de jî gehîştîye asta herî bilind û bûye %90,1.

Lê belê xwendewariya jinan her tim kêmtir bûye. Di navbera salên 1940-2000an de ji %9ê bilind bûye %52,1 ê. Lê car din jî ev rêje li gor ya zilaman kêmtir e. Sala 2015an ev rêje bûye %86 (<https://hakkari.ktb.gov.tr/TR-160245/hakkari-ilinde-nufusun-sosyal-ve-ekonomik--nitelikleri.html> d.g.: 02.06.2019).

Pêşveçûna xwendewariyê û vekirina dibistan û zanîngehan zêde bûye. Li gel vana qedemeyên mezûnbûyî jî bilind bûne. Lê car din hejmara mêran ya ku di lîsansê de aşîkar e ku ya jinan pêşvetir e.

Kurtasî li ser tenduristiyê jî dikarin vana bêjin;

Li gorî salên berê di sektora tenduristiyê de pêngavên baş hatine avetin û her kes ji van fersendan feyde dibîne. Xizmetên tenduristiyê hem çawaniyî û hem jî çendewaniyî xwe guhartine. Xerckirina xizmetên tenduristî yê bajarî her tim li bin %0,2an de mayîne. Navend û her sê navçeyan her yekê nexweşxaneyek heye. Hejmara xebatkarên sektorê jî hatine zêdekirin.

1.2. Jina Kurd

1.2.1. Di Qanûnan de

Ji sedsala 18an û vir ve, jin ji bo rakirina newekheviyên zayendparêz hem di dabeşkirina siyasî û hem jî di warê ked û hilberînê de têdikoşin. Destpêka vê têkoşînê bingeha salên Şoreşa Fransî ye.

Olympe de Gouges, ku “Daxuyaniya li ser Mafên Jinan û Jinên Ciwanî” di sala 1791 de nivîsand, û Mary Wollstonecraft, ku “Parastinek Mafên Jinê” nivîsandiye, her du jinên yekem bûn ku ala xwe danîn ser ciyê xwestin û lêgerîna mafên jinan.

Mary Wollstonecraft dibêje, “Jin gava ku ew azad bibin civak jî azad dibin” (Anonim, 1993: 246-247).

Pêşketinên di mafên jinan çêbûyîn de di heman demê û li her deverê de eynî bandor nekirine.

Cara yekem bûye ku li Tirkiyê jî bi qebûlkirina Zagona Medenî ve li wî welatî bandora şoreşkê çêbûyî.

5ê Berfanbarê, di sala 1934an de ji bo jinên li Tirkiyeyê mafê hîlbijirîn û hîlbijartin hate dayîn. Jin di perwerde, zewac, hevberdan û werasetê de bi mêran re wekhev hatin qebûlkin.

Di sala 1985an dejî ew peyman navneteweyî ya li ser mafên mirovan hemiyar îmze kir.

Di warê yasaya siyasî û pêdiviyên welêt de gelek nûbûn di asta yasayî û destûrî de pêk hatine.

Ji xala yekem a Daxuyaniya Gerdûnî ya Mafên Mirovan heya xala 10ê ya Makezagona 1982an, her kes li pêşiya qanûnê wekhev e (Anonim, 1993: 246-247).

Jinên Kurd ên xwecî yê vî welatî bi xwezayî van mafan re hevpar in.

Lê belê, gelek faktorên wek rayedarên siyasî, beşdariya kar û perwerdeyê, nêzîkbûna malbat û civatê ji bo ku xwedî derkeftina mafên xwe de ji bo jinan bûyîne asteng.

Piraniya lêkolînerên Kurd amaje bi vê yekê dikin, ku Musa Anter di gotara xwe ya kurt de jî “Cihê Jinê Di Dîroka Kurd” de behs kiriye ku her gav di civaka Kurd de wekheviyek zayendî heye (Bruinessen, 2005: 139).

Anter di heman gotarê de hebûna serokên eşîrê yê jin wekî delîl ji pozîsyona wekhev a jinan destnîşan dike.

Pietro della Valle, mînakek di sedsala 17an de dide û dibêje; “jin bi serê xwe vekirî tê bajêr û her cûre mirov, biyanî û yê din re bi şiklek azadî têkilahî çêdikir” (Bruinessen, 2005: 139).

1.2.2. Di Perwerdehiyê De

Perwerdehiya yekemîn a ku bingeha gotina devkî -di nav kurdan de heye- tê dîtîn ku di mijarên wekî mezinkirina zarokan, ji civakê re bibe kesek dilsoz, biexlaq û civak jê feyde bibine, yekemîn dayik ji perwerdehiya kesane berpirsiyar e.

Wekî li hemû dinyayê, di nav kurdan dejî xwende-nivîsa jinê rêjeyek kêmanîşan dide.

Dayik ji perwerdehiya zarok berpirsiyar e, nemaze heya temenê dibistanê, ji ber ku bav piranî li derve ye.

Tevî hemû pirsgirêkan, kêmasiyan, pergala perwerdehiyê bi pêşverû, avahiya sazûmanî û hwd ve hatî pêşxistin û berfirehî çêkiriye (Gök, 2015: 161).

Ji dema komarê vir ve beşdariya jinan di perwerdehiyê de li gorî mêran her kêmanî xuyakirin (Gök, 2015: 161-163).

Di cîhanê de jî raman û qîse li ser xwendina jinan hatine gotin. Mînak;

J.J. Rousseau dibêje: “Cihê jinê mal e”.

William Thompsonê Brîtanî dibêje: “Divê di xanî de neyê zindan kirin û zewac ne be bijardeya wê ya tene”.

Charles Fourier jî dibêje ku: “Divê perwerdehî ne tenê ji bo malê, di heman demê de ji bo beşdariya di jiyana siyasî û civakî de jî wê amade biketin.” (Anonim, 1993, r.:247).

Çiqas li piraniya erdnigariya kurd lê dijîn de xwendina jinan kêmanî be jî roj bi roj qîmeta xwendinê jî tê zanîn.

Xwe ji demên berê heta niha tenê jinên ji malên dewlemend an jî mezin xwendine û hatine cihên baştir. Lê ev ramane jî êdî wateya xwe winda dike.

1.2.3. Di Siyasetê De

Di siyaseta kurdan de di hêj di demên berê de di bînin ku jinên kurd di nav siyaseta de ne. Piraniya wan jî gelek navdar in. Em hin mînak dibin: Fata Reş (1850), Edîla Xanim (1909-1924), Meyan Xatûn (1913-1957) û hwd (Hür, d.g. 05.05.2019).

Li gorî gelek lêkolînvanan jinên kurd bi rêveberiya êşîra xwe ve tekilî nav siyaseta bûyîne.

Lê dîroka nivîsandina tevgera jinên kurd nû ye.

Piştî salên 1980an, çavkaniyan destnîşan kirin ku di sala 1919an de, Civata Tealî ya Jinên Kurd ji berê de di Stenbolê de hatibû avakirin. (Alakom, 2005: 76-77).

Li gorî Ayşe Güneş Ayata, beşdariya jinan di siyaseta de bi du awayan e. Ya yekem beşdariya kesane-siyasî ye, ya duyemîn jî beşdarbûna civakî-siyasî ye. Pêşniyar dike ku bandora mêr li ser beşdariya jinan ya di siyaseta de zêde ye (Ayata, 2015: 262-264).

Ahmet Alış dibêje ku: “Tevlêbûna jina kurd ya di siyaseta Tirkîyê de bîryarek bicih e û bandorek baş dêçêke. Ji ber ku niha jî zimanê jina Kurd tê asteng kirin, ev jî sedem manê bes e ku ew bibe parçeyek ji siyaseta” (Alış, 2011: 209).

Çiqas bi ber jina kurd ya bi riya kesayeti û yan jî bi riya civakî ve asteng bîn çêkirin jî temsîlîkirin û tevlibûna wê ya siyaseta, ji jinên din yê di civakê de bi rêjeyî ve gelek bûna xwe îspat dike. Li gorî hîlbijartinên herî dawiyê li bin siwana partiya kurd de 25 jinan li meclisê mafê hîlbijirînê dest xist. Ev jî di rêjeyê ve rastî %40,32 ya herî zêde nîşan dide (https://www.tbmm.gov.tr/develop/owa/milletvekillerimiz_sd.dagilim d.g.: 22.06.2019).

1.2.4. Di Jiyana Xebatê De

Jina di nav mal jiyana malê de weki kesekê tene; paqijkar, aşvan, ji zarokan û mêrî re xizmetkar tê pêşiya meriv. Di jiyaneke wiha de kêman caran bona xwe wextî çêdike û hewl dide ku daxwazên xwe cih bîne.

Di dema maderşahî de ew taybetiyên niha ku di destê mêran de tên girtin, ku di wî serdemê destê jinan de tên dîtin. Di şarezayiyên Mezopotamyayê û Babilê de civakeke bi maderşahî ve hatiye rêvebirin tê xuyakirin (Salên beriya zayîne 5000). Di

kultûra madî de guhartinên kar, cure û beşên kar, fikra milkiyet, têderxistina qeweta mêrî ya fîzîkî derdikevin holê. Lê ev guhartin şûnde bandorê li çanda manewî jî diketin. Edî maderşahî winda dibe, desthilatdarî heya ku roja me dikevîte destê mêr û serdema paderşahiye xwe xort dike (Arslan, 2000: 17-18).

Piştî van guherînan her salên şûnde jinan, hem besayiya xwe ya fîzîkî hem jî xwediyetiya xwe ya gelek taybetiyan yan dîr ket yan jî hat dîrxistin û qetandin. Belkî tenê di wateya fîzîkî de zayokiya wê maye destî da. Lê niha di nav jiyana paderşahî de berxwedana hebûna xwe didetin. Wekî me di serî de aniye ziman jin di jiyaneke desthilat de hate wê rojê. Ev rewş di hemî cihanê de wiha bandor kiriye. Lê li gorî netewan û pêşveçûyîna wan cuda wext, şikil û bandor çêkiriye. Mînak jina kurd ya ku li gund jiyana xwe dom dikir ji ya bajarî serbestir, wêreker û şolkertir bû. Lê ew jî çawa gund hatin valakirin kefte di nav warek teng de, ev jî mal bû.

Piştî salên 1980an de guhartinên sosyo- aborî derkeftin holê. Wan guhartinan boçûna rewşa jinê jî da guhartin. Edî tenê şolkirina mêrî têra debara malê nedikir. Diviyaba jinê jî alîkarî daba malê. Jinê rast e şol kir, ji malê derkeftin lê hinek pîrsgirek jî dikeftin pêşiya wê. Heidi Wedel wana wiha rêz dike: “Xebatkarên bêwef bûn, sazgehan kar heta malê dane birin, jinên neşûkirî dihatin hilgirtin ji ber ku wext hebû pîtir kar dikirin û encamê de jî gelek tişt daxwaz nedikirin. Ji ber wana jina malê jî di şolên malan, ên netendurîst û kêr heq de şol dikirin” (Wedel, 2005: 166).

Piştî salên 1980-85an wir ve êdî kesên kar dikin ne tenê karê çandî de şol dikin û ji bo malê karê bêheq dikin. Êdî cureyên karan çêbûyîne û biheq, bimeaş şol dikin (Ecevit, 2015: 105).

Lê ev pêşveçûnên di jiyana xebatê de çêbûyî jî -ji bo cudahiya jin û mêran di wê beşe de- têra nakin.

Lale Yalçın Heckmann di pirtûka xwe de tîne ziman ku li herêma colemêrgê û piraniya derdorên wê de kar û xebatê de her du zayend hevpar dîtiye (Yalçın-Heckmann, 2016: 250-251).

Jiyana gundî û bajarî karên aboriyên cuda di xwe de hewandine. Lê kî der be êdî jin ketibû nava xebatê de. Jina kurd diviya bû ku li ber van pêşveçûnên di cihanê de çêdibûn, wê jî xwe amade kiriba. Êdî ji mal derkeftiye. Ji bo wê pêvajoyê jî dît ku bê perwerdekirin, di mal, kar û civakê de madî û manevî parastina xwe û mafên xwe bikira.

Jina kurd dema em lê dinerin, dibînin ku piranî an febrîqa, an sektora xizmet û an jî karên bi karên malê ve girêdayî de kar dikin. Ên ku di pîşeyên prestîjtir de dişuxilin yan jinên malbatên wan ji aliyê sosyo-aborî gelek baş in, yan jî rewşa wan ya perwerdehî astek baş de ye.

1.2.5. Di civakê de

Domenico Sestini sala 1786an li ser jina kurd wiha gotar dayiye:

‘Jina Kurd bi zimanê Kurdî tenê dizane. Aksena wan ji axiftina wan ya kevn cuda nebûye. Ew kêfxweş, dirêj, hêzdar û bi hêz in ku dikarin pêşiya diwariyanan bigirin. Jin mîna qehremanan bêpêçe digerin. Ji hêla cinsî ve, jin ji mêran ne kêmtir xirab in. Jin rojê rojê du caran nan amade dikin û rojê du dana pêşkêşî malbatên xwe dikin’ (Galletti, 2005: 287).

Jina kurd di civakên berê heta ku wê rojê her tim şîrîka zelamî ye. Di nav civakê de her du kesayetên cih, kar û wateyên hev jî û yên cuda jî hene. Mînak; karên ji derve yên zelaman û yên hundir jî yên jinan tên îfadekirin. Lê jina kurd dema zelam amade nebe çî kare hewcehî, pêwistî hebe jî dike.

Di nava civakê de û li herêma xebatê de ji mêran re ‘malxî’, jinan re jî ‘kabanî’ tê gotin. Lale Yalçın Heckmann ‘ reîsê malê û reîsa malê’ jî nav lê dike (Yalçın-Heckmann, 2016: 217-218). Dibêje jî rola kabaniyê zûtir xelas dibe, ji ber ku jinik li gorî zelaman zûtir ji dest û piyên xwe dikeve. Bi fizîkî kême dide.

Li gorî gelek lêkolîner û nivîskarên kurd û biyanî jina kurd li gorî jinên dewletên derdora xwe -ku ev Ecem, Erebn, Fars û Tirk in- çêtir azad û şolker bûne. Li dema berê Îslamiyetê ev rewş çêtir hatiye pêş çav. Lê şûnde tixûbkariyên li gel olî lê çêbûyîne. Warê jiyana wê ya berê teng bûye.

Li rastî van tiştan jî car din kar û barên jinê gelek bûn. Ji zarok mezînkirinê heya ku mêvan pêşvazîkirinê her kar dikir. Dema lê temaşe dikin di jiyana kurd de jinên li gund ji yên bajarî çêtir jiyana ji derve dizanin, xortir, azadtir û zîrektir in. Ev rewşe di jiyana koçerî de siruştî ye. Di jiyana bajariyan de jin pitir nava malê de ye. Karê ji derve bahra mêran e. Li nava malê her tim stûyê jinan e.

Azîz Thomas Bois ‘Kurd jin û mêran hevpar digirin. Karê malê her tim jin rêve dibe, terazûna malê her tim destê xwe de digirin û zêhakirina malê li gorî xwe eyar dike’ dibêje (Aslan, 2011: 113).

Piştî gund hatine valakirin jî jin pitir ji malê dernekeftin. Ne ziman, ne xwendin nebû û ev jî kêmasiyên zedê di jiyana bajarî de derdixistin holê.

Li gorî Îsmail Beşikçi ji jina koçer û ya bieşîr ewqas zêde kar dike ku heya halî wekî di asta kedxwarî de difikire û dibîne (Yalçın-Heckmann, 2015: 250).

Lê jina kurd roja em hatinê li bajaran jî bi riya gelek derfetan xwe ji kêmasiyan hînî ku çêdibe dûrtir diêxe. Gelek cihan de pêşve çûyîye. Em têra malê û hem jî têra ji derveyî malê dike.

1.2.6. Di kultûr û wêjeyê de

Di kultûr û wêjeya kurdî de jin cihek girîng digire. Û ev rewşa wê di warên Kurdistanê de xwe cuda cuda nîşan dide. Axiftin, cil û berg, xwarin-vexwarin û hwd her derê cuda tê xuyakirin. Ev jî ji bo welatê kurdan dewlemendiyê nîşan dide.

Dema li wêjeya kurdî dinêrin; du serdem tîr pêşiya me. Ev jî: dema berhemên devkî û yê nivîskî. Berî sedsala 20an de pitir wêjeya kurdî kevneşopiya herî kevin bi dengbêjiyê ve tê pêşiya me. Ev berhemên henê jî piranî helbest û qisên kurt bûn. Sala 1898an de bi derkeftina rojnameya Kurdistan re serdema nivîskî di nava wêjeya kurdî de dest pê kiriye (Yıldırım û n.d., 2013: 135-136).

Di her cure serdem û cureya wêjeyê de jina kurd mijar manê bo xwe her tim cih dîtiye. Hin cihan de evîndar e, hin cihan de pira mirovxwer e. Bi rastî de jî jina kurd serdema pêşî de çiqas mijar jî be di jiyana rasteqîn de bêjera yekemîn jî ew e. Jina ji bo ku zarokên wan xew dikevin, an jî şevên dirêj bi kurtasî bigehin rojê hergav çîrok vedigotin. Lê dema tîr dema nivîskî de rewşa jina kurd di vegotinê de kêr bûye. Rewşa jinên nivîskar ên kurd li hemberî yê mîr kêr in. Bes mijar manê hêjta jin bi eynî girîngiyê ve di nav wêjeyê de cih digire.

Dema di wêjeya kurdî de li destanan dinêrin; Xecê û Siyabend, Zembilfiroş û Xatûn, Stî û Ferxî, Mem û Zîn, Cembelî û Binefş û hwd de jin cuda cuda nasnameyan ve tê temsîlkirin (Zîlan, Roşan, 1996?: 1-184).

Dema nivîskarên jin jî dinêrin; nivîskara berhema girîng Tarîx-î Erdelanê Mestûre Maxşeref Xanim (Adak, 2011: 131-143), Suzan Samancı, Evrîm Alataş, Bêjan Matûr û hwd dikarin mînak bidin.

1.3. Di Colemêrgê De Nasnameyên Jin û Rîtuêlên Pêkhatina Wan

Dê bin wî banî de nasnameyên jinê bidin nasîn. Ev danasîn li gorî zewac û lêzîmiya mirovan hatiye kirin.

Lale Yalçın Heckmann temenên zewacê li gorî hinek şert û derfetan ji hev cuda kirine. Li gorî wê, cudahiya temenê zewacê wiha xwe diguhere û wan şertan wiha rêz dike:

- hejmara kesên malê yên kedkar,
- hebûn û nebûna bûkê ya li gorî keda keçe,
- taybetiyên keç û kuran yên bişexsî (kor, seqet, saxlem hwd),
- bandorên zewacên malbatê yên berê,
- rewşa perwerdehiyê ya keç û kuran,
- rewşa wan ya aborî (Yalçın-Heckmann, 2016: 295).

Divê bê zanîn ku jiyana berê li ser jiyaneke hevpar rêdîçû. Lê di nava pêşveçûna her tiştî kar û barên jin û zilaman jî ji hev veqetiyên. Jiyana eşîrkî û ya niştecihî gelek zorî ji bo merivan li gel xwe anîne. Jin û zilam di herêma Colemêrgê de ji bo van statûyên xwe navên wek “malxwê” û “kabanî” bikar tînin (Korkmaz, 2018:79).

Malxwê; gelemperî li rastî cemaeta mêran û kesên biyanî eleqeder e. Lê divê gelek têr û tijî be, têra xwe û malê biketin.

Kabanî; bi giştî ye zîrek e. Tê wateya xanima malê, taybetî û karên civakî têxe ser milên wê. Nan patin, kûn û tevn raçandin, cil û berg çêkirin, çêkirina tiştên şîremenî û hwd hemû karên wê ne. Ji xeynî van eger zilamê malê, malxwê li malê amade nebe, pêşewaziya mêvanan û malxwêtiya malê jî bona wê dimîne.

Jiyana koçerî li gor yên niştecihî û ziraî gelectir jiyaneke hevpar ava dike. Li nav jiyana niştecihî de kabanî gelectirê li ser şolên nav malê mijûl dibe û cih diîne. Heta li gorî fikra Îsmâil Beşikçi; jinên koçer pitir dikevîne nav hilberiyê, ji ber vê jî li nav malê û civakê de keseke girambar e (Yalçın-Heckmann, 2015: 250).

Jinên koçer li gor yên niştecih, di zewac û rêveberiyê de gelectir xwedî maf in û bandêr in. Heta dema malxwê malê dimire bo rêveberiya eşîreta wî jina wî ya aqildar an jî dayîka wî diçe cihê wî (Korkmaz, 2018: 81).

Kî ew eşîretên ji aliyê jinan ve dihatin birêvekirin ve şer zû xelas dibûn û agirbest dihatin kirin. Ji ber ku binyata wê de zordarî û şerkirin nebû. Heta di nava

kurdan de eger jinê destmala xwe avête li nav meydana şerî de wê gavê şer disekinî û xelas dibû. Tu kesê yek qise nedikir.

Yên ku niştecih bi giştî eşîr bûn. Eşîr; yekîtiya komek babik û binemalên ku mirovên hev in û yê di bin serokatiya axayekî de ne. Mirovên di nav de bi baweriyekê ve xwe lêzîmên hev dibînin. Mukelefiyetên cur bi cur hene û civakeke bi kodên (bernav) etîkî xweyî ye (Yalçın-Heckmann, 2015: 248).

Niha li gorî zewac û lêzîmiya mirovan em dixwazin nasnameyên jinê û rîtuêlên pêkhatina wan yê herêma xebatê parve bikin.

1.3.1. Nasnameyên Jin

Em dê niha li gorî berhemên ku me berhevkerî de nasnameyên jinan mînak bidin û dê dahûrînin. Her peyveke xwe dê bidin zanîn û mînakekê bi berhemên xwe ve dê bidin.

Jin: Kesên zewicî (qîz) re tê gotin. Temenî jî îfade dike. Gelek bi peyva “dayîk” ve nêzîk dibînin; lê divê bê zanîn ku her dayîk jin e, lê her jin ne dayîk e. Qîz eger şû kiribe, bîjin be û yan jî hevberdayî be jê re dibêjin jin. Her du peyv jî gelêk û eynî hevokê de derbas nabin.

Mêrik jî hevjinê xwe wekî “jin” yan jî “jinik” gazi naketin. Şûna wan “keçe”, “keço”, “keçik” tên gotin (Yalçın-Heckmann, 2016: 293). Ji bo mêrikên mezin û zewicî jî “zêlam” tê gotin. Yê temen biçûk jî “kur, kurik” tên gotin.

Stran û çîrokan de bi nasnameyên cuda ve tê pêşiya me.

Di stranan de li ser xerîbî, delalî, eşq û evîna wê, xayintiya wê û bi gelek hêstên cur bi cur ve gotin hatîne nivîsîn. Di çîrokan de jî jinên xwedî nasnameyên cuda tên ber meriv. Çawa ku yê baş, aqîldar, wêrek û cangorî hene wisa yê hesud, fesad, bêaqil, neyar jî hene. Çîroka Tûsî Mirarî de jina ji bo eşqa xwe her tiştî -xwe malbata xwe jî -pişt xwe ve dihêle tê pêş me. Di çîroka Hakim û jina xwe û Ehmed Çelebî de jina aqîldar, qencyên wê û kesên ji van qencyan sûd verdigirin xwe xuya dikin. Çîroka Melîk Simaîlê Deravê de car din jina aqîldar xwe, hevserê xwe û civaka xwe çawa aniye asteke bilind tê pêşiya me. Berhema me ya Bêaqilî de dij van nasnameyên jinan; jinên bêaqil, bêkêr tên xuyakirin. Di Hacîreşkê de jina wêrek û cangorî tê pêşiya me. Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tên dîtin: (bnr: 2.1.2.1, 2.1.2.2 û hwd).

Dayîk: Kesa ku meriv aniye dinyayê ye, ya ku mirov jê çêbûye. Lê nayête gotin ku hema ev çende ye. Peyva herî giran e belkî bo ravekirinê. Ji ber ku her wateya xweş û baş ew e, lê çend peyvên cihanê de jî têra ravekirina wê naketin. Wekî me di peyva jinê de jî gotî; her dayîk jin e, lê her jin mixabin ne dayîk e. Erk, rol û nasnameyên wê yên cuda nayên hejmarkirin. Jêhatibûna dayîkê V. Hugo wiha rave dike: ‘ Jin zeîf lê dayîk biqewet in’ (Yalçın, 2004: 482).

Mînak; di stranan de li ser viyan, xerîbî, evin û janên dayîkê gelek hêst hatine ziman. Çîrokan de jî dayîk pîranî ye dilsotî ye, baş e, serî de ji bo zarok û hemî hezkiriyên xwe ye cangorî ye. Dayika xirap ewqas kêr tê pêşçav ku li berhemên me amade kirî de her tune ye.

Li herêmê wekî ‘kabanî’ tê îfadekirin.

Di Dindikharê de dayîkeke nexweş lê car din di her halî de mal û kesên xwe difikire tê dîtin. Berhema Ehmed Xerîbe de dayîkeke baş, hizirdar, binamûs tê dîtin. Di Pîra mirovxwer de her çiqas taybetiyên efsanewî xwe de hewîne jî car din bo keça xwe dayîkeke baş e. Di berhema Zêmara Dayîkê de dayîkeke dilsoj û dilsotî xuya dike. Di berhema Warê Mendana jî dayîka dilsoj û cangorî lê car din ye bêhêvî tê pêşiya me.

Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tên dîtin: (bnr: 2.1.1.19,2.1.2.2 û hwd.)

Keç: Ji çar pênc saliyê heta ku dizewice ji qîzan re tê gotin. Ango qîza neşûkirî ye. Di herêmê de eger şûyê keçikê demek zûde çênebûbe jê re pîrsa: “tu keçî an jin î?”, hayê kirin. Jê re bi şiklê “tu keça malê yî an bûka malê yî?” tê pîrskirin.

Nasnameya keçikê stran û çîrokan de xwe cuda şanî mirov dide. Delalî, ciwanî, neheqî û buxtana lê tê kirin, safîtî û paqîjiya wê, gelek cihan jî stûxwariya û wêrekiya wê ya li hemberî fesadî, hesudî, neyarî û xayîntiyan li van berhemên de tê îfadekirin.

Mînak; strana “Momin û Hay Sînemê” de hesudî, çîrokên “Dindikhar”, “Tusî Mirarî”, û “Darka Berhêk” de jî neyarî û xayîntî herî aşîkar tên pêş me. Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tên dîtin:

(bnr: 2.1.2.5, 2.1.2.10,2.1.3.2,2.1.3.3. û hwd.)

Bûk: Bi qîzên nû şûkirî re tê gotin. Jina kurê mirovî ye. Ev nasnamejî bi taybetiyên cuda ve tê xuyakirin.

Hin berheman de bi aqil û zîrekiya xwe ve, hin cihan jî bi nebaşiya xwe û kesayeta xwe ya xirap ve tê teswîrkirin. Di stranên kurdî de pirañ yan li ser evîna wê yan jî li ser tîkiliya navbera wê û xesûya wê qise tîrên rêzkirin.

Di herêmê de nîşaneyek wiha ya derûngiran û binbîr xwe xuya dike: eger bûk keseke har be, an jî xwe ji derveyî malê kesek baş nîşan bidetin dema ji aliyê xesûyê ve tê behskirin “erê jina mala ye!” tê gotin. Lê mirov wî demî dizane ku navbera wan nexweş e.

Berhema ‘Hevmehiya Jin û Çêlê’ de bûkek nû, nezan, nifrîn lêkirî û ye baş; ‘Xecukê Sêhlê Bîne’ de bûkeke zîrek tê xuyakirin.

Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tîrên dîtin: (bnr: 2.1.2.6, 2.1.2.1 û hwd.)

Bûka herî balkêş jî “Binefşa Narîn” ku evîna Cembelî ye tê pêşiya me. Ev gotinên wê yê xwesûya xwe Lêlavê dike, wê dike bûkek cuda:

Dê hejînim hêdî hêdî pê destmalê pê keftiye
Ez dê ezê dê rabim landikê çêbikim darê tûyê
destê xwe bidim destê Cembeliyê kurê mîrê Hekaryan
Dê Cembeliyê biçûk bihêlime hêviya pîrê û xwesûyê.
Lorî lorî Cembeliyê mino lorî
Tu li ser serê min hatî welatê Hekaryan zozanê jorî
Îro ez dê serê Cembeliyê biçûk Ehmedê pismam
Li gel êl û eşîra giran ji te re bikim gorî (Colemêrgî, 2001: 169).

Neve: Ji zarokên zaroyên kesekê/î re “neve” tê gotin. Bi tena serê xwe zayenda peyvê nayê diyarkirin. Lê dema hevokê de bi qertafan ve dibore mirov dizane ka kî ye û çî ye.

Di herêmê de xuya dike ku neve ji aliyê pîr û bapîrên xwe ve, ji dê û bavên xwe pitir tîrên hejêkirin. Pirs dikim “madem wiha ye, çima dibêjinê neve?”. Bersiv wiha ye: “Em naxwazin viyana me belî bibe. Da ku dilê day û bavên wan nemînî”.¹ Li ser zimanê herêmê ji bo viyana neviyan ev qise jî tê gotin: ‘Eyal dil e, neve kakil e’.²

Li nav civaka herêmê ev rîstên henê ji bo neviyan tîrên gotin:

Xwedêyo tu yê li banî
Tu emri nestîne ji canî
Xwedêyo tu yê dibînî
Tu şûrhekê li dor werînî
Çavêt hesûdan yê dipeqînî
Xwedêyo tu pîr bike

¹ Şîrovekirina ji aliyê Ayşe Ücar û xwe jî xudan neve ye.

² Şîrovekirina Fatma Adıyamanê.

Dest û pêkan lê stûr bike
Melkemoto tu jibîr bike
Dest û pêkan bide tifala
Da pê biçin malên xala.³

Nevisî: Bi zarokên jina kesekî lê ne yên wî bi xwe (ji bo mêran) û zarokên mêrê kesekê lê ne yên wê bi xwe (ji bo jinan) re “nevisî” tê gotin. Zewaca li ser nevisîyan li herêm pir kêr e. Lê yên tên kirin jî ev in ku bira mirî ye û jinbira bi eyalê xwe ve bi tiyê wê ve tê mahrkirin (Yalçın-Heckmann, 2016: 309).

Mînak; dema di berhemana de nevisî dibore îhtîmalek mezin heye ku jinbab jî heye li wir û kêr jinbabên baş tên dîtin. Piranî nebaş, hesud, zilmdar tene wesifkirin.

Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tên dîtin:

Di ‘Dindikhar’ de nevisiyek baş, bêguneh lê jinbavek zalim û jiyana wan ya bi hev re tê dîtin. Di berhema ‘Gulbeyaz’ de jî jinbavek zîrek, hişyar û li nevisiyên xwe xudan, baş û wekî dayika wan bi xwe tê dîtin.

Diş: Xwîşka jina kesekî yan jî xwîşka mêrê kesekê re “diş” tê gotin. Xwîşka mêrî dibe şûxwîşk, ya jinê dibe bûxwîşk (WQFerheng). <https://wqferheng.tr.uptodown.com/android/download> d.g.: 16.06.2019).

Ya mêrî dibe xwehmêr, ya jinê dibe diş.

Li herêmê piranê bûk peyva diş bikar bîne jî mêr her tim ji bo dişê peyva “xwîşk” bikar tîne.

Di berhemên ‘Dirik û Dirikê û Jinbira’ de dişên feqîr, dilpaq û li rastî buxtankirina jinbirayan hatin tînin. Ji xeynî van, hin berhemên din de jî ev hal li rast me tê. (bnr: 2.1.2.18, 2.1.2.19 û hwd).

Hewî: Du yan zêdetir jinên heman mêrî re tê gotin.

Herêmê pirzewacî kêr bûye û piranî jî di wê zewacê de ya polîjin tê dîtin. Cudahiya jinan wek bi gotinên; jina mezin, ya biçûk ve tê çareserkirin (Yalçın-Heckmann, 2016: 301-309).

Ev nasnameya tena serê xwe bûye mijara gelek berhemana. Yan pêknekirina her du hewiyên tîne ziman, yan jî nerazîbûna keçan ya li hemberî wê zewacê tê behskirin. Strana ji aliyê Eyşe Şanê ve hatiye gotin rewşê baş îzah dika:

Weleh te nagirim, bileh te nastînim
Weleh te nagirim lo, bileh te nastînim
Derdê hewiyê bileh nakşînim

³ Şîrovekirina Ayşe Ücarê.

Dayê ez nagirim, bavo ez nastînim.

Jinên wî dido ne, çavên wî birçî ne
Li malê pevçûn e, wele nastînim
Jinên wî çar in, bi dost û yar in
Weleh te nagirim, bileh te nastînim (Diljen û n.d. 2014: 217).

Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tîn dîtin:
(b.n.r. : 2.1.1.15, 2.1.1.18 û hwd).

Ji xeynî van di pirtûka Ferit Edgü de li hemberî hewîtîyê nêrînek bi çavên kesek biyanî ve hatiye kirin. Jina herêmê bi van hevokên xwe ve li mafê xwe digeriye:

Zazî tê. Piştî kurê wê yê mezin, Fazil.
Rûyê min mêze nake. Ser piyan disekine. Ji Fazilî re dipeyîve.
Fazil ji min re vediguhezîne.
Hûn ê bibêjin, diya min wisa dibêje.
Ew dixwaze ku tu jî ji bavê min re bibêjî.
Dibêje, jê bipirse, ma Zazî nexweş e, bêjê.
Ma wê çar kur nedan te, bêjê.
Ma ew ne ciwan e, bêjê.
Jê bipirse, dile te ketibû wê keçikê, qey.
Erê, bibêje, derew e; wî rûyê wê nedîtiye ku dil bikevê.
Tu biyanî yî, dibêje diya min, carek jî tu bibêje bavê min.
Ger wî soz dabe bila cih bîne, lê bil amin nas neke, wisa.
Bêjê, dibe ku guh bide we, dibêje diya min.
Ev gerdîşek çawa ye ku, maf tune, qanûn tune; viyan tune,
Rêz tune, rojên hev re derbasbûyî tune, tenê mist heye.
Tenê kêmdîtin heye.
Van jê re bêje, fehm neke jî bêje, dibêje diya min.
Yêk jî ew, hûn, yê biyanî, bibêje.
Dibe ku guhdarî bike, dibêje, guh nede jî bêje, dibêje.
Wiha dibêje diya min.
Hêstir li ser rûyên Fazilî dikevin.
Serê kurê xwe hemêz dike li ser singê xwe Zazî.
Piştî wekî ku ji tiştî kirî re şerm kirî, ji milan wî digire û dihejîne.
Ji bo cara yekem, piştî ketiye odeya min, li min mêze dike.
Dê bibêjî, tu dê bibêjî gotinên min?
Çavên wê di çavên min de.
Serê xwe ditewînim.
Bavê te li ku ye? Dibêjim Fazilî.
Çû gundê jêrî, dibêje Fazil, li Palanisê.
Bûk dê ji Palanisê bê?
Na, dibêje Zazî, bêje wî, bûk nayê. An jî ez dê biçim.
Ji bo cara yekem, divê kesek xirap bike wê gerdîşê, xirap ne wisa?
(Derdikevin?)
Bê guman divê yêk wê gerdîşê cara yekem xirap bike.
Lê bele kesek biyanî dê çî li wê bike⁴? (Edgü, 2019: 196-197).

⁴Orjînalê metne: “Zazi geliyor. Yanında büyük oğlu, Fazıl. Yüzüme bakmıyor. Ayakta duruyor. Fazıl’a konuşuyor. Fazıl bana aktarıyor. Sen söyleyeceksin, anam öyle diyor, Babama bir de senin söylemeni istiyor. Diyor ki, sor ona, hasta mı Zazi, de

Xesû: Dayîka mêrê jinekê (bo jin) û dayîka jina zelamekî (bo mêt) re “xesû” tê gotin. Nava civakê de wekî demên berê nayê watedarkirin. Fikra gelek ew e ku bûkên niha yên bûyîne xesûyên berê. Tê gotin ku ji destê xesûyên nêzîkî çil pêncî sal berî niha bûkan gelek zehmetî dikişand. Lê ev jî tabî dibe nêrîneke îzafî.

Lê herêmê niha her bûkên nû, heman di roja dawetê de mal cuda ye. Ji ber vê wekî berî gengeşiyên wan nayên bihîstin.

Di stranên herêmê tên gotin de li ser wê nasnamê pir gotin hene. Li jêr straneke li ser fikrê û ramana, îdraqa xesûyê hildin dest:

Evinin direği değil mi, de
Sana dört oğlan çocuğu vermedi mi, de
Genç değil mi, de
Sor ona, gönlün mü düştü o kıza, diye.
He, derse, yalan; görmedi ki yüzünü düşsün gönlü.
Sen yabancısın, diyor anam, bir de sen söyle babama.
Söz verdiyse tutsun, ama beni de yok bilsin, böyle,
De, belki seni dinler, diyor anam.
Bu ne biçim töre ki, hak yok, hukuk yok; sevgi yok,
Saygı yok; yaşanan günler yok, yalnız yumruk var,
Yalnız horlanma var.
Bunları söyle, anlamasa da söyle, diyor anam.
Bir de o, sen, yabancı söylesin, diyor.
Belki dinler, diyor, dinlemese de söylesin, diyor.
Böyle söylüyor anam.
Al yanaklarından yaşlar iniyor Fazıl'ın.
Zazi oğlunun başını alıp bağrına basıyor.
Sonra yaptığından utanmış gibi omuzlarından tutup sarsıyor oğlunu.
İlk kez, odama girdiğinden beri ilk kez, bana bakıyor:
'Söyleyecek misin? Diyecek misin dediklerimi?'
Gözleri gözlerimde.
Başımı eğiyorum.
Baban nerde? diyorum Fazıl'a.
Aşağı köye indi, diyor Fazıl. Palanis'te.
Palanis'ten mi gelecek gelin?
Na, diyor Zazi, söyle ona, gelin gelmeyecek. Ya da ben gideceğim.
Bir kez, birinin bozması gerek töreyi değil mi?
(Çıkıyorlar)
Hiç kuşkusuz bir kez birinin bozması gerek töreyi.
Ama buna bir yabancı n'eyler?" (Edgü, 2019: 196-197).

XWESÛYÊ

*Hoy xwesûyê xwesûyê
Weyla gidiye xwesûyê
Xwesûyê pîre dêlê
Cadiyê pîre dêlê
Bes bike hêle hêlê
Golîk çûne ber çêlê
Xwesûyan hemûyan hûn bêj ken
Cadiyan hemûyan hûn bêj ken
Tijê qûnê qirêj ken
Kerî li ber da dirêj ken
Hoy xwesûyê xwesûyê
Xwesûyê pîrê taw tê
Cadiyê pîrê taw tê
Bes bike qewte qewtê
Êvar e bûkê xew tê
Xwesûyan hemûyan ceminin
Cadiyan hemûyan ceminin
Şûnkekê bo min bînin
Ca xwesûyan pê hebînin
Xwesûyê tûrê maşa
Cadiyê tûrê maşa
Avête pişt tiraşa
Mişka bûye şabaşa
Xwesûyê tûrê birinci
Cadiyê tûrê birinci
Avête milê quncî
Mişka jê re qurincî
Xwesûyê tûrê nohka
Cadiyê tûrê nohka
Avête kendaloka
Mişka bûye hoq hoqa⁵*

Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tînin:(bnr: 2.1.1.14)

Jinbab: Kesa ji zarokên dayîka wan mirî re yan jî sax re dayikîyê dike re tê gotin. Jinbav û dêmarî jî jê re tê gotin. Û ev kesayete xwe li nav çîrok û stranen de gelek balkêş û ji cureyan cuda cuda ve nîşan dide.

Dema mirov jinbab û dayikê dide ber hev di berheman de encamên dij dayîkê dest diêxe. Ev jî bona cudahiya her duyan bes e. Di berheman de ji bo vê nasnameyê pîranî mînakên nebaş tînin dayîn. Mînak di berhema ‘Dindikxinar’ de jinbaveke xafîn, hesûd tî pês me. Çiqas ji bo nevisiya xwe Dindikxinarê ye nebaş be, ji bona keça xwe baş e. xirabiyê her tim bo nevisiyê difikire. Lê hin cihan jî dij van nasnameyên

⁵ Çavkanî: Merhûm Osmanê Ebûbekir.
Bêjer: Ayşe Ücar.

nebaş jinbavên baş jî hene. Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tên dîtîn: (bnr: 2.1.1.18, 2.1.1.15 û hwd).

Jintî: Jinên du birayan bo hev û din dibin jintî. Ew jî cihên cuda û kesayetên cuda xwe xuya dike.

Di berhemana de ji xeynî jintî, jinmam û jinxa jî diborin. Lê jintî û jinmam piranî ne. Gelemperî jî kesên wek hesud û nebaş tên wesifkirin. Lê belê em dij van nasnameyan ya herî baş di mînakek baş de dibînin. Ev mînak jî mînaka Xecê û Siyabend e.

Mînakê de herkesên gundi ji Siyabend aciz in û dixwazin wî ji gundan derbêxînin. Gazindeyan bona mamê wî dibên. Lê jinmama wî lê xwedî dikeve û dibêjîte hevserê xwe:

Bi Xudanê şev û rojê ye,
Ku tu îca destê xwe bidî Gurrî,
ez jinaniyê ji te re nakim li malê ye,
Xelk dibêje Xwedêyo, biraziyekî meriv î mîrxas hebe,
ku meriv karibe here nava xelkê ye (Zilan û Roşan, 1996?: 19).

Ev gotinên dibêjin di çîroka jêrî de jî aşîkar tên dîtîn:

Di çîroka ‘Gulbeyaz’ê de jintiyeke çavpênerabûyî tê pêşiya me. An jî bona her tiştî ye bîrsî û rastî wê jî serîrakin û rêçaredîtina Gulbeyazê tê xuyakirin.

Jinbira: Jina birayê kesekê/kesekî re “jinbira” tê gotin.

Jinbira ango bûka malê piranî di stran û çîrokên li herêmê tînin gotin de kesayeteke nebaş simbolîze dike. Derewker, xeybker tê xuyakirin. Li dişa xwe buxtanan, newehiyan dike. Çawa dema nû tê malê û malê ava dike şûnde jî malê ji binî de jî xirap dike. Ev gotinên dibêjin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tên dîtîn: (bnr: 2.1.3.2, 2.1.3.3).

Pîrik, dapîrk: Hem ji jina ku alîkariyê dide jinên ku dizên re tê gotin û hem jî dayika dê û bavên kesî/ê re tê gotin.

Di jiyana rasteqîn de pîrik û dapîrk pêşî ji aliyê zarokan ve gelek tên hejêkirin. Dema di berhemana de dinêrin berhemên derasayî û yê bi cureyê cefen ve hatine nivîsîn tîne, yê din hemiyan de kesayetek baş tê pêş xwendevanan. Ev gotinên me gotin di hejmarên stran û çîrokan jêrî de jî aşîkar tên dîtîn: (bnr: 2.1.1.13, 2.1.1.20, 2.1.1.10, 2.1.1.11).

Bîjin: Ji jina mîrê wê mirî yan jî jê cuda bûyiye re “bîjin” dibêjin.

Di herêmê de êdî wekî berê dema mêr dimir, ew usûla hema bi tiyê ve dihate mahrkirin ji holê rabûye. Êdî yên ku tena serê xwe jî zarokên xwe mezin dikin hejmarên, rêjeyên zêde nîşan didin.

Lê li ser bîjînan dema tê axiftin jî nexweş jî mirov guhdar dibe. Dawiya hevokê “ma ne bîjin e”, tê gotin. Ango tê wê wateyê ku çî bike, ew tiştên kirî layiqê wê ne. Ji ber ku bîjin e û ye canbaz e! Ev gotinên dibêjin di çîroka ‘Dindikhar’ de de jî aşîkar e.

1.3.2. Rîtuêlên Pêkhatinê

Xwezgînî, Keç xwestin: Di Colemêrgê û devera derdorên wê de kare keç xwestinê mêrik dikin. Jin tevî vî kari nabin.

Xwezgînî wiha çêdibe; ger malbata keçekê ji bo kurê xwe bixwaze pêşiyê ji xizman kesekî nêzik dişîne mala keçikê. Ev kese yan bavê wê re yan jî ji xizmek wê re xizmaniyê dixwaze û ji wan re dipirse gelo deriyê mala wan vekiriyê an na. Ger ku erenî û guncan bibîte dîtin tarixek dide dayîn. Di roja pejirandî de aliye kurikî melayekî, rûspiyekî an jî axayekî li gel hin kesên xwe diben û diçin mala keçikê. Li rexê keçikê ji mezinên malbatê û rûspiyên eşîrê kom dibin. Mezinên aliyê kurikî dibêjin “em dixwazin bi we re xizmaniyê bikin”. Eger aliyê keçikê bersivek erenî bête dayîn, bi hev re fethek tê xwandin û xwezgînî xelas dibe. Spasî ji aliyê keçikê re tê dayîn, şîrînahî tî xwarin û kare xwezgîniyê xelas dibe (Top 2011: 175).

Lûtfî Sezen dibêje ku ev cure zewac li deverên kevneşopê de pitir tê dîtin (Sezen, 2005:186).

Next: (Nextebir, şekerşandin) Vî demî li herêmê next tune ye. Lê hin malbatan rewşa aboriya wan nebaş yan bi navê “heqê şîrê dayikê” an jî ji bona amadekirina cihêza bûkê hin pereyan ji aliyê kurikî (êdî zava ye) dixwazin. Lê ew jî veşartî tê kirin. Piştî nextebirê şîrînahî tî xwarin. Şekerşandin tê kirin. Ev astek girîng e. Ji mêvanan re dema şîrînahî tê belavkirin pakêtek şîrînahiyê di tepsiyê de tê gerandin. Kesê dixwaze bibe birazava dibêje “wî şîrînahiyê bo min bînin” (Top 2011: 176).

Li gorî hin agahiyan jî ev next wekî li herêma xebata me lê hatiye kirin ne tenê pere ye. Hin kes şûna pereyê xanî, bexçe, zevî yan jî ajelên zindî jî werdigirin (Sezen 2005:187).

Cihêz: Dema nextebirê de eger ji bo alîkariya cihêza bûkê hin pere hatibîte xwestin rexê kurikî wî pereyî dide (mîqdara perê li gor demî û rewşa malbatan diguhere). Eger çî xwestin nebe jî rexê keçê bixwe cihêzê amade dike. Gelemperî cihêz li gor rewşa aboriyê tê amadekirin. Herê mî cihêza keçê hinî ku ji destê wan bê baş tê amadekirin.

Mahr, mehr: “Mahr”, “mêhr”, li gorî razî û adetê jinê (bûkê) tete biryarkirin. Gelemperî bi wan zêr û zînetên li ser bûkê ve tê kirin. Bêyî razîbûna bûkê nikarin zêrên wê jê wergirin. Lê eger bidetin jî şûnde divê car din bidene. Mahra jinê ne mal û milkê mala ye.

Pîşteder: Roja duyê ya dawetê jin, zêlam, keç bi stran û govandan ve diçin mala bûkê. Birazava û jina xwe diçin bûkê bînin. Sê caran wê danên û radikî. Cara sêyemîn ji rexê rastê yê bûkê ve pere diavêjin, direşînin.

Lê kesên bûkê nahêlin bûkê ji mal derbêxînin. Ji bo ku der bê vekirin bexşîş dixwazin. Wê bexşîşê re dibêjin “pîşteder”. Dema birazavayî ev bexşîş dayê, bûka xwe dibe û diçe.

Sersenî: Piştî dawetê, rojek nava heftiyê (gelemperî roja çarşem e) mala zavayî xwarinekê, ziyafetekê amade dike. Kesên mala zavayî diçin hem bûkê dibînin û nas dikin hem jî cihêza bûkê li van tê nişandan (<https://hakkari.ktb.gov.tr/TR-160267/evlenme-adetleri.html> d.g.: 17.06.2019).

Xelat: Bi wan bexşîşên xwendiyên hem rexê bûkê û hem jî yê rexê zavayî didin re dibêjin xelat. Kesên nas û nêzîk xelatê xwe aşîkar didin. Yê dîr hatî yan jî rewşa nebaş di zêrê de xelatê didin. Zêr û tiştên cihêzê bona bûkê dimînin. Xelatên ji rexê bûkê ve hatî bona malbaba wê dimînin (Top, 2011: 181-181).

Dawet: Li Colemêrgê dawet sê şev û sê rojan dom dikin. Roja îni êvarî dest pê dike heta şevdîrengiya roja yêkşemê. Nas, cîran, xizim hemî tî qazîkirin bona dawetê. Eger dawet ya kesên nas û nêzîk be malbat hemî, eger hinek dîr û nenas be tenê zêlam diçin. Kesên bûkê aliyê malbata wê, kesên zavayî jî li aliyê malbata wî kom dibin (Top 2011: 177).

Desteser: Piştî çûna xwezgîniyê îcar jî jinên rexê kurikî kom dibin û diçin mala keçikê. Desteserî kare xwezgîniyê binecih dike. Ji bo keçikê (ku êdî bûk e) gustîlk, guhark, bazink, serî heta binî cil û pirsîyariyan diben. (Top 2011: 176).

Nîşan: Di nîşanê de destê kiras fîstanên sor, zêr û diyariyên din bona bûkê diben. Ji xeynî bûkê bona malbaba wê jî diyarî diben. Piştî dawetê bûk jî bona malbaba zavayî diyariyan dibetin.

Xena: Roja dawetê ya pêşiyê piştî wextê êvarî komek ji aliyê zavayî ji bo bûkê destê kiras fîstanên xenayê (yên sor îcar dirûn e, amade ne), zêr û zînetên û xenayê diben. Bûk cilên xenayê li xwe dike, zêran pêvedikin. Dest û tiliyên bûkê têne xenakirin û zêrekê dikin nava destê wê de (Top 2011: 177).

Xena zavayî jî roja dawetê ya yekemîn piştî şîvê kesên zavayî direqîsin û distrînin. Berê xena wî li mala birazavayî dihate kirin. Nas û hevalên wî tevlî dibûn. Niha li cihê dawetê bi stran û govendan ve tê kirin.

Li gorî daxwaz û şertan niha xenaya her duyan bi hev re tê kirin.

Zewac: Zewacên li Colemêrgê her gav pêwendî û meraq kêşandine ser xwe. Li gorî xwedanên dawetê zewac “xêr û şer” in (Yalçın-Heckmann, 2016: 290).

Zewac çiqas statûya jin û kamiltîbûnê nîşan bide jî nayê wê maneyê ku ji bin otorîteya dê û bavan xilas dibin. Zewac, serxwebûna aborî çênake (Yalçın-Heckmann, 2016: 292).

Di kurdî de ji bo zewacê “şûkîrin” an jî “jin îrandin” tê bikaranîn. Lê cudahiyeke nav wan de heye. “Şûkîrin” ji bo jinan tê bikaranîn, “jin îrandin” ji bo mêran tê bikaranîn. Bi îfadekirina gotina Lévi-Strauss ve; mêrik westar e, jin cih guher e (Yalçın-Heckmann, 2016: 294).

Ji bo şûyên nû li gorî demên berê “mal vekirin, mal girtin” pitir zêde bûye. Ji bilî vê keç jî zû nayên dayîn. Heta li gorî xwendin û şolkirinê zewaca keçan pitir paş ve dikeve.

Tenê zewaca olî ne, ya fermî jî divê bê kirin.

Zewaca lêzimî: Ev zewac hêdî hêdî kêmbibe. Berê hem kêmbûna însanan û hem jî fikra eşîrî, zewaca lêzimî pêwîstir dikir. Lê niha çiqas ev zewace hebe jî divê bi dile keç û xortan bin. Eger şiklên din yê zorê nemayîne. Pêşveçûna zaniyên tenduristî jî ev zewacê eyb û nebaş dîtiye. Mirovan jî ev ramane baş dîtiye û bicih tîne. Di demên berê dema dihate kirin jî piranî li nav dotmam û pismaman de dihate kirin. Ev jî bandora pismaman li ser jinê ava dikir û wan ew kontrol dikirin (Yalçın-Heckmann, 2016: 323).

Yekzewac: Zewaca li gel yek kesî re dihate kirin e. Ya ku mafî dide her du milan jî ev e (jin û mêr). Çiqas jiyana kesî de pirzewac -kî piranî ev zewacane olî ne-hebe jî lê di zewaca fermî de tenê yek tê pejirandin. Jin ji hemî aliyan ve wekî mêrî mafdar e û hevpar e.

Pirzewac: Pirzewacî kêr (%5) jî be hêj di civakê de xwe nîşanî me dide (Yalçın-Heckmann, 2016: 301). Wekî pirzewaciyê zewaca duyemîn jî kêr tê dîtin. Lê ev zewacane gelemperî; di nav dotmam û pismaman de, di nav pêguhorkan de û di nav şûyên tî û jinbirayan de (bira mirî ye) tê dîtin. Endogamî şert nîn e, lê ev zewacê bi giştî nava komên ji aliyê civakî û aborî ve nêzîkî hev de çêdibin (Yalçın-Heckmann, 2016: 320).

Li gorî gelek baweriyên çêbûna wê zewacê bi xwestina xwedîbûna zarokên kur ve girêdayî tê dîtin (Sezen, 2005:191).

Gelemperî li Asya û Efrîqayê pitir tê dîtin. Piranî mêr gelek jinan tînin. Tiştên ku hejmara jinên zewicînê diyar dike rewşa mêrî ya aborî ye. Di kraliyet û xanedanan de zêde tê dîtin. Di van zewacan de yan hemî jin wek mafdar in yan jî jina mezin ji yêrî din qîmetir e (Anonim, 1976: 169).

Pêguhork: Wek wateya pêguherî ye. Li hemberî zewaca du kesan, zewaca du kesên din tê şertkirin. Bîryar gelêk tê dayîn, malbat bîryarê didin. Di zewaca pêguhorkî de zewaca du kesan bi girêdayî qebûlkirina du kesên din e, bîryar hev re tên dayîn (Beşikçi, 1969: 163). Di nava wê zewacê de pêguhorkiya xwîşkan gelectirê tê kirin. Her jî bi nêzîkiya xwîna baban ve. Ango nava dotmam û pismaman de.

Next jî di herêmê de cihek girîng digirt lê niha hema hema xelas bûye. Pêguhorkî li hemberî nextî wek jêbirkek hatiye dîtin. Ji ber ku her kesî nedikarî nextî bidetin (Yalçın-Heckmann, 2016: 335).

Niqirkirî: Zewaca niqirkirî li herêmê nayê dîtin. Di demên berê de jî ku yêrî di nav jiyane de niqirkirî dikirin koçerên dihatin herêmê bûn.

Lûtfî Sezen dema behsa wê cureya zewacê dike, parve dike ku navê wê zewacê di wêjeya tirkî de di pirtûka Dede Korkut de derbas dibe û dibêje: ‘Ew kesên ji hev du pir hez dikin, dost, lêzim an jî cîranên êk hêjta zarokên wan di landikê de nişana wan dikin. Da ku dema mezin bûn jî bi hev re zewicin’ (Sezen, 2005: 188). Hîndistan û Awistralyayê jî ev cure zewacê tê dîtin.

Revandin: Ev riya zewacê, eger çêbûna zewaca her du evîndaran îhtîmal nebe, yan jî navbera malbatan de nexweşî (şer û xwîndarî) hebe diçêbe. Piranî bi daxwaza her du rexan ve tê xwestin (keç û kur). Lê bele yê ku nedilê keçe jî ango zorî jî tînê kirin. Îhtîmalek heye ku yan malbatan pêk tînin yan jî bi riya wan evîndaran de du kes din tînê zewicandin. Ango di şûna revandinê jî pêguhorkî çêbûyîne. Ji dil be yan bêdil be di demek dirêj yê şûnde keça revî an jî revandî ji aliyê kesan ve tê qebûl kirin. Ya ji nedil û zorî ka wan hemiyar efû dike an jî vê jiyana xwe dipejirîne kes nizane. Di nava pêlên jiyane de diherike diçe emrê wê.

Di wê zewacê de piranî keç tînê revandin. Lê belê kêmkêmkê jî hatine revandî vî meriv rast tê.

Di herêmê de revandin kêmkêmkê tînê ev jî dawiyê tînê efû û çareserkin.

Naîlî Boratav sedema wê zewacê ya herî girîng “next” dibîn (Boratav, 1973: 204-210).

Hevberdan: Hevberdan di zewacan de eger pirsgerêk hebin û neyên çareserkin tînê kirin. Jin û mêr jî hev vediqetin. Mafên xwe li dozgehan û bi hiqûqî parve dikin. Çiqas serî de nehatibîte pejirandin jî ev riya çareseriyê roj bi roj zêde dibe. Lê mixabin fikr û ramanên nebaş jî xwe li nav wê de bicih dikin.

Li herema Colemêrgê hevberdan gelek kêmkêmkê e. Heta li gorî TUİKê ev statîstîkên henê hatine parvekirin:

Li gorî TUİKê bajarên herî hevberdan tînde zêde wiha hatine rêzkin: Stenbol, Îzmîr, Enqere, Antalya û Bûrsa.

Car din li gorî vê statîstîkê; bajarê Colemêrgê ku di hevberdanê de bajarê xudanê rêjeya herî kêmkêmkê hat tespîtkirin. Li gorî statîstîkê di salekê de 45 hevberdan li bajarî çêbûyîne (tuik.gov.tr). Di sedemên hevberdanê de yê herî pêşçav evên henê hatine dîtin: sedemên aborî, xapandin, kiryarên nebaş û xwedî zarok nebûyîn (<https://t24.com.tr/haber/tuik-acikladi-iste-turkiyede-bosanma-nedenleri,511202> d.g. 09.06.2019).

BEŞA DUYEM: 2. DI ÇÎROK Û STRANÊN GELÊRÎ YÊN COLEMÊRGÊ DE NASNAMEYA JIN

2.1. Berhemên Berhevkarî

(Ev beşa henê ji ber ku çêtir bê ravekirin, li gorî cureyên berhemên ku hatine komkirin ve di bin sê serenavan hatine birkirin. Li gorî xeta çîrok, stran, çîrok û stran tevlihev hatine dayîn.)

2.1.1. Berhemên Çîrokî

2.1.1.1. Dindikhinar

(Dindikhinar serlehenga wê çîrokê ye. Ye paq û paqij e. Xirabî di dilê wê de nîn e. Her tim dilê temîz diçe mirovên rastî xwe. Xirabiya xwe jî û ya kesên din jî naxwaze. Keçeke biedeb e. Rastî insanan tevgerên bêrêzî nîşan nade. Belkî kêmasiya wê ya herî mezin jî cihekê ew e ku baweriya xwe dide her kesan. Ev rewş jî tiştên nebaş tîne serê wê. Di nava çîrokê de wek sembola başî û sebrê ye. Her tim başbûna xwe ji dest bernade û dawiyê jî digehe encama erênî. Weke di jiyana rasteqîn de çiqas kesên baş û nebaş tîne jiyana me de eynî wisa di jiyana Dindikhinarê de jî yên wisa hene. Cîrana wê, hevserê wê û malbata wî yên baş in. Jinbav û zirxwîşk yên xîrab in. Tiştên efsaneyî jî tê de hene. Keçik di jiyana xwe de tiştên dayê, bavî û civakê lê dayîne hînkirin tîne cih. Wisa jî xwe û nasnameya xwe nîşanî me dide. Lehenga jinbav; wek her gav (zêdetir) yê xirab e. Fikr û hereketên şeytanî çêdike. Wekî vebêja me jî dibêje yêke canbaz e. Her tim hesûdî, çav pênerabûyî, xirabî û derew di jiyana xwe de cih tîne. Dawiya hemûyan jî belkî ya çîrokê baş dike ew be ku nagehe çî tiştî. Heqê wê jî ew e. Kesên wiha di jiyana mirovan de wekî azmûnan divê bîn dîtin. Wek başiyê nebaşî jî tiştan hînî mirovan dikan).

Di zemanê berê de, di zemanê feqîriyê de zalamekê jinek hebû. Jinika wi geleke berkeftî bû, qîzek jî hebû. Keça wi hindî ye jêhatî bû, hindî ye taze bû, hindî ye nazdar bû gotin şîbî dindika hinarê hind ye taze ye. Zalamî ewqas hej keça xwe dikir û digote ‘Dindikhinar’.

Rojekê dayika wê nesax bû. Nêzikî salekê dayîka wê ma li nav vê nesaxiyê da. Hêjta nemirî mêrê wê çû gotê:

-Evdâ Xwedê. Ez hez dikim ka çi wesiyetên te hene, bike. Ez ricayê ji te dikim. Wê kulê nehêle di dilê min da. Da ez wesiyeta te bi cih bînim.

Jinê gotê: -Evdê Xwedê, ewilî emanet û sed emanetê te Dindikharin. Piştî hingê cilkên min bike torbeyekê da, ho ber xanî da hilawise erdekê ve. Heçî gava te cilkên min înande derê, te dît rizîne, peritîne hingê bo xwe jinkekê bixwaze.

Mêrê wê ji gotê: Wehde bîtin ez soza te erdi nedem. Ez eynen şîbî te bikem.

Jinika me çû rehma Xwedê. Mêrikî jî taziya xwe deyna û hemî wazîfên taziye bi cih înan. Piştî taziye mêrik rabû cilkên wê kirine torbekekê da û mezelga xwe da, darikekê we hilawîstin. Wi û kiça xwe ya 14 salî bi hev re jiyana xwe dewam kirin. Jinikê wesiyetek keça xwe jî kiribû.

Jê re gotibû: - Kiça min, me çêlek ya heyî, çi zemanê dê her çêl biête serjêkirin. Çi zemanê babê te çêl ser jê kir –ha bo xêr, ha bo xwarina xwe- hestiyên çêlê lêk bide. Ca hûn bixwen, ca jî bo cîranekê biben, hestîkên çêlê lêk bide. Bo çi kesî nebêje. Bo babê xwe jî nebêje. Here hafîrkê çêlê, erdê he we giya tê da didayê, vekole, kole, kole û bike wê rê ve.

Keçikê gotê: - Dayê wê ca ez bo çi we lê bikem. Ma hestiyên ez ê ku lê bikem.

Gotê:- Kiça min hema tu bike bin ve, bêje bila. Qederî du heftiyên bila biçin here vekole. Tu dê berê xwe bideye, dê zanî ku lê hatine, bûne çi.

Kiçê got: - Temam dayê. Ez soza te erdi nadem.

Mêrikî jî cilkên wê wekî wê gotiyê hilawîstibûn. Nêzîkî du heftiyên borî bibû li ser mirina wê. Jinikek hebû li gundê wan, bîjinek bû. Êke gelek ye canbaz bû, her kesek nefret jê dikirin. Kes hej jê nedikir. Du caran derî wan de hat û çû. Navbera wê û Dindikharê de ev axiftin derbas bû:

- Dindikharinara min ka tu çi dîkî, tu ye çawa yî?

- Xalet ez ye baş im.

- Keça min tu hinde ye delal, hinde ye nestêleh, ma tu dê çawa şolê wê malê bikî? Dê bila babê te bo xwe jinikekê bînin.

- Xalet wele dayika min wesiyetek li babê min kiriye. Babê min jî wesiyeta dayika min li erdi nadetin, dil nadetin.

-Çi wesiyete keça min, çi gotiye?

- Wele dayika min gotiye babê min cilên min bike tûrikekê û hilawîse. Çi gava cilkên min diriyar, rizîn wê gavê bo xwe jinikekê bîne.

Êêê benê bîjin e û ye canbaz e...

-Oooo keça min ev gelek ye bi sanahî ye. Belê bi soz tu nebêjiye kesekê. Bila babê te jî nizanît. Ez ê rojekê bêm mala wê û çareyekê nîşa te bidem.

Du roj din çûn, hate mala wan. Jinikê gotê:

-Dindikhinara min ez dê bêjime te, bes bila babê te nezanît. Em ê cilkên wê bînin cuhnî de lêden, bila bidirhin, peritin, kun lê bin. Em ê carek din têkene tûriki û wi cihî ve hilawîsin. Bila heftiyek din biçîtin bêje bavê xwe; wê ca bo xwe jinkekê bîne. Dilê min mînite bi te ve. Tu perîşan dibî. Ez jî neşem şolên malê bikem. Heke gote te ez wesiyeta dayika te erdî nadem. Bêjê babo ka ca em cilkên wê bînin derê, berê xwe bidenê. Ka paristîne an rizîne. Heke wê ca keça min babê te qebûl kir ku cilik îmandine derê, berê xwe danê, wê ca bila du roj biçin. Bêjê wele min bo te jinikek ya dîtî. Eger got kî ye, bêjê filankes e. Ez û ew em dê gelêk biaxivin, pêk bîn ez dê şû pê bikem.

Keçik jî biçûk bû, genç bû, nezan bû. Gotê: -Bila.

Jinikê tiştên gotî hemûyan cih dînit û diçît. Di navbera keç û bavê wê de eynî ev axiftina jinikê gotî derbas bibû.

-Kiça min, min gelek xweşî bi dayîka te ve borandin. Ez ditirsim ez êke bînim ne şîbî dayika te bît. Êkê jî heta cilkên da te nedirhin, ez dê ku jinê înim?

-Babo ka em dê berê xwe denê, belkî bidiryabin.

Mêrik radibîtin dînit berê xwe didetê cilik yên diriyar û zanî ku kesekî yên we lê kirî. Mêrikî dil neda ku bêjîte keça xwe ku ev cilik bi destê yekê yên wiha lê hatine. Gotê:

-Bila babo tu ye heqî, ez jî dê çavê xwe lê gerînim ka kes heye bo şûyi.

Du roj borîn keçik babê xwe re dibêje ku min ji te re jinek dîtiye ev jî filankes e. Babe wê jî qebûl dike ku dê gel wê jinikê biaxive. Gelêk diaxivin û zaten jinikê hez dikir, pêk tîn û şû bi mêrikî dike. Rojên pêşiyê her tişt xweş û baş bûn. Şol dikir, hej Dindikniharê dikir. Pîştî her şol û kar yên ji der ve yan jî yên malê bo Dindikniharê hêlan. Dindiknihar gelekî perîşan bibû ku ew bûye sedema wê zewacê. Xwedê kiçekê dete jinikê. Dindiknihar bêxweyî û bêxwûdanî her roj paş ve çû, şol û barên giran ew zeîf kir. Keça wê her roj mezin bû, pêş ve çû. Temetî Dindikniharê lê

hat. Babê wê bo gelek baş bû, xeberî jinbava wê (jina xwe) nedikir. Lê car din rabû çû bû gavan. Piştî çend rojan jinê gotê neçe gavaniyê, bila her du kiç biçin. Du rojan her du çûn, paşê nehêla keça wê li gel Dindikxinarê biçîtin. Demek şûnde hiriyê ji mêrê xwe dixwazît. Du kom hiriyê dikire û difîne. Sibê zû da diçe hiriyê li çêlekê bar dike ku Dindikxinar bibe ser çemê gundi bişotin, ziha biketin, şe biketin, badetin û bînîtin. Eger van neke dê wê bikujîtin. Dindikxinar jî ditirsiya û hirî bir bo şuştinê. Wê demî çêlek li gel sewalên din axivît ku Dindikxinar di rewşeke çiqas xerab daye. Hemûyan guh da gotinên çêlekê û alîkarî dane Dindikxinarê. Çend roj şûnde wekî jinbavê gotiyê bi wê rewşê hiriya xwe bir û dana ber jinbavê. Babê wê pê hesiya û gazinde ji jinê kirin ku zilmê li Dindikxinarê diket. Jin jî dibêjite hiriya mayî dê keça wê bişotin. Dema dibe sibeh hiriyê li çêlê bar dike û kiça xwe rêdike. Dema diçin ber çemî çêlek car din gel sewalan qise dike û her yek diçîte cihekî dûr. Cih da nasekinin. Heta dibe dema vegeerîne neşiyaye çi hiriyê bişotin. Dema tê malê her tiştê çêlekê kirî ji dayîka xwe re dibêjît. Dayîk sond dixwet ku çêlê didete ser jê kirin. Mêr her çiqas nerazîbîtin jî çêlê ser jê diket. Xêr manê belav diket. Belavkirinê Dindikxinar diket û her mala çûyiyê digotê ku hestiyar bo wê pêlin, neavêjin. Roja din malan hemûyan hestî kom kiribûn û kiribûne tûrikekê da. Dindikxinar çû tûrik înande malê û veşarti ve hafirê wê de binkol kir. Çend roj diborin keçik wek wesiyeta dayika xwe diçe vedikole û dibîne ku ew hestî hemî bûyîne zer û zîv û tiştên biqîmet. Lê ca kes pê neheshîtin car din veşêrît. Çend roj şûnde xebera daweta kurê wezîr tê wan. Jinbav nahêla ku Dindikxinar bi wan re biçîte dawetê û qazankê didetê ku bi rondikên xwe ve tijî biket. Dindikxinar dema dimîne nav van nexweşiyar de jinikeke cîrana wan ya êke gelek baş diçe dev û harî diket. Şoravkekê çêdike (ku jinbav bêjît rondikên wê ne) û dibête xwe hazir biketin û biçîte dawetê. Lê dibête nîv saet ji yên din zûtir bête malê. Dindikxinar diçîtin hafirkê wan cil, pêlav û zer û zîvên çalê da dikete ber xwe û diçît. Xwe nîşa jinbavê nadet û daweta xwe derbas diket. Dema dibêjin dawet heta nîv saet din dê xelas bît li wir derdikevît, bazî diçît mal. Navbera mal û mala wezîr da solekê wê dimîne avzêlê da. Lê nasekine û diçît mal, xwe diguhere, wek cîranê gotiyê diçe ser qazankê û rola giriyê dike. Kurê hakimî her şev hespê xwe dibir ser wê avê avdida. Lê wê şevê hespi av nevexwar. Kurik çav didet ku solek avê da ye. Gel xwe dibet û sibê nîşa dayîka xwe didet. Heta niha tiştek wiha nedîtibûn û xwest ku hakimê bavê wi xwûdana wê bo wî bibînê û

biñît. Radibin mal bi mal lê digerin. Tê mala gavani. Dindikharê dibîne û pêlavê diket piyê wê, tam li gorî pê wê ye. Jinbav tê û dibêjît:

-Ew çi ye? Ew ya kiça min e.

Lê kurê hakimî bawer nake û kita din ya pêlavê jê dixwazît. Lê çi tişt di destê jinbavê de nîn e. Dindikhar jî newêrît bêjît ku ya wê bi xwe ye. Bavê wê tê û Dindikhar tenê bo wi dibêjît ka çawa ev tişt hemû çêbûne. Bav jê bawer dike û pişgiriye didetê. Roja din hakim û jina xwe dê bên bo kurê xwe bixwazin. Dindikhar ji cihêza xwe hin bo jinbav, xwîşk û bavê xwe dihêle. Hakim rabû dawet cih îna. Roja din bûk û cihêza xwe dibe û diçe. Lê jinbav hêj razî nîn e. Diçe odeya Dindikharê, wê bêhal diket û dibet, diêxe tenûra mala hakimî da û keça xwe dihêle cihê wê. Zava tê û dizane ku ev ne Dindikhar e. Heta sibê disekine. Dîkilê mala hakimi wê rojê biziman dikeve û li ser tenûrê bang diket. Xulam û xebatkarên malê yê din pê dihesin. Dindikharê derdiêxin û ew jî hemû tiştên seri hafîn ji wan re bêjîtin. Dindikharê diben odeya wê xwîşk û jinbavê jî mal diavêjin. Salek dibore Dindikhar kurekî tîne dinê. Jinbav xelatê wê diîne û tê sera wê. Lêborînan ji bo meseleyên berê jê dixwazît. Ew jî wê efû dike. Gelêk diçin ber çemi, bo şuştina xwe, cil û bergan. Dibêjît:

-Kiça min Dindikhar, ez ê te bişom.

Lê dibêjin ku du sêjin bi xwe re îrandibûn û her gava ku kezîka wê çêdikir, dikire stûhê wê da. Bo kuştina wê bû her tişt. Wê gavê Dindikhar ku ji wê xelas bîtin dia diket. Ji Xwedê dixwaze ku wê bikete çûkek da ku ji destên wê zalimê xelas bibît. Diaya wê qebûl dibe û diçît. Jinbav cilên wê xwe dike û du rojan xwe şîbî wê nîşa insana didet. Di rezên hakimi da rezwani kar dikir. Ew du roj bûn her çi dikir çûçikek li rez nedîçû. Li gel wi diaxift. Digotê:

-Ya rezo rezwano tu çawa yî?

-Baş im.

-Hakim û kurê xwe çawa nin, li mal in?

-Erê baş in û li mal in.

-Be kurikê landikê de çawa ye?

-Bêhal e. Ne xew e, ne têr e.

Rezwan diçît wê serpêhatiya xwe ya ecêb ji kurê hakimî re dibêjît. Kurê hakimi pê dihesê. Spêdê cilên rezwani diket ber xwe û diçît nav rezi. Car din çûçik tê

û rezwani ve diaxivît. Didade ser milê wi. Ew jî bi hewlekê ve wê digirît. Destê xwe serê wê de diîne û dibet. Li nav desten wi da dibîte Dindikinar. Bisk û keziyên wê de derzîkan dibînît û jê dipirsît. Ew jî her tiştî jê re dibêjîtê. Gelêk diçin malê.

Jinbavê ji jiyana xwe derdiêxin. Hakimi jî bo her du evîndaran dawetek din pêk tînît. Heta dawiyê di nav xêr û xweşiyê de jiyana xwe bi hev re diben.

Em li vir de dayîka pêşbîn dibînin. Li nav hemû êş û nexweşiyên xwe de jî car din xwe pêştirê hizra mala xwe, eyalê xwe dike. Dema biçe jî parastina jiyan û kesên mayî difikire. Kedkara wan hemûyan e. Hez nake xirab bibin, nebaş bibin. Ji ber ku jiyanek daye wana. Bi zor û zehmetiyan ve, bi xêr û xweşiyên ve hetanî niha îrandine. Bona parastina wan jî her tişt, her tedbîr di zû de fikirîye.

Bavî jî dibînin. Ji bona jina xwe û keça xwe gelekî baş û rehm e. Dema jina nû jî tîne başatiya xwe ji keça xwe teqsîr nake.

(Bêjer: Ayşe Uce)

2.1.1.2. Hakim û Jina Xwe û Ehmed Çelebî

(Em li vir de jineke aqilmend dibînin. Mesele çî be bila bibe li ser wê difikire û çareseriyên baş nîşanî der û dorên xwe dide. Mesele rehendiya aborî, rêveberî û yan civakî be jî her tim pêşniyazên xwe danîne li pêş hewcedaran. Dema em lê mêze dikin, dibînin ku bi xebat û keda xwe ve ewqas xwe pêş ve biriye. Ewqas jinê xwe pêş ve biriye ku Hakim Begê hevserê wê, bi hestên veşartî ve jî xuya dide ku bi zanîna wê ve acizahiyê dikêşe. Belkî jî statûya xwe li rastê jina xwe di talûkê de dibîne. Bes di dawiyê de dibîne ku evîna jina wî ji bona wî di hundirê xwe de mezinkîrî ewqas jêhatiye ku ev tirsên wî ji holê radibe. Tê wê fikre ku zanîna hevsera wî ji bona hemî mirovan hewcehî ye. Belkî ev qebûlkirina wî di rastî de radestbûyîna wî ya li hemberî zanîna jina wî be. Wek tê gotin; li piş mêrê baş jinek jêhatî heye).

Zemanêkê hakimek û wezîrek hebûn. Gelek hej êkûdu dikirin. Hakim rojekê dibêtê:

-Ez dixwazim bê mala te qehweyek te vexwem.

Wezîr jî daxwaza wi bi keyfxweşî qebûl dike. Wezîri jî kiçek hebû, gelek ye aqil, zana û ye delal bû. Wezîr wê rojê diçe malê û kiça xwe re dibêje:

-Kiça min hakim dixwaze bê mala me qehweyekê vexwe.

Keçikê jî gotê: -Ser seran ser çavan bêt babo.

Hakim hate mala wan. Keçik rabû desmala xwe înande ser çavekê xwe û qehwe bo bir.

Hakim Beg jî gotê: -Wezîr, xwezî min zanîba ka qesra te li ser lingekê ye an li ser du linga ye.

Kiçik pê hesiya û desmala xwe çêkir. Hakimî jî rûyê kiçikê dît. Roja din wezîr çû meqamê wi. Hakimi lê pirs kir û wi demi jî sê caran destên xwe li ser rihên xwe înanandin û birin:

-Wezîr be çî ji min û rihên min biqedirtir e? Di dîwanê de çî kesê bersiv neda min, te jî neda. Here, çil rojan muhlet didim te bersivan bîne û were. Eger di wan çil rojan de te bersiv neanî dê serî ji te bikim.

Wezîr jî bi dilekî nexweş, posîde hate mal, gote kiça xwe ratibê bo wî dagire. Kiçikê amade kir û wezîrê me çû. Çû û çil roj paşê vegeriya mala xwe. Kiçikê merak kir ka li ku derê bû.

-Kiça min çil rojên min temem bûn û ez bêcab hatime ve. Dê serê min jê veken. Hakimi ew pirs ji min kirîbû.

Her tişt ji kiçikê re yek û yek got. Keça wî:

-Babo xweziya te gotiba min paşê te bîryara xwe daba. Hewce nedikir ku tu çil rojan çûbayî cihên dûr, tehnî û bîrsî. Min bersiv dizanî. Here dîwana wî û van bersivên dê bo te bêjim yek û yek jê re bibêje.

Kiçikê rêz û rêz qise bo babê xwe kirin. Wezîr çû dîwana hakimî û gotê:

-Hakim Beg, Xwedê û pêxember ji te û rihên te qedirtir in, ev e êk; heyv û roj te û rihên te qedirtir in, ev e du; heyva gulanê ji te û rihên te qedirtir e, ev e jî sê. Dema bû heyva gulanê jiyan xwe ji her tiştî ve nû dike ev e hemî ji te û rihên te qedirtir in.

Hakimî di dilê xwe de digo 'dema ev e hatiye mala xwe jî xemgîn bû. Vî bersiv ne ji cihek din îna ye, ji mala xwe bersiv zaniye'. Hakimi gotê:

-Belê wezîr te baş got. Ez dixwazim heta heftiyek din bime mêvanê te. Lê heta wî demî ha wê gilolka armîşî bibe bila kiça te bo min bikete çadir.

Wî jî gilolka armîşî ya biçûkok bir û her tişt kiça xwe re parve kir. Rojên din kiçikê berê xwe da wê misqale zireta armîşî çû kilçivê xwe îna û da destê bavê xwe ku bibete dîwana hakimi û bidetê. Eger pirs kir ka çadir çêkiriye da bêjîtê 'belê' û stûnên çadirê jî wekî vî kilçivî bin. Hakimî got:

-Ya wezîr ez dê çawa dar û stûnên çadirê hindî kilçûvî çêkem?

-Ya hakim beg kiça min jî pirs kiriye ji we 'ez dê çawa çadirekê ji vê gilolka misqale ziret ya armîşî ve çêbikem'?

Hakim fikirî û di dilê xwe de digot divê ew, ev kiça ewqas biaqil ji xwe re bîfînt. Ew ji wezîrê xwe xwast û gotê:

-Belê ne bisîwarî û ne bipeyahî kiça te bête mala min.

Wezîr çû mala xwe û kiça xwe re gotin hemî. Kiçikê qebûl kir. Kiçikê beriya dawetê li nik merengozî sindoqek da çêkirin. Roja dawetê dema xulamên hakimi hatine mala wan, kiçik çûbû nava sindoqê da û bavê ew wisa rêkire mala hakimi. Dema tîn ku bûkê biben, babê wê dibêje:

-Bûk li mala zavayî ye.

Çi kes çî jê fehm nake. Lê belê rast bû, keç li wir bû. Dema jê pirs kirin wê wiha bersiv da:

-Hakimî ne siwarî ne jî peyahî gotibû. Ez jî wekî vê gotinê hatim, meraq nekin.

Hakim li gel hemî mêhvanan, ew jî dimîne di nav mereqan de. Herkes diçît û sozekê ji kiçikê dixwazît:

-Ez ji niha da sozekê ji te dixwazim. Tu wê aqildariya xwe, zanîna xwe nîşanê çi kesî nadeyî, bila? Eger soza xwe bicih neînî dê vegeriye mala bavê xwe.

Kiçik dibêje: - Bila.

Çend roj diborin bazirganek û seyahekî bi navê Ehmed Çelebî hate bajarê wan bo danûstandinê. Ji bo xwe û xizmetkarên xwe diçîte dikaneke cihûyekê. Şeş hêkên kelandî dikire û diçît. Ji bîr dike ku pareyê wan bidetê. Wi bajarî diçin û nêzîkî salek din carek dî tîn. Tê bîra wi ku wi qerê cihûyî nedayiyê. Çîte dev cihûyî, lêborînên xwe jê dixwaze û dixwaze ku pareyê wan şeş hêkan bidetê. Lê cihû qebûl nake. Cihê pareyi du zêran didetê car din qebûl nake û bêjîtê:

-Ez da hêkan danime bin mirîşkan, da bine cîcelok. Ew da hêkan ken, ez da firoşim ha hêk ha goşt. Ez da bi ticareta wan ve hinde hinde mal û milk û zînetan pê wergirim. Ez du zêran qebûl nakem.

Cihû rabû Ehmed Çelebî da îcrayê. Her tiştê wi jê stand. Feqîr bû, rezîl bû. Çi cihên serlêdan dikir bo halê xwe her kesekê cihû heq didît. Çû bes nedizanî, ber derî mala hakimî ye, rûnişt û gazindên xwe îrandine ziman. Jina hakimi guh da gotinên wî yên xwe bo xwe dikirin. Ew nas kir û gote xulamê xwe wi gazî bikete xanî ve. Jina hakimi ji Ehmed Çelebî xwest ku ka çi li serê wi hatine bo wê bêjîtin. Wi jî her tişt jê re gotin. Jina hakimî bi şertê ku nebêje çi kesî ku wê alîkarî dayiyê jê re ev tişt gotin:

-Here li cihekê lapekê nokan bikire û li cihekê bikelîne. Roja eynî hema li derê mizgeftê yan jî nêzîkî wê, cihekê hakim, wezîr û mela ew têda diborin bisekine. Tevirekê jî bibe. Dema te dît ew hatin erdi bikole. Hindekan ji wan nokan bixwe, hindekan jî biavêje cihê kolayî da. Dê ji te pîrskin ka tu çi dikî. Jê re bêje nokan diçînim. Eger gotin tu yê dixwey, bêje belê; hakim beg nokên min kelandîne. Dê bêjin nokên kelandî dê çawa şîn bin, bêjê; be hêkên kelandî dê çawa bine cîcelok, çawa bine mirîşk û çawa dê zêde bin û ticareta wan dê bê kirin. Ew dê vê ca ji te pîrs bikin ka çi mesele ye. Tu jî ya bi serê te hatî, ya xwe û cihûyî ji wan re bêje. Hakim, wezîr û yên din dê mecbûr bibin û dê li ser biaxivin.

Ehmed Çelebî roja eynî çû nêzîkî mizgeftê wekî jina hakimi gotinê hemi cih îrandin. Mesele hemî ji wan kesan re car din îrande ser ziman. Hakim zanîna wi kirî ma şîkê da û zanî ku jina wi ev aqle dayiye wi. Ew cemeat rabûn çûn cihû îrandin û lêpirsîn lê kirin. Di dawiyê de cihûyi her tiştê Ehmed Çelebî ji wî re zivirand.

Hakimê me diçe mal bes bêkeyf e. Çimkî jina wi soza xwe xerab kiribû. Gel jina xwe axift û gotê ji mala wi biçîtin. Çi bixwaze jî bila bo xwe bibetin. Jina wî:

-Belê Hakim Beg tu heq î. Ez dê biçim. Bes ne di nava rojê de. Xelk dê pê hesin. Bila bibîte şev ez dê biçim.

Hakimî ev daxwaza wê qebûl kir û çû odeya xwe. Jina wi rabû bi dermanekê ve wê ew bêhiş xist. Du hemal îrandine malê. Ji wan re got:

-Min û Hakimî bikene di nav du lihêfan de, bibin di qeyîkê de nêzîkî saetekê bigerînin. Dema min got me vegeînin werin me car din wergirin.

Hemal hatin qesêt xanimê cih îrandin. Dema vegeîryan Hakim hişyar bû û sual kir:

-Ev e kî ez îrandime, ev e çi hal e?

Jina wi:

-Hakim Beg min tu îrandî. Te gote min ji mala min here û tiştên dixwazî jî li gel xwe bibe. Min jî wê malê tu viyayî. Vêca tu bêje ka ez çi bikim?

Hakimi şaşiya xwe nizanî veşêre û gotê:

-Xanim soz bît ez hêdî nebêjim aqil û zanîna xwe nîşa kesê nede. Tu ye azad î. Ev zanîna te divê harî gelek kesan bike. Were bi hev re biçin mala xwe.

Hakimê me û jina wi ya aqildar vegeîryan mala xwe.

(Bêjer: Ayşe Uce)

2.1.1.3. Tûsî Mirarî

(Di çîroka me ya Tûsî Mirarî de em keçeke dilpaq dibînin. Di temenek ewqas mezin de jî nîn e. Ji tiştên dinyayî ve qewî şad nabe. Belkî jî li hin tiştên uhrewî digere. Bi daxwazên dinyeyî ve dê û bavê xwe aciz nake. Tûsî Mirarî ji bavê xwe dixwaze. Ne bav ne jî kesên din nizanin ku ew çî ye. Tenê kesî li kaniyê de derdikeve (ecin) dizane û dibêje wî dixwaze. Keçik li ber hemî nerazîbûna malbata xwe jî car din li gel wî dizewice. Lê di zewaca wê de parastina kesên wê jî em dibînin. Ji ber ku Tûsî Mirarî û kesên xwe digotin eger wê nedenê dê tiştên nebaş li serê wan bînin. Rast e kî be dê dîsan dîsan bifikiriba dê keçe xwe çawa bidin ecinan. Lê her tişt baş diçe heta ku malbata keçikê lê xiyaretê dikin. Malbata wê dema diçin ku rêya keça xwe ku malê vebikin, dibînin ku her tiştê wê cih de ye. Dema keçik û zalamê xwe tîn mala wan xwîşka wê diçe Tûsî Mirariyî dide ber xenceran û dikuje. Ecin û insan ew roj şûnde hevûdu dûr dikevin. Keçik jî bi heramkirina mala malbata xwe ve sedeqata xwe nîşan dide. Di îxaneta xwîşkê de jî em çav pê nerabûna insanan dibînin. Sedeqat û xiyaret her du jî di hundirê beşerî de xwe hêvişandiye).

Zelamekî pênc zarok hebûn. Roj hat ku biçê Zaxoyê hinde hewcehiyên malê bikîrî û bêtin, gote zarokên xwe ka wan çî divên. Yekê cil, yekê pêleyîstok, yekê xemîrok, yekê pêlav ji babê xwe xwastin. Babi berê xwe dayê tenê keça biçûk ma ku tiştekek nexwestî. Dema jê pirs kirî wê jî ji bavê xwe tûsî mirarî xwast. Babê çiqas gotibîtê ew çî ye, wê tinê gotiye ‘Tûsî Mirarî’. Babê wan çû gehiştê Zaxoyê. Her hewcehî wergirt tenê tûsî mirarî ma. Hindî wan dikanan geriya, yek yek ji dikandaran sual kir bes tûsî mirarî çî cihan peyda nekir. Cihê tûsî mirarî jî fanîleyek bo wê kirî. Rê keft hat, hat û hat ji gundekê borî li ser kaniyekê behna xwe vekir û destnivêj wergirt ku nivêja xwe biketin. Dema nivêja xwe dikir çawên wî fanîleyê keçikê dikeft. Xwe bo xwe dest avête qiseyan:

-Weyla bêiqbalê, ma çî tişt nebûn te tûsî mirarî ji min xwast. Ez ê feqîr çî dizanim ka ew çî ye.

Demeke xweş li ser keça xwe axift, nerazîbûna xwe ya ku tiştê xwastî peyda nekiriye her înande ser zimanê xwe. Wê demî di kaniya ku destnivêja xwe lê wergirtî, behna xwe lê vekîrî de kesek ji nava wê derkeft û hat nik wî. Babê zarokan re pirs kir ka ev çî hal e, bo xwe bo xwe diaxive. Wî jî:

-Min pênc zarok hene. Her yekî tiştêk ji min xwast. Min ji wan re ew hemû kîrîn. Lê keça min ya bêiqbal, ya biçûk ji min tûsî mirarî xwest. Ne ez dizanim ka ew çi ye, ne jî dikandaran zanîn. Min peyda nekir çi erdan. Cihê tûsî mirarî jî min fanîleyek jê re kîrî û ez dê wegerim bo mala xwe.

Zilamê ku di kuna kaniyê da derkeftî û hatî jê re got:

-Tûsî mirarî ez im. Ez yê li binê wê avê da. Avahiyên me hene di bin avê da. Ew ê (keça biçûk) ez yê xwastîm. Em dê roja heftê bîn wê wergirin.

Babê wê got:

-Na, ez dê çawa wê bidim. Keça min hêj ye biçûk e.

-Na, ew ê ez xwastime. Xwe hazir bikin em dê bîn wê bixwazin, bînin û biçin.

Mêrik rê keft bo mala xwe. Gehişte malê û piştî demekê behn vedayî her kesekê tiştên xwastînan danê. Fanîleyê ji bo keça biçûk jî îrandî dayê. Demek çû jina wi pêhesiya ku xemgîn e, sergêj e jê re pirs kir ka wi xêr e. Wî jî tiştên seri hatînan hemi jê re gotin. Her duyan nizanîn ka dê çawa di nav vi hali dê derkevin, xelasbin. Hindî ku fikirîn çi xelasbûn nedîtin. Roja heftê hat tûsî mirarî û kesên xwe hatin keçik xwastin, birin û çûn. Keçik birin û çûne ser kaniyê car din wê kuna di nav vedibû de çûne xwarê. Nêzîkî deh roj borî bûn dayîk û keçên xwe rabûn çûn da keça xwe bibînin, rêya malê lê vekin. Kesên malbata tûsî mirarî hatin ew pêşwazî kirin. Eynî di wê kunê de çûne xwarê. Piştî çûne xwarê çi bibînin, dinyayeke cuda, xweş û her tişt tê de heyî li wir avakiriye. Mane matmayî. Pirsê bûk û zavayan kirin. Kesên tûsî mirarî jî ew birine odeya wan. Piştî demeke xweş bi hev re bihurandin ew gazî kirine mala xwe. Dayîk û keçên xwe rabûn çûn. Çend roj şûnde bûk û zava çûne malbaba keçikê. Xwîşka wê ya mezin diçe berê xwe didetê serê tûsî mirarî yê li ser piyê keçikê û yê xew çûyî. Bi kêra destê xwe ve tûsî mirarî li wir dikuje. Keçik dike hawar gazî lê nizane ka bo çi ew kuştin. Gazî kesên mala tûsî mirarî dike û mirîye xwe dibên û diçin. Keçik jî bi wan re diçe, mala malbabê xwe heram dike. Ji wê rojê wê ve ji yek û din (cinsê tûsî mirarî û yê keçikê) sil dibin.

(Bêjer: Amina Adiyaman)

2.1.1.4. Gulistan

(Gulistan; çiqas navekî di nava xwe de jiyaneke gelêk, xweş, bêhnxweş, safî taswîr biketin jî jiyana Gulistana di çîroka me de ewqas baş nayê pêşiya me. Zor û zehmetiyên nava malê heta ku yên civak li ser me bandor dikin, hemî xwe di jiyana wê de nîşanî me dibin. Dilpîsî û zordariya zilaman (ne hemî), tecawûzê heta ku kuştinê (mirîzindî) em di jiyana Gulistanê de dibînin. Mixabin ya herî nexweş ew e ku ev bûyer rasteqîn li serê wê hatiye. Lê yên ku herî nexweş ew in ku yêk; cizakirina zilamî çî ma nîn e û ya din jî çîma jin ewqasî di her tiştî de bêdeng mayiye.

Xeynî Gulistanê lehengeke din jî diya wê ye. Lê diya wê keseke xwenegirtî tê binavkirin. Yanî xwe keça wê jî baweriya xwe nadide dayika xwe. Li vir de lehengek din tê pêşiya me, ew jî jinbav e. Lê cara yekem e ku jinbavek wiha baş, hem jî ji dayika asil baştir tê pêş me. Çiqas kêmasî di kirinên wê de hebin jî bona nevisiya xwe ji dayika wê gelectirê xebat dike.

Her du karakterên dawiyê jî jin û keça rênçberî ne. Keça wî mixabin li beramberî destdirêjiya wî dibe qurban. Ya rastî bav wê dike qurban. Malbata Gulistanê belkî xwe bi pêguhorkiyê ve ewiqandin. Lê jiyana du keçan bi riya kesên din ve hate bînpêkirin. Her du keçan de jî em dibînin ku ‘delalî’ li serê wan bûye êş, jan û ew kirine mirîzindî. Wek tê gotin; xwîn bi xwînê nayê paqijkirin. Meseleya wan jî bûye ev. Lê jina rênçberî a mezin; ji bona xwe û eyalên xwe kesa ku serî radike, wî kesî û xirabiyên wî dadgeh dike û bîryara herî baş dide ew e. Her çiqas keça xwe nikaribe biparêze jî).

Hebû tune bû. Kesek ji Xwedê mezintir nebû. Malêk hebû li serê çiyayekê. Di malê de zelam û jina xwe û pênc zarokên wî hebûn. Çi gava dema zayîna jina wî dihat çî kes nebû û mecbûr mêrik dibû dapîrka zarokên xwe. Ji bona xwedankirina sewalên xwe rênçberek bo xwe girtibû. Rênçberî jî di dilê xwe da digot dê kiça xwe ya mezin bidete wi. Keçik ji xwe re xwast lê belê babi kiça xwe nedayê. Rênçber jî heta qewlê wi bû bihar û xelas bû rabû çû warê xwe. Li wir ji gundê xwe bona xwe kesek xwast û bi wê re zewicî. Çend sal borî bûn, çend eyal jî hebûn car din rabû çû wi gundê mêriki. Dilmayî ji warê xwe derkeftibû. Mêrikê xwedanê gundî nesaxiyek lê peyda bibû û jinek din jî ji xwe re îrandibû. Kesekê nedizanî ku nesaxiyek lê heye. Jina nû hemle dima û dema dibû du sê heyvî zarok ji ber diçûn. Çar pênc salan ma di

vî halî de. Çû bijîşkî, îlaç wergirtin demek dirêj. Dawî hemle ket. Xwedê kurek dayê. Demek xweş borî bû gote zelumê xwe:

-Malbata min gelek mereqa eyalê min dikin tu min nabeye malbata min?

-Belê, bes em her du dê biçin.

Rabûn çûn, malbata jinikê hemî lê kom bûn, keyfa wan gelek pê hat. Jinmama jinikê jî hat. Jinmam gelege hesûd bû. Ho dît go:

-Ew e kurê wê çendî law e.

Kurik hema di wê gavê de qerî kir û cerg di devî de hilavêt, cerg lê ker kir. Kurik negehişte sibehê. Kurik li wir dane axê û piştî sê rojan bi kul û xemên xwe ve vegeriyan gundê xwe. Li zelumê jî piştî wê xema êşa wi (penceşêr) carek din lê peyda bibû. Birayên wi her gav ew dibirin nexweşxayeyan. Ew rênêkirine gundî ji ber nexweşiya wi. Zarokên wi doranê kiribûn, her roj yek yan du kes dihatin sera babê xwe û vedigeriyan gundi. Jinika wi ya biçûk li bin serê wi dima, çî daxwaziyên wi hebûna çêdikir û bicih diîrand. Bibû heyva gulanê. Mêrik kefte ber sekeratê. Cab danê eyal û jina wi ya mezin jî. Da bên wi cara dawî bên bibînin. Wi daxwaza jin û zarokakê tenê kiribû. Lê car din ji bilî kurê li ber pezî û keça biçûk (Gulistan) yên din hemî tên. Ciranê wan yê ku berê rênçberê wan bû û keça mezin ji xwe re xwastibû tê û deri dide. Keçik jî jê re deri vedike lê mixabin keçikê pîs dike, destdirêjê lê dike. Dema yên din digehine dev babi, bab lê pirs dike ka kî mayîne gundi. Ew jî dibêjin:

-Keça biçûk ango Gulistan, kurê ber pezî û cîran (rênçber)

Babê wan kesekî bîaqil bû. Gote wan:

-Zû vegerine gundi. We çawa xwişk bi tenê hêlaye dev wî seyî û birayê we jî li ber pazi.

Birayek bi gotina bavê xwe ve vedigere gundi. Derî lê dide. Xwişk tê derî vedike. Çî dibîne reng û rûyên keçikê qulupiye, çilmisiye. Kiçik ji birayê xwe re her tiştî dibêje. Birayi gotê:

-Deng neke niha. Babê me yê li bir mirinê. Bila em tiştêkê jê bizanin, paşê em dê bifikirin.

Gulistan jî hemle dikeve. Piştî babê wê mirî, gote jinbaba xwe ka çî li serê wê hatibûn. Negote dayika xwe, ji ber ku ew ewqas xwegirtî nebû. Jinbaba wê jî rabû çend tişt lê kirin, şolên giran pê dane kirin û hemlê wê ji ber çû. Jinbaba wê çû gote

jintiya xwe ya ku zelumê wê di dema nexweşiyê de di mala wan de dima. Jintiyê jî zanî mesele û gotê ew dê mamê wan pê bihesîne. Jinmam û her du mam rabûn çûne gundî sera birazayên xwe piştî xema birayê xwe. Gazî cîranî jî kirin. Kîçeke gelek delal hebû. Gotinê:

-Gazî melayî jî bike. Tu dê kîça xwe birazayê me mehr bikî.

Keça wi li kurikî mehr kirin û keça biçûk jî li wi mehr kirin û gotinê:

-Sibê zû da hêj kes bi we nehesiyayî dê li vir barkey. Bila çî kes bi wê meselê nezanît.

Sibê zû da mal bar kir û çû car din gundê xwe. Xwezûrê wi ango babê jina mezin gotê:

-Te ev e kiriye ez dê keça xwe ji te bistînim.

Keça wi gotê:

-Babo feyda nake. Min eyal yê heyî, keça min jî riya wi da çû. Ez dê wî bihêlim.

Jin rabû eyalê xwe ji her tiştî re pêhesand û bi xwe re birin û çû. Bajerek din jiyana xwe berdewam kir.

Gulistanê jî heta dawiya emrê xwe, mixabin jiyana xwe wi hali da derbas (!) kir.

(Bêjer: Ayşe Ücar)

2.1.1.5. Ehmed Xerîbe

(Em di wê çîrokê de sê temsîliyetên jinê dibînin.

Yek dayîka Bizirkî ye. Wekî gelek dayîkên din dayîka Bizirkî jî jineke kedkar e di nava jiyânê de. Piştî mirina hevserê xwe, zarokê xwe û namûsa xwedî derkeftiye. Her tim li rastê civakê serbilindiya xwe ji dest nedayiye. Heta roja dawiyê jî di gel kurê xwe hereket kiriye. Kurtasî civaka ku têde jiyayî çî ji bona dayîkan raber kirine, wê hemî bi cî anîne.

Kesayetên din jinên paşayî ne. Hewî ne û wek jinên nebaş, nesadiq têne pêş me. Aqîbeta wan jî nayê zanîn.

Temsîliyetên dawiyê jî keçên paşayî ne. Wekî her çîrokan wê çîrokê de jî ast û armanca herî mezin ya ku lehengê me digehîte zewaca li gel keça paşayî ye. Ji ber ku zewaca li gel wê derfetên herî baş diêxe pêşiya kesî. Her kes zû bi zû nabe zavayê paşayekî. Divê cudahiyeke berbiçav li navbera wî û zîlamên din hebe. Yan aqîl yan merîfet yan jî dewlemendiyek divê xwe de hewîne. Ji aliyê keça paşayî de dema lê binêrin car din, li gorî daxwaza babî û kesên din jiyana wê te avakirin).

Rojekê navê êkê Ehmed bûye, Ehmed jî xerîbe bûye, gelek feqîr bûye. Ehmed bê erd bûye, bê erazî bûye, çî arsê wî çinebûye. Çûye bêjît çime lalê paşayî ez bo xwu ersekê kanî nadete min ez jî bo xwu awahiyekê ser da çêkem. Çûye lalê Paşa. Paşa jî gotê:

- Weleh cihek heye ha biçekê dûrî şehri ye, filan semtî ye.

-Paşa bo min baş e tu bideye min. Xuda ji te razî bît.

Bo xwe bo çandinê hilgirîtin. Êca wextekê cotek ga peyda diketin. Ga tîntin cotî lê didet. Wê gava cotî dike wextekê cotê wî nîveka zevîyê da binê berekê asê dibît. Heya asê dibît ew e jî lê dixebîtin, binê berî kolîtin, berê xwe didetê kudreta Xudê pêlekan jor da çûne xwarê. Pêlekan çûyîne bo binê erdî, wan pêlekanan da çûyîne xwarê berê xwe didetê nêzîkî çar ode, odayên biçûk gele mazîn ne, hemî dir û cevahûrata, zîynet û heykela filan bevan naête gotin kanê xizîna kî paşayî bûye wêderê da çalkî ye. Belê gelek jî tê da bûye. Ewê he, Ehmed Xerîbe saf bûye. Bêjît:

-Ew e Xudê da min, kuro babo ez jî bo xwe awahiyekê ser da çêbikem. Bo xwe tê da rûnime xwarê.

Bêjît:

-Ew e Paşa zanî ye ev xizîne heye. Kanî ez dê wihe derxime derî, ka ezê bo Paşayî bêjim an na. Radibît rast çî te lalê Paşa. Dema diçe lalê paşa Qazî diête berakiya wî. Qazî gel bûye. Qaziyên paşa îfade filan bêvan hemî qaziyan ji xelkê wergirtine. Paşê malumat wan dayîne Paşayî. Heynî Qaziyî pêşiya wî girtiye, gotiyê;

-Kuro te xêr e, rengê te çûye, çî bûye, te çî kiriye?

-Min gelek şolek mihim paşa heye.

-Ca ewê tuyî bêjiyî min. Ez anca rabim bêjime Paşa. Xwe esker jî bê neşêt çîte lalê paşa. Ew gotine ya te nîn e, ya min e. Ka bêje te çî kiriye?

- Wele min xizîna Paşa dîtiye.

-Kuro xizîna paşa te dîtiye? Te dest lê nedaye, te çî lê nebiriye?

- Ne Xudê min çî lê nebiriye. Min destê xwu nedayê.

- Ka were biçin ka berê xwu bidenê ka te çî lê kiriye.

Qazî Ahmed Xerîbe didete gel xwe. Li wir Ehmed Xerîb jor da bete xwarê, wan pêleknanan da jor da çîte binî. Berê xwu detê da.

-Belê maşelah çî qiyas tişt tê da heye. Tişt tijî tê da, hemî jî tiştê ela qiymet.

Qazî bêjît: Xudê heqê wê henê kuştine. Ez ê wî hî bikujim bila ew xizîne bo min bimînît.

Bêjîte Ehmed Xerîbe:

- Belê, hêdî ew suala te ye. Wasiyetên xwu bike emê lê re, ez ê te lê re bikujim.

-Way bo xatira Xude, bila hemû bo te bît, min nevêt. Yeterkî bêmanê min jinikek tenê heye. Avahiyekê tinê da ye. Feqîr in, guneh e ber xatira we jinikê min nekuje. Jinikek tine ye, çî biçûk jî nîn e. Taze du mehe ye bihal e.

- Ne welehî çî îmkana te çî nîn e, xelasbûna te çî nîn e.

Ehmed Xerîbe bêjît:

-Milê baxçeyî odek çêkiriye. Hindî ew jinike li wir bîtin amanetî te ew jinik. Heke Xwedê kurek jî daye navî wî kurikî bike Bizirk. Wekî din jî hîviya Xwedê. Çî dibe dê çêbît.

Lê didetin Ehmed Xerîbe dikujîtin. Danîte li wê rê û wê derê bin ax diket. Têt û xwe ker diket. Sal dikeve navbendê û têt bêjîte paşayî:

-Paşa te erdek daba min, ez xwe xwesdikem derkevîm ji şehri.

Paşa dibêjît:

-Baş e ama erd çinîn e. Ez dê kî rê deme te?

Bêjît:

-Wele cihek heye. Lalê Ehmed Xerîbe. Te hingê dabû wî. Heke du hezbikey ezê wî razîkem. Bila hindê bo mîn bît hindê jî bo wî. Ez ê xwe ra koşekê avahiyekê çêkem.

-Ehmed Xerîbe gazindê neket. Nerihet nebîtin. Tu bêdiliya wî neke. Bo xwe çawa çêbikeyî çebike.

Ê be bêdiliya wî çawa neketin, mêrik yê kuştî û danaye wê derikê. Qazî diçît wê derikê avahiyan çêdiketin. Ser xizînê du katan avahiyan çêdiketin. Wê esnayê da Xwedê kurekekê dide jinika Ehmed Xerîbe. Qazî dibêje:

-Wele ew wasiyeta min e. Dê navê wî bikem Bizirk.

Navê wî dana Bizirk. Dayika wî du sê sala, heta sê çar saleka ma li ser avahiyên Qazî. Qazî jî guhê xwe didetê da. Nan û man û filan bêvan rizqekê didete jinikê. Jinik bêxwedan e. Heta kurik pêalûkî bû wiha kefta piya, kurikî taliqî Reb-il Alemînî zanî ku babê wî Qazî kuştiye. Belê. Gotê:

-Dadê. Em li erê nabin. Em dê rabin mala xwe barkin em dê biçîn nava şehrî.

Barkir û çûne nav şehrî. Du sê sala jî wê re îdare kiriye. Bizirk diçe li wê re loqenteyekê da şol dike. Bêmane wê esnayê de dehlikek hatiye ber derê loqentê qesta nanî kiriye. Loqenteciyekê hestîkek wihe avêtiye danişta dehlikê daye. Karîn ji dehlikê diçûn. Bizirkî got:

-Hey mala te xirap nebît. Ew dehlik hemle bû. Du kuçik zikî de bûn. Yek sorbelek bû yek reşbelek. Ew ê sorbelek te zikî da kuşt.

-Kuro tu çawa dizanî min zikî da kuşt.

- Belê te zikî da kuşt.

Heynî axiftin hoke çêbûn. Cimeata wê rê kefta ser da. Kanê ev dehlike ya kî ye. Belê pirsiyar kirin gotin filan mehelê ya filan malê ye. Çûne wê malê. Gotin:

-Henê ev e kuçikan diênîtin kanê bêjin dê kuçikên çawa bînit. Bo me bêjin. Em dê hinde menfeet bidine we. Em dê bînin kanê gotina Bizirkî rast e an ne.

Belê heyvek û çend roj çûn du kuçik îrane dinyayê. Êk reşbelek û êk sorbelek bû. Yê sorbelek kuştîbû. Zikî de mirî bû. Ew gotina Bizirkî rast derkeft.

Çûn û axîftin li ser çêbûn, zêde axiftin kete ser da. Ma Qazî nezanî, Wî zanî ku ev e Bizirkî ev e derêxistiye ji derve. Qazî gotiye:

-Qur'an ev e dê bête bela serê min, ez ê vî bideme kuştin.

Êca hêj de hingê hêj da Qazî dûv de nehatî Paşa wî (Bizirkî)dibet xelat biketin. Xelat diketin çimkî ev tişte ewî derxiste derê. Gotiye:

-Rojekê ev kurike dê kêr şolê me bêtin. Ev kurike gelekî aqildar e. Gotiyê: te çi divêtin?

- Wele min her kavirek divêtin. Pazek divêtin.

-Kuro tu dê kavirekê pazekê tinê çi lêbikêyî? Te çi divêtin pare, zêr filan?

-Na wela min tenê pezek divêt.

Berxikek dayînê da. Berxikek hûrik e. Hînî nanî kiriye. Berxik gel wî diçe mala wan û loqenteyê. Loqentê nan mana dixwet heta êvarê, êvarî gel wî diçe mala xwe, berxik jî hînî gel hatin û çûna wî bûyiye.

Qazî jî derxistina wê xewnê û çawabûna wê kuçikê dibêje -divê ez Bizirkî bideme kuştin-. Êca niha du mirovan rêdiket bo kuştina Bizirkî. Her du mirov hatin cihê lê da Bizirkî biben û da bikujin. Têniyê loqentê da. Bizirk ho berê xwe didetê ku ev e bo kuştina wî hatine. Xwedê Teala bo wehî rêkirine. Bizirk li gel her du mirovan xeber dika û dibe rexê pişte û gote wan:

-Bira ez dizanim hûn bo çi hatine.

-Em bo çi hatine?

-Hûn bo kuştina min hatine. Ez zanim Qazî hûn rêkirine. Ev karike we dîtiye? Min ev karike bo wê înyê. Bîne ser jê bike. Ez dê şel û şepikên xwe ji ber xwe bikim, bêxim nav xwîna wî bidim, biben herîn. Bêjin wela ev kiras û çekê ên Bizirkî ne. Me nav xwîna wî dan ev jî xwîna wî ye.

Kiras û şel û şepikên xwe êxistine, xwîne dayîne û birine û çûyîne. Hemî birin û çûn.

Çend sal, salek û an çend roj diçin Paşa bi xwe xwenekê dibîne. Xwenek çawa! Sêniyek, mecmeiyek nanî tijî tê de rizq, rizqên xweş yê têdene. Înin deynîne êre. Paşa dest dide da bixwetin seyek, seyek reş ser de diborîtin, diçît hemiyam heram diketin. Paşa dimîne, hişyar dibe wê xwenê da. Paşa dibêje:

-Ya Reb-î ev e çi bû? Ev e çi xewin bû min dît. Ev necmeiya rizqî çi bû, çend tiam tê de bûn, ev seyê reş bo çi hat ser de çû? Bo heram kir? Nehela ez bixwîm.

Şeva din eynî xewn. Du şev din eynî. Sê çar şev din eynî xewn. Paşa gelek nerehet bû. Hindî bêjîte zanyaran, yên xwenan zanin, kesê çî lê nizanî. Yekî gotî:

-Paşa xwedê ew kurikê hingê em peyda biken, ew kurik dê bizanîtin.

Kurik ca kî derê ye? Ca kes nizanîtin. Kurik jî loqentê de derkeftiye, hatiye çûyiye mala xwe. Rût e, bêcilik e. Çûye nava mala xwe de, mala xwe naderkevîtin. Paşa dibêjîtin:

-Ca lê bigerin, ca ew li ku derê ye.

Mehel mehel lê digerin. Şehr hemî keftiye dû de. Welhasil rojekê hatine ser banî wî. Bizirkî got:

-Dadê xwedê xulamên Paşayî eve ne hatine ser banê me. Dê bêjin ev mala ya kî ye? Bêjê ya Bizirkî ye. Dê bêjin ka Bizirk? Bêjê nizanim kî derê ye. Bêlê dê her bêjin kî derê ye, biçekê xwe gîro bike, ewil nebêjê, paşinekê bêjê.

Xulam dibêjin:

-Ca ev e çend roj e, sê roj e, çar roj e em lê digerin. Baş e be li kî derê ye?

Wê ca Bizirkî got:

-Wela ez ev e tendurê de.

-Kuro ew çî ye? Tu tendurê de çî dikey? Ka rabe derkeve, were.

-Ez çî rabim derkevim, ez rût im, perîşe me. Ez çî derkevim û werim.

Xulam diçin dibêjin Paşayî. Dibêjin:

-Me peyda kir lê me neîna.

Paşa:

- Be we çawa peyda kir, bo çî we neîna?

-Em çûn warê wî yê li tendurê da. Yê tendurê de rût.

-Kuro da bo cilikan da biben.

Înan tehmînî qasî wî cilik bo înan, hemî jî yên rûtbeyî yên kurê paşayî bûn.

Înan, kire ber xwe tam li qaydî wî bûn.

Xulama gotinê: dê were da em biçin.

-Wela ez neşêm bêm.

-Tu bo çî neşêyî bavo?

-Xwedê ez neşêm, ez piya nayêm.

Diçin dev Paşayî û dibêjin:

-Paşa, cilik kêr hatin lê wê carê jî piya nayê.

Paşa dibêjîtin:

-Çi dibêjîtin, çi dixwazîtin? Da em bidene, lê suwar bibît. Da ka hespê min bo biben.

Hespê Paşayî înan xemilandin, sed tişt pê vekirin, neqşandin. Hesp înanandin hatin ber deriyê Bizirkî. Bizirk hat wihe berê xwe da hespî û got:

-Ez bi xwe kujkelok, hind e; hesp bixwe hindî wî dîwarê henê. Ez neşê me lê siwar bibim.

-Bo çi, bo çi tu lê siwar nabî? Êdî hespî Paşayî ye. Xwezî me îna ye, hatiye ber derî. Me xemilandiye. Çend Gever me gerandî. Edî kuro tu êtîmekî hinde yî, tu çawa xwe hinde mezin û nazdar dikeyî?

-Wela ev hind e bo min gelekî zexm e. Ez hindî cûcîkekê me. Pêşî nav mehelê da diçin dê bêjin –yaw yê hinde kujkelok hespî Paşayî siwar bûyiye. Ev êtîmekî kujkelok hinde ye li ser piştê wî hespî. Kuro ev e çi film e, ev e çi hal e?

Hindî ev gotî car din ev mêrane paş da çûn. Çûn gotine Paşayî:

-Paşa wela hespê te siwar nebû.

-Be çi dixwazîtin, be dê çi bîtin? Bila bêjî em ê vî bo rêken. Çi dixwazî?

Car din vegeriyên hatin cem. Xulaman gotin:

-Babo Xwedê Paşayî gotiye soz bî çî dixwazî em dê wî bo rêken. Ka tu çî dixwazî? Em dê wî çêbikin li gorî wî.

-Nihe dê wî rêketin yê ez dixwazim? Dê babo herin bo min Qazî zîn biken, lixav biken, zînek baş lê biken û baş şîdînin bînin, ez dê Qazî siwar bibim.

Vegeriyên hatine lalê Paşa, gotinê:

-Paşa wela ev e tiştê eceb yê dibêjîtin.

-Çi dibêjîtin?

-Yê dibêjîtin; heke Qazî zîn biket, lixav biket ez dê Qazî siwar bibim.

-Kuro babo ev e çî ecêba Xwedê ye. Ev e kurek mu'mîn e. Ev e tiştê bin vî Qaziyî de heyê. Wela em dê Qazî bînin lixav biken û biben.

Xulam diçin dest û piyên Qazî digirin û zîn û lixav dikin. Ew mehele hemî hatine seyrê, berê xwe bidenê da kanê ev Bizirke dê çî biketin, dê çî lê bê. Qazî birin ber derî wî zivirandin, Bizirk hat.

-Hah. Ev e tam li gorî min e. Ya be yê din gelek zexim bû. Min neşîya lê siwar bibim.

Qazî siwar bû û çûn. Qazî got:

-Wela sona min e. Te ez girtim û naberdeyî.

Qazî îrandin heta ber derî Paşayî. Bizirk peya bû. Çûne jorî da. Paşa gotê:

-Ev e te em beecandin, her wextî te miqamek, te tiştekek got. Min hemî jî bo te înan. Dê ka bêje ev xwena min çi ye?

- Paşa naçêbît. Her dê bo te tenê bête gotin. Ev nav alemê de naête gotin. Ev cimaeta hemî ber xatira te hirbûne vê rê bila belav bin. Her kesek biçîte ser şolê xwe. Yê şolek, emelek, gotinek hebît bila bêjît û biçîte ser şolê xwe û mala xwe.

Mirov belav bûn, çûne malên xwe. Ew jî ji dîwana Paşayî rabûn çûne mala Paşayî. Çûne cem jinên Paşayî. Çûn û dît ku Paşayî du jin hene û xidamek jî heye. Bizirkî got:

-Paşa wela sebzeyek jî îrandiban, me sebzeyek jî xwariba.

Sebze jî îrandin û Paşa jî deyna dev xwe. Berê xwe dayê kêrika Paşayî nav sebzeyi de hemî zêr e. Paşa mijûl, wî (Bizirk) destê xwe ho înan ho bir, kêrik cindî pêça Bizirkî, kire berîka xwe da. Kêrika wî dizî. Kêrik dizî da pê axiftin bête kirin. Qederek ma Bizirkî got:

-Ka ew kêrika lê re, ku lê hat?

Her yekê got lalê vî, vê û wî ye. Bizirkî got:

-Ca dê kêrik çawa berzebîtin. Ca xwe min nebiriye. Her ya lalê we. Divê ez derêxim. Paşa ez çi bêjim divê hûn gotina min biken, da ez dirist bikem, çêbikem.

Bizirk rabû der qifil kir. Da ku kes dernekevîn. Her du jinên Paşayî ne, xidame, Bizirk e û Paşa ye. Bizirkî gotê:

-Paşa ez çi bêjim tu dê xeberê min bikî. Ka çeketê xwe biêxe ca berê xwe bidemê ka tê de nîn e. Şelê xwe biêxe, ka kirasê xwe jî biêxe.

Bêmane derpiyê wî jî da êxistin. Gotê:

-Tu were vî rexî. Tu dirist î. Ne hîleya te ye.

Gote jina mezin jî:

-Kanê cilkên xwe biêxe.

Jinikê:

-Huuu. Tiştên husa dev we naêne kirin.

Gotê:

-Huuu ca ez êfîmek im. Ev e malxweyî te ye. Hun her du jî hewiyên yêk in. Xwe ma hûn biyanî ne. Ez jî her hindî biçûkê te me. Ez wekî êkî şermê bim. Ka biêxe belkî te dizîbît.

Wela wê jî êxistin. Jinika din jî we kir. Xidam pê naket bi zikê xwe da. Qet xeberî wî naket, qebûl naket. Tiştê wiha, paşa, filan bêvan naket. Bizirkî got:

-Wele dê biêxî.

Xidamê didin axiftin. Bêedebî ye jî bêjin ew sêniya rizq her du jinên Paşa bûn, ew mecmeiya rizqî helalên wî bûn. Ew seyê reş xidama wî bû. Xidam serî de jinik bû wekî din mêt bû. Bêmane têkiliya her du jinikan dikir. Her du jinik heram dikirin. Ew seyê reş ew bû li ser mecmeiyê de hat rizqê Paşayî hemî heram dikir. Bizirk dibêje:

-Aha Paşa. Hal ev e ye. Tu ewan digirî, dikujî, tu wan berdideyî çî lê bikeyî ew hêdî xema te ne.

Nayê zanîn ku ka Paşayî çî lê wan kiriye. Bizirk dibêje:

-Paşa şîretêk min li gel Qazî jî heye. Divê ew wî jî bînin. Ya muhim dê ser serî wî biête kirin.

-Çi bûye?

-Tu dizanî ez kî me? Ez kurê Ehmed Xerîbe bûm. Ehmed Xerîbe mirovek ho bû. Feqîr bû, saf bû. Filan cihî te erd dabûyê. Ev erd diînît kolîtin. Bin de xizînek derdikevîtin. Bêjît xizîna Paşayî ye. Ya din em dê biçin ser derê xizîneyê bêjin. Tu Qazî û hinde ewên seran jê dikin- celad- çar pênçekan ji wan bide gel me. Tu jî gel me, em hemî gelêk biçine ew avahiyê Qazî çêkirî kanê çend qat in.

Qazî gazî kirin. Bizirkî gotê:

-Qazî avahiyên te çend qat in?

-Avahiyên min du qat in.

-Ne Paşa. Avahiyên Qazî sê qat in.

Paşa dibêje:

-Nexêr ez zanim du qat in. Bizirk behsa sê qatî neke. Heyfa te ye, tu bo min lazim î.

-Ne Paşa sê qat e. Ka em biçin berê xwe bidenê.

Paşa, ew hemî rêketin çûn bo mala Qaziyî. Çûne qata serî.

-Paşa ev e qata serî, ne wisa.

Çûne qata din, got:

-Ev e qata bin î, ev e du.

Paşayî got: Erê

Bizirkî got:

-Ew kuncikê henê, derek yê lê çêkirî, mehfûrek ser dadayî.

Diçin rakirin pêlekan dibînin. Wan pêlekan de diçine xwarê, Paşa ew çî bibîn;

-Çi qiyas xizîne tê da ye. Zêr û zînet û heykel tê da ne.

Bizirk dibêjîtê:

-Paşa tu dizanî ez kî me? Ez kurê Ehmed Xerîbe bûm. Ehmed Xerîbe ew erdê te dadayî de xizîne derkeft. Hewara xwe bo te îrand. Got ev xizîne ya te yê. Bêt bo te bêjît, Qaziyî nehêla gehîte te. Qazî berahîka wî girt, gotê: -ewlî bêjiye min, pirsgirêkek hebe ew ya min e. Ez ê hel bikem, paşê em dê bejine Paşayî-. Aha înaye lê re. Babê min yê he kuncikê henê de kuştiye. Ev e çend sale li wê rê. Vî Qaziyî kuştibû. Hal û mesele wiha bû.

Paşa Qaziyî didete kuştin. Bizirk dibête xwedanê wan avahiyan. Paşa dibêje:

-Ev heqe yê te ye. Yê Qazî nîn e.

Ew avahî dibête yê Bizirkî. Paşayî du keçik hene. Dema Bizirk çend sal din mezin dibe keçeke xwe jî didetê. Dawetê bo çêdike. Ew avahî, xizîne hemî jî bo Bizirkî dimîne.

Çîroka me tê dawiya xwe ya xweş.

(Bêjer: Selim Şen)

2.1.1.6. Şens û Aqil

(Em di wê çîrokê de du cihan jinê dahûrînin. Yek jina mêrikê zengîn yê lehengê me yê xudanê şens û aqilî ye. Di çîrokê de gelek behsa jina wî nehatiye kirin. Lê belê dema mêrik behsa zar û zêçên xwe dike em dizanin ku tenê li mal de ye, her tiştan hazir dixwaze û çî keda destên xwe bi xwe jî nizane.

Ya din jî jinika bihal e. Jinika ducanî ji aliyê mêr ve çawa hatiye îhmalkirin, heta roja zayîne jî çawa li ber xizmetên zilamî hatiye perwirdarkirin dibînin. Rewşa jinikê di malê de wiha ye. Lê di civakê de ev jinikên bihal çî qîmetê dibînin jî tê ber çavan. Kesekê îlmdar dad û nêrît û kevneşopiyên civakê ku di riya jinikê de biêne cih li ber zilamê dike wekî erk, wekî bend).

Mirovek gelek zengîn bû. Şensê wî jî şol dikir, aqilê wî jî şol dikir. Gava Xudê didete mîrovî, hemî tişt her çêdibît. Çend sal paş ketin diruma wî gelek xwuş e, halê wî gelek xwuş ê. Petrola wî heye, pezê wî heye serî çiya, cihê şolê wî heye, çî kêmasiyên wî nîn in.

Nihe gava xudê xîrab diket şens dibêjît: hemî tişt ya min e ez şol dikim, aqil bêjît: ne xwê ez şol dikim. Aqil bêjîte şensî: Be ka tu razê, ez ê şol bikem ka hemî ya te ye an ya min e. Şens bêjîte aqilî nexê tu razê. Ew bêjît nexê tu razê. Şens dumahîkê bêjît –Ez ê razîm. Nihe gava şense mîrovî raza aqil ji cihê xwe da her car namînit. Şensî wî raza bîra çû, lalê petrola xwe rûnişte xwarê aqil jî keft, cihê xwe da nema. Cigareya xwe kêşît agîrî avêjîte nav benzîne. Ma agir bo çî na berbûyî petrolê.

-Hay bab hay filan kanê werin bo xatira Xwedê harî min biken em ê agirî damirînin. Hemûyan gotiye:

- Babo zengîn e, dê bila çî lê nayê. Bila bisoje, biçît çî lê nayê.

Petrol sot. Çî kes hewarê de nehat. Çend rojek din pê ve çûn şivan hatin gotin:

-Welah diz hatin pezê te hemî birin.

-Kuro babo rabin em dûv de biçin. Pezê min hemî birin. Mixabin e. Hin de pezê min hebû, kerî min hebû.

Yek bigel neçû. Yekî harî nekir. Ne qewmê wî, ne mirovên wî, ne dostên wî. Hemûyan piştî xwe dayîne. Kerî pezê wî jî çû. Wê derê de çû, lê re de çû. Çî diçû çî nedihate şûnê. Got:

-Xwedê şensê mirovî jî raza her diçît.

Yê çûyi jî nedihat ser. Be mala wî hînbûyî goştî ne, hînî tiştên xweş in. Pare êcar destî de nemane. Diçe qer dike. Hînî qerkirinê nîn e. Ama baweriya xelkê ji lê têt. Bêjin:

- Em ê bidene, her zengîn e.

Çû lalê qesabî kelexek îna. Malî elimtî ne, çend rojekan da xelas kirin. Çi ji destî nehat. Ticarî jî çû, nekir. Qesab jî paş ve diçît. Qesab berê xwe dayê çi nema.

Gotê:

-Xwedê ev mirove ez jî perîşan kirim.

Rast hat gotê:

-Filankes tu her dibeyî, tu her çi naînî. Be dê kengî parê min îmî?

-Piçek sebrê bikêşe. Muhleta min bide, Xwedê mezîn e.

Çend rojên din pê ve çûn, dîsa çênebû. Hat gotê:

-Bira dê pare min kengî bideyî?

-Tam 20 rojên din. Roja 20ê li min bigire, ez ê parê te bidim te.

Bîst rojên din borî qesabî kêrika xwe ya qesabiyê hilgirt çû. Hate ser rêkê.

Got:

-Wêca bila bêt hecetekê bila bigirî, êdî ez dê wî bikujim.

Demek şûnde berê xwe dayê ev e hat. Gotê:

-Selamunaleykum.

-Aleykumselam.

-Te îna? Îro roja te ye.

Ho berê xwe didetê çi bo nekiriye, qedem lê şikestin. Gelo çare vî qesabî.

Gotê:

-Qesab berê xwe bideyi, ewî mirovê henê dê pareyi bidete min.

Qesabî bere xwe da mêrikî, ewî hêland. Qesab dibîne mêrik çû. Pey vî dikeve ji şehri derdiêxe. Mêrik sivik bûye û tirsên xwe de jî çiya ser keftiye. Qesabî neşiyaye bigehîtê. Ji aliyê din hatiye xwarê. Berê xwe didetê etarek barê kerekî bo xwe çerçîfî dike. Kerê wî keftiye kurê de. Neşê derkeve. Dibêtê:

-Wey Xwedê! Ev e tu kuda rastî min hatî?

- Welah ez xweşiya xwe da nehatime. Yê keftine dûviya min da. Dê bigehine min, rewşa min nebaş e. Lê tu niha çi dibêjî?

- Bo xatira Xwedê tu harî min bike. Em kerê min ji kurê derbixînin. Êca paşê here.

-Bira ez neşê xwe hêviya te û kerê te bigirim. Gehîte min dê min bikûjît.

-Sozê xwedê bît ez dê harî te bikem. Hema tu harî min bike.

Xwedanê kerî stuyê kerî, vî jî dûvkê kerî girt. Ho badidin, dûvika kerî binî de derêxist.

-Babo te kerê min seqet kir. Te mala min xirabkir. Te zanî dê qibhît te bila zeft girtiba.

-Min jî kêşa da ker derkevîtin. Min nezanî dê dûva wî qetîd. Ma min xirabî kir, min harî te kir.

-Bira welah heqê kerî min bide. Te kerê min seqet kir.

-Bira dê heqê kerê te bidim. Min berde, ew ê he min bigirît dê min bikujîtin.

Nav destê wî de xelas dibe. Qesab dibêje:

-Wî bigire bigire

-Çi bigirim, min got mirov e, dê harî min biketin. Wî kerê min seqet kir.

-Tu jî gel min were. Em dê wî jor da bigirin. Heqê xwe bistînin. An pare an cihek an warek jê çêbikin. Tu jî harî min bike. Em dê heqê kerê te jî navde derêxînin.

Ketine dûv de. Mêrik berê xwe didetê bûyîne du. Ketin pey, înanandin şurheyek baxçeyî kevîte pêş. Fersend nedît xwe li ser şurhê de avêt. Xwedanê rezi bavê xwe biriye danandiye binê şurhê. Diçe nav serê babê wî dikevîtin. Qerîn ji bavî wî diçûn. Bavî wî herişand. Yê din jî hedî hedî hatin xwarê.

-We xêr e? Ev e derdê we çi ye?

-Hal û meseleyên me ev e ne.

-Xwedê babê min jî kuşt. Be lazim e ez jî gel ve bêm. Heqê babê min jî nav de derkevîtin.

-Tu jî were harî me bike.

Înanandin bo binê çarşiyê. Li wê rê rastî destek avahiyên du qat hatiye. Dibêje:

-Vî avahiyê du qat tenê du mirov tede hene?

Hema xwe diavête tê da. Ecele çûye, jinika mêrikî pišta derî bûye. Jinik hemle bûye, aciz e. Hema diçe palek derî dide jinikê erdî dide. Malxwêyî we jî berê xwe didetê û dibêtê:

-Baş e çi ecela te ye, tu çi mirovî? Baş e te jinik kuşt.

-Ketine dûv min de. Min jî hewara xwe bo te înanîye. Min nezanî jinik pişt deri ye.

Hêj da negehiştiye jêrî yên din tên, wî jî car din hêland. Malxwêyî malê jî gehişte wan meseleya xwe bo wan got. Wan jî got:

-Tu jî were gehe me ca em bo te jî çarekê bibîn.

-Dê bila.

Bûne çar mirov. Mêrik diçe rastî mizgeftê tê. Dibêje:

-Babo qatî çar mirov mizgeftê de hene.

Îca ber derê mizgeftê şensê wî diête halê. Mizgeftê de hoceyek heye. Mêrik rojekê wî bi keçikekê ve dema dileyîze, tirane dike dibîne. Dixwaze hoce wekî şerîetê li ser bisekine, heqiyê bidetê. Li rastî mêrikî fediyên hoceyî çêdibin. Be dê harî biketin. Hoce dibêjt:

-Ew kî ne ber wî derî? Dê ka bila bîn. Yê ewil hatî, yê ecele kirî kî bû?

-Hoce welah ez bûm. Eger min ecele nekirîba da min bikûjin.

-Dê ka bêje te çi lê kiriye, kanê sûc yê te ye an na, her çaran berdayîne te.

-Belê wela sûc yê min bûye. Ez gelek zengîn bûm. Halê min baş bû, durima min baş bû. Dumahîkê xirab bû, çû. Her tişt ters çû. Biçûkên min jî nezanî kanî min her car bo wan kî derê diîna. Tenê digotin babo here biîne. Min qer dibirin, pare çinebû, şol çinebû. Dumahî qesab kete dûv min. Guneha min û yên din çinebû.

Tiştên gel yên din serî hatin yek bi yek hoceyî re parve kir. Hoceyî got:

-Qesap xwedanê neheqiyê ye. Tu heq î. Bi riya qesabî ev ên henê serî te hatine. Heger qesabî bernerabata ev ên henê çenedibûn. Qesab suçdar e berdaye te û tu tirsandiyî.

-Qesab parê te çend e?

-Çar sed hizar e.

-Çar sed tê de sedî şerîet diavêjîtin. Çîmkî te zorî, zilm lê kiriye. Ji ber te ev serî hatine. Sê sed hizarên din jî tu ji min dixwazî. Heyvek din paş ve were, ez dê bidim te. Ama sed hizarî tu dê niha bideyi wî. Sê sed yên te ne.

Hate xwedanê kerî. Gotê:

-Kuro ma çi me'lûm e te dûvka kerê xwe te şikandîbît. Tenê mabîte çerm. Êca çermê xwelîser biqetyabît. Te bila dûvka kerê xwe girtiba, wî bila stuyê wî

girtiba. Eger stuyê kerê te derxistiba welahî wî demî tu heqbûyî. Te xete kiriye. Tu dê sed banqanota bideyê.

Pare jê stand û rêkir. Hate xwedanê rezî. Gotê:

-Te bo çi berdayê? Babê xwe te danayîbû kî derê?

-Binê şûrhê.

-Ma mirov babê xwe danîte binê şûrhê. Her ne ew yêkî din jî ba da nav serê bavê te kevîtin. Kes nizane çi li wir e. Te bavê xwe danaba binê darekê, nîveka rezî. Da bînin. Xwedê te bêpaz jî bikin te heq kiriye. Seda tu jî biîne.

Sed jî ji wî standin û rêkir. Hate xwedanê jinikê. Gotê:

-Jinika te xwedê biçûk daye?

-Erê welah.

-Tu kî derî bûyî?

-Kuncîkê odê, rexê serî rûniştibûm.

-Ma ew cihê rûniştina te bû?

-Be ez da kî derî rûniştibam?

-Ca tu bila wê derê ne rûniştîbayî. Jinika te nexweş bû. Bila odê da ba. Tu çûyîba salonî de. Te nobe lê girtiba. Te di binderê de mayîba. Hindek camêrên din hatiban. Ma şerm nebû, jinika te vî halî de. Te yan derî binderî yan jî yê navê girtiba. Kesek hatiba hundir da derkek heba, sualek heba pirs kiriba. Tu da mêrikî bînin. Jinik jî da halê xwe da odê da ba. Aha te jî xete kiriye. Xeteya te gelek e. Sed banqanotan tu jî biîne.

Ev sê sed, çar sed banqanot dane mêrikî. Gotê biçît li ser wan pareyan şol biket. Yê din jî çûne malên xwe. Şensê mêrikî jî li wir şol kir. Car din serbikeft.

(Bêjer: Selim Şen)

2.1.1.7. Melayê Fend

(Em di wê çîrokê de dibînin zilamekî çawa neheqîya tê xwestin ku li jina wî bête kirin bi çî bûyeran ve berteref kiriye. Kî ev zilamê leheng ji civata îlmî de derkeftiye. Mela ye, oldar e. Di her bûyerê de heqê xwe û hevjiîna xwe diparêze. Ji aliyê din ve jina wî jî, ji wî bibawer e. Jiyanêke hevpar dayîne pêşîya emrê xwe. Li rastî her tiştan, her zehmetiyan bi hev re ber xwe didin. Ev jî jiyanê siruştî ya hevpar û adil tîne pêşîya me.

Tiştê din ya balkêş jî ew e ku li gundê mela û jina xwe lê dijin, tu jin din deng derneexistine ku bi piştgiriya wan ve malxwêyên malê hîleyan herduyan neken. Mixabin bêdeng mayîne. Ev jî bandor û rewşa wan ya di nava mal û civakê de îfade dike).

Rojekê xoceyek hebûye. Mela, be hingê meaş çinebûne, zikat bo xwe xir kirine. Gundekê da bûne. Ewî gundi jî zivistana wî gelek dirêj kiriye. Gotiye:

- Xude em hinde, em ber biharê nakevin. Tiştê me nema. Em bînin çêlek me stewr heye, gelek jî qelew e. Em dê bînin ser jê ken û ciranên xwe hemûyan jî gazî bikin, bila şîvekê jê bixwin. Em dê bêjin welah daxwaza me jî ev e ye. Em jî dê her rojekê mêvanê malekê bin, heta em li ber biharê dikevin.

Çêleka ser jê kirin, pişyayek cindî dane çêkirin, gundî hemî gazî kirin. Gund jî şêst heftê mal in. Hatî şîva xwe xwarin. Gotin:

-Xoce her çî di dilê te da Xwedê qebûl biketin.

-Welah niyeta min ev bû. Çî tişt mal de nemaye. Em jî eger hûn qebûl biken, her roj em dê mêvanê malekê bin.

-Bila Xoce ser çavan. Her çî mala tu tê da tu serbest î.

Hemî derkeftin çûne binderî munaşera xwe kirin, gotin:

-Bila em dê Xoce qebûl biken, bes bila jinik neêtin.

Xoce jî xelîserî jinikê tenê, tînî û bîrsî bihêle malê de, nabîtin. Xoce jî bijinikê qebûl nabîtin. Şevêk din Xoce diçe ber derî malekê jinik gel da tik tik derî dide. Xudanê malê derî vedike:

-Xoce tu hatî?

-Belê.

-Baş e te bo çî jinik îrandiye?

-Ca be jinik namînîte mal de tenê. Be em dê her gelêk bin.

-Ne welah em te qebûl diken, jinikê qebûl naken. Te bo jinikê negotiye me.

Dê kevine hecetan. Çû mala din eynî, çû mala din eynî. Gote jinikê:

-Xwedê ev e hîle ye. Her haj ji yek heye. Her eynî gotin e. Hema ez dê rabim çime şehîrî. Ka Xwedê, ez dê çarekê bikim. Tu jî here malekê nanekê bixwû. Ez jî dê biçim.

Înandiye kevilê çêlê avêtiye nav milên xwe telîsekê da, riya xwe girt, çû bo şehîrî. Heke vê rojê gehiştê şehîrî, roja din xutbe ye. Çû melayê wê derê dît. Gotê:

-Mela hal û meseleyên min filan gundî ev e ye. Ev e hatin serî min. Welahî kevilî zêdetir çi destê min de nemaye. Îcar heke hûn bo min yardimekê, komehgekê biken dê riya Xwedê da gelek baş bît.

-Tu gelek xêr hatî. Ser çavan. Ez dê bêjime hemî yê dibêne mizgeftê, tu jî kevilê çêla xwe rayêxwe ber derê mizgeftê. Hemî belav dibin. Bila çi diavêtin îşlah dê bo te tiştêk pê bên.

Kevil raêxiste ber derê mizgeftê, cimaetê nivêja xwe kir, derkeftin. Melayî jî got:

-Ev mela hatiye lêhbandin, çêlek wî hebûye. Ev çêl jî ev bûye, bo wan gundiyan bûye şîv, ku her roj biçîne malekê. Gundiya paşê xirabî gel kirine. Mela qebûl kirine, gotine jinikê qebûl nakin. Riya Xwedê çi destê we bêt, hûn yardimekê bo biken.

Çi mirovê derkeft eger kevil dît cergê wan bo disot. Yê yek banqanot dê avêtiba, pênc banqanot diavêtin. Gelek pare bo Xoce xirikandin. Ne parê çêlekê yê çar pênc çêlan kombibû. Pare zêde bû. Pare xwe rabû xir kir. Çû meydanê, hespek law kîrî. Piştî hingê tiştên bo mala wan çi lazim e, ihtiyacên xwe hemî barek lê kir, hespê xwe siwar bû, înan gundî. Ama bo nimûne hindê kevil jî gel xwe îrandibû. Gundî hemû hatin pêş ve, gotinê:

-Xoce be te got min çi nîn e, be ev e çi mal e, çi hesp e, çi bar e? Te ji ku ve îrand?

-Kuro be dayîna Xwedê ser çi ve nîn e. Heger Xwedê dayê na bêjît tu kurê kî yî. Serî de ez çûm hind muşteriyên kevilî hebû, êdî xelkê kevil nedidît, pirtik pirtik dikîrîn. Min jî kevilê xwe pirtik pirtik kir. Aha ev barê tiştan û hesp min hemî bi kevilî ve kîrî. Piştî hingê ez hatim. Hinde pare jî xir kiriye.

-Kuro çawa, çi ticarî bû?

-Welah ticar bo min hatin, eger xwedê dayê na bêjît tu kurê kî yî, min kir û ez hatim.

-Kevilê çêlê hind biha bûye?

-Kevil biha erzan nizamim, min kiriye û ez hatime. Hûn jî keyfa xwe ne.

Wan jî berê xwe dane yê ku kevilê çêlekê firoşît, dê du sê çêlekan pê bikîrîn. Yê çêl heyî, yê ga heyî, herkes diçe heywanê xwe ser jê dike. Heywan nemane gundi de. Înandin û gotine Xoceyî:

-Xoce qeyta kevilî çend e?

-Min her hinde (pirtik) yê birî. Hûn jî keyfa xwe ne mezîn, biçûk bibirin; êdî ez vana nizamim.

Wan înan ew kevil hûr hûr kirin. Êdî kesekê goşt nedixwar. Hemî bo Xoceyî man. Pêncî şêst zelaman kevil avêtine piştî xwe û riya şehri girtin. Çûne nav eceman de. Gotinê:

-Gelo we bo çi ev kevilê hûr hûr kiriye?

-Manê muşterî hatine hoke kîrîne.

-Çi muşteriyên kevilê hoke pirtik pirtik kîrîne me nebihîstîne. Şehri da nîn in.

Tim şehri geriyan muşterî nedîtin. Neşiyar firoşin. Wê şevê mane şehri. Roj jî car din berê xwe danê çi muşterî nedîtin. Gotin:

-Heqê wî melayî kuştine.

Rabûn dilekî birîndar hatin, kevil jî hemî avêtin. Çi heywan jî bo nemane. Çûne nik mezîne gundî. Gotinê:

-Em dê Xoceyî bikujin.

Diçin ser mala wî de digirin. Xoce hewara xwe dide axayî:

-Axa tu harî min bike. Min çi nekeriye. Şerîetê bicih bîne.

Gundî dibêjin:

-Axa heta sibe bila nava gundî de bila darekê ve girêdayîbît heta sibehê. Em dê sibê efû bikin.

Axa û Xoce qebûl dikin. Xoceyî darê ve girêdidin. Niv şev ticarek bîst pezekan ve tê bo nava gundî. Xoce planekê çêdike bo xilasbûna xwe ya sibehê. Hêjta mêrikî ew nedîtî dibêje:

-Min nevêt, babo welah min nevêt.

Mêrik meraq dike ka ev e çi ye nevêt. Tê lalê wî:

-Ka te xêr e, te çi ye nevêt?

-Keça axayî zorî didene min, ez jî dibêjim min nevêt. Heke tu nihe bê şûna min da dê bêjine te te divêt, tu dê bêjî erê min divêt. Rûyê min nasnakin. Dê sibê keça axayî wergirî û keviye ser rêka xwe.

-Were ev peze bila bo te bît, ew (keça axayî) bila bo min bît. Tu şûna xwe bide min.

Mêrik Xoceyî xelas dike, Xoce wî li şûna şidiya girê dide. Pezî dide pêşiya xwe û diçe. Xoce nivêjê de, hêjta gundî nerabûne pez bir piştta çiya. Li wir golek hebû ama bêbin bû. Tiştê çû tê da hema diçû, nedihat.

Xoce ji dûr ve xwe gîro dike. Çavê wî lê ye. Gundî sibehê hicûm mêrikî diken û dikujin. Hemî belav dibin, diçin malên xwe. Xoce pezî dide pêşiya xwe tê bo mala xwe. Berê xwe didenê ev e Xoce ye:

-Wele me Xoce pirtik pirtik kiribû. Ev e çi ye, çawa çêdibe? Me tu kiribû gola bêbinî de.

-Ew gola bêbin heye pez têde hebûn, bizin têde hebûn, her tişt têde hebûn. Hema kî biçîtin gelêk herin hûn jî bînin.

Ew zelumên çinezan yek û yek xwe avêjin binê golê. Wê şevê nehatine ve.

Sibê gotinê:

-Xoce ev çi lê hatin, bo diyar nakin?

-Babo wê ca ez çi lê bikim. Ez çûm, min çi mucadele gel nekeriye. Min hema ev çend pezkê derêxandin, înanandin û ez hatim. Ew nihe şerî dikin. Yêk bêje bizin bo min, yêk bêje çêl bo min. Ew belkî çend rojên din jî neyên.

Xoce diçe dibête jinika xwe eger wê carê jî pê bihesin dê wî bikujin. Radibin şev xwe pêk tînin û dûrî gundi dibin. Diçin gundek din. Bêjinê:

-Tu çi kes î?

-Ez xoce me.

-Ê baş e. Bê tu falikan dizanî?

-Erê ez falikan jî zanim.

Wextekê diçin berê xwe didenê xizîneya paşayî çi nemaye. Hatin gotinê:

-Xoce xizîna me ya paşayî çi nemaye, birine.

-Ez dê kitêbê berê xwe demê. Lê belê zeman lazim e. Ev e rojekê de dernakevît. Hinde mirîşkan bidene min, da hafizeya min şol bike.

Rabûn mala axayî de mirîşk mişe bûn. Înandine mala xoceyî de, ew jî her şev yekê ser jê dike. E wên diz jî tîn guh didenê ka Xoce dê çi bêjîtin. Diz dibîne ku Xoce bêjîte jinika xwe:

-Xwedê mezîn e. Ev e yek.

Diz difikire ku behsa wî diket û diçît hevalên xwe re dibêjît. Şevê din diz dibin du û çin mala Xoceyî. Dibêjîte jina xwe:

-Ev e bûne du.

Diz dibêjin:

-Em dê sibê sê biçin, ka dê çi bibe.

Şeva din sê heb diz çûn. Xoce û jina xwe mirîşkek din ser jê kirin. Gote jina xwe:

-Ev e bû sê, Xwedê mezîn e. Dê yên din jî çêbin.

Diz berê xwe denê wiha çênabe Xoceyî gazî ber derî dikin û dibêjinê:

-Me kiriye, çarekê bo me bibîne, zêr hemî destê me dene.

-Temam ez dê wesa çêbikim da nekeve sturuka we. Herin hemî torbeyên zêra bînin.

Mêrik çûn hemî înanandin. Xoce, jina xwe û diz çûne ser mexberê. Jinikê mezarek kola û zêr hemî kirine û hatine ve. Dizî kirine sturuka miriyan. Diz jî rehet bûn. Çend roj borîn paşayî gazîkire Xoceyî. Gotê:

-Gelo be çi xizîneya me bûye? Te negot.

-Xwedê dê van rojan derkevît lê ez jî heyret mam. Çimkî xizîneya te bo miriyan derkeft. Demek kî te zikat nedayîne, te bo xwe xêr nekerine, ev e miriyan yên birin.

-Kuro çawa miriyan birine?

-Belê welah miriyan birine.

Çend rojek diborin Xoce kitêba xwe hildigire û paşayî wan jî dibe diçe ser mexberê. Kitêbê ho digire ho digire cihê zêran digerîne. Wextekî dibêje:

-Aha zêr lê re ne.

Paşayî ew der da kolandin berê xwe danê hemî zêr tédane. Paşa dibêje:

-Xêra Xwedê, ev e em hemî xilas bûn.

Gustîla keçîka Paşayî jî xidamê diziye. Ev çend roje lalî ye. Xidam berê xwe didetê Xoce her tiştî derdiêxînît, dibînît. Xidam perîşan bêçare diçe bêjîte Xoceyî:

-Xoce gustîlk ev e lalê min e. Ez dê çi lê bikem?

-Gelek kolayî ye. Tu ho hindêk hevîrî bike, pêçe, bike nav de û bo min bîne.

Çû gotinên Xoceyî cih anî û înanê dev Xoceyî. Xoceyî hoke firand, avête ber qazê. Qazê devê xwe da hevîrî û xwar. Qur kir danan de wê rê. Gote xidamîkê:

-Xanim ew qaza henê bide min ez îşev bixwim dê gustîlkê bidim te.

Xidamkê qaz dayê. Rojek şûnde gustîlk înan da xudanê. Dibêjîte wan gustîlk qazê xwariye. Paşa jî hindêk xizîneya xwe dide Xoceyî, îşê wî jî gelek xweş bide.

Û em tên dawîya çîroka xwe.

(Bêjer: Selim Şen)

2.1.1.8. Hevmehiya Jin û Çêlê

(Ev meseleya hevmehiyê wekî ya nezerê di nava civakê de cihek girîng digire. Ev çîroke jî li ser wê baweriyê hatiye zimên. Em rastiya wê rast û rast nizanin. Lê yên ku em çîrokê de jê derdixin ew in: yêk; wekî gelek caran me dîtin nifrînên li jinikan û zarokên wan hatine kirin, ya din jî di bîr û baweriyaya civakê de bandora olî ye û ya dawiyê jî nezaniya rastî van ya jinikê ye. Nifrîn lê tê kirin, nexweşî bo çêdibin û zanîn jê tê xwestin. Tê xwestin ku jin têra hemûyan bibe).

Jinikek hebû. Çar kurên wê hebûn. Her tim daxwaza wê keçikek bû. Çiqas hal keftiba xwest ku bibête keç.

Xezûrê wê ser meselekê bo xwe sohbet dikir. Ew mesele neçûbû xweşiya wî. Nifrîn li bûka xwe dike û dibêje:

-Înşallah hindî ez sax bim, ez keça te nebînim.

Çend sal piştî mirina xezûrî, xwedê keçikekê didetê. Du roj, sê roj li ser xwedêdana biçûkê diçe naçe pîrekek têt mala wan. Li ser doşeka jinikê rûnîtin. Dibête jinikê:

-Çêla mala filankesî jî şeva din ya zayî.

Dema pîrek wê dibête jinikê, wek aveke sar piştî jinikê de diçête xwar. Jinik dibêje:

-Hay bismillah, ev çî bû.

Pîrekê şûşeke şîrî jî gel xwe bo îrandibû. Heta bû sibe jinikê çî halê xwe nedît. Çîçikên wê şîr nekeftê. Zarok ma bêşîr. Hevalan, cîranan bi şîrê pezî ve harî kir. Jinikê bilî van keça xwe bi nan û şerbete ve jî xudan kir. Demek şûnde keçik hêdî hêdî bi ser xwe hat. Lê ew tiştî serê jinikê de derbas bûyî her tim mejiyê wê mijûl dikir.

Rojekê pîrejinkeke nas tê seredayîna wê. Jinik jî meseleya xwe jê re dibêjîtin. Wê gavê pîrejin dibête:

-Ev hevmehiya çêlekê ye ser te da hatî. Tu da wê gavê hinda nanî rêkey û bila dabana çêlekê. Hem da te şîr hebît hem jî tu ji biçûkan xelas nedibûyî.

Mixabin ne jinikê ev e dizanî û ne jî kesekê hevmehîlêhatin bo wê gotibû. Lê car din keyfa wê xweş bû. Çimkî nifrîna xezûrê wê çênebîbû û daxwaza wê jî çêbibû.

(Bêjer: Ayşe Ücar)

2.1.1.9. Melik Simaîlê Deravê

(Em di wê çîrokê de dibînin ku ka jineke aqildar çawa zilamê xwe kiriye melîkê devera xwe. Jin jineke ji dînek din e. Kur jî wekî Siyabendê Silfvî bêkes û xwedî ye. Keça keşeyî ango jina Simaîlê Deravê ewqas ye bîaqil e, ye zana ye xwe, hevserê xwe û çend herêma xwe li rastî herêmên din çawa aniye asteke bilind dibînin. Wekî tê gotin; jin heye mêrî dike wezîr û jin heye dike rezîl. Wê jina Melîk Simaîlê Deravê jî bi zîrekî û aqilmendiya xwe ve hevjinê xwe heta ku asta bilind hildaye).

Tiyarê çar melik hebûn. Melik Xewşabe, Melik Berxo, Melik Çîço, Melik Tîem. Her yekê mintîqa wî belî bû.

Melik Simaîl dayîk û bavî wî emrê xwedê kir çûne ber rehma xwedê. Ma bêxudan. Zilamekî gele hêja bû, berkeftî bû, nestêleh bû. Bû gavanê Deravê. Wextê bû gavanê Deravê keça keşeyê deravê lê aşiq bû. Wextê ku lê aşiq bû, keçe gote dayîka xwe:

-Hez dikim şû bi Simaîlê gavan bikim.

Dayîk û bavên wê bédiliya wê nekir. Rabûn keçik dane Simaîl. Wextê dayînê keçik xwendevan bû, zana bû, aqilmend bû. Rabû jinikê mêrê xwe da şol. Gotê:

-Tu dê rabî xaniyekî wiha çêbikeyî.

Mêrik rabû dilê jina xwe nehêla û xanî çêkir. Mêş xwedan kirin, pez xwedan kirin her şolek dikir. Jinik rabû navê mêrê xwe dana 'Melik Simaîl'. Her kesê dihate mala wan digotiba:

-Kanê Simo kî derkê ye?

Wê digotê:

-Ez xidam Melik Simaîl yê çûye şolî, filan derê ye.

Milet dê rûniştiba xwarê Simaîl dê ji derve hatiba, jinik li rexê jêrî rûniştiba. Dema ku Simaîl ji derve dihat jinik dê rast rabûba û digotiba:

-Dê kerem bike Melik Simaîl, ez xidam.

Wextê ku jinik ber mêrê xwe ve radibû, mêvanê malê jî ji ber ve radibû. Navê wî wîsa derkeft Melik Simaîl. Navê wî li hemî dera geriya, her kesî digot Melik Simaîl mirovekî wiha hêja ye, wiha berkeftî ye, wiha zana ye.

Melikê Tiyarê, melikê tixûbê bexiltî jê kirin. Rabûm êk kere Melik Xewşabe, Melik Çîço, Melik Berxo û Melik Tîem hatine dev Mîrî. Hatine dev Mîr Nurullah Beg, mîrî gotê:

-Hûn ser çavan hatin, xêr bît, hûn bo çi hatinê?

Gotê mîrîm:

-Simoyê Deraviyê gavan, patî qirêj vê gavê şûna te ye bûyî mîr, şûna me jî ye bûyî melik. Divê tu tedbirekê lê bikî.

Nurullah Beg fikirî bû berê xwe dayê û gotê:

-Gelî Melikan, hûn xêr hatin bes mûsadê biden heta çend rojeka. Dê hûn dev mi bin supheta mi bin. Piştî hingê gava hûn çûn ez ê rabim qesta Deravê kem ka ca ev e kî kirye Melik.

Se roja mayîne mala mîrî, piştî se rojan rabûn xatira xwe ji mîrî xastin, çûne Tiyara rengîn. Du roja piştî hingê Nurullah Beg jî gotê xizmetkarên xwe:

-Hespî zîn biken, rabin xwe bidene gel min. Çek û rextên xwe hazir bikin, em dê biçine Deraveyê.

Rabûn xwe lêkdan û çûne Deraveyê.

Jinika Melik Simaîl berî hingê sualên mîrî kiribû. Her tiştên wî dizanî. Hejta neketibû gundî jinikê hespî wî naskiribû. Rabû bi ber ve çû. Ser hevsarê hespê mîrî girt û got:

-Mîrîm tu xêr hatî. Ser çavan hafî. Ev e kî bagerê tu avêtiye vê derê? Te keyfa me înan.

Mîr bire mala xwe, hêj rûniştî nerûniştî qahweşîrek bo înan. Hêj qahveşîra xwe xilas nekirî firavînek bo hazir kir. Mîrî gotê:

-Kanê Simo?

-Ez xidam, Melik Simaîl ye çûye şolî. Dê berê êvarê bêtin.

Mîrî çend caran suala xwe dubare kir. Jinikê gotê:

-Mîrîm ez xidam sebrê bikêşe. Dê Melik Simaîl betin û tu dê wî bibînî.

Êvarî Melik Simaîl ji çiyayî hat. Jinikê her tişt (av, cil, gûzan hwd) amade kiribûn. Melik Simaîl xwe hazir kir bo dev Mîrî. Şel û şepikin Tiyarî, şala Kirman xwe kir û çû dîwana Mîrî. Dema çû xanî ve jinik ber ve rabû. Dema jinik rabû çend felehên Deraveyê û Mîr jî rabûn. Melik dev Mîrî rûdinin û sihbet dikan. Şîvek xweş bo Mîrî çêkirin.

Piştî millet belav dibin, Jinik gora Mîrî ya diryayî dibîne û ji Mîrî gora wî dixwaze. Dema nivêja sibehê Mîr dibînît jinikê gore bo çêkiriye. Piştî nivêjê têştê bo deynît. Dixwen, vedixwen xwe hazir dikin bo çûnê. Wî wextî Mîr dibêjît:

-Simo kesê tu nenasî, berê xwe nedane te. Gotine te Simoyê patik qirêj, Simoyê gavanê Deravê. Tu xulamê wê jinê bikî ev jinika hinde qedêr mihterem, hinde qedêr xatirgirt, hinde aqil û berkeftî, tu kiriye Melîk. Min jî ser xatira vê xwîşka henê tu kiriye Melîkê Deravê. Yêk ji her çar meliken din xwe têkilî te nabin. Tu Melîkê van erdayî.

Xatir xwestin û çûn. Mîr çû paytextê Tiyarê Gêmanê bû. Li gel melîkê Gêmanê gazî kire her sê melîkên din. Her çar melîk lê kom bûn. Lalê millet û melîkan got ku:

-Simaîlê Deravê melîkê Deravê ye, mintîqa wî ev e ye. Edî xwe têkil van cihan nekin, silh bila hebîtin.

(Bêjer: Halil İbrahimoglu)

2.1.1.10. Pîra Mirovxwer

(Di wê çîrokê de pîra mirovxwer tê pêşiya me. Wekî di gelemperî çîrokên wiha de di wê çîrokê de jî pîr ye xirab e. Taybetmendiyên derasayî hene. Kes nikare li hemberî wê rabe û yan jî ev rabûn ye bi gelek zehmet e. Lê dawiyê her daxwaziyên wê çênabin. Lê car din pîr bi rola dayîkiyê ve Tehlo dixapîne.

Mestan û keça xwe lehengên din in. Her du li rastî pîra mirovxwar radibin û li ser dikevin. Lê mixabin di wê riyê de bav û birayên xwe jî winda dikin. Lê mixabin di van qeyban de çî sûc û kêmasiyan wan nîn in. Tehloyê mêrê Mestanê baweriyê nade jin û keça xwe, lê dide pîrê. Nebawerkirina jin û keça wî dawiya emrê wî tîne).

Yek hebû jê re digotin Tehlo. Tehlo ji bo xwe çû kezwanan, kekolgerê kezwanan gêr bû. Di dûv kekolgerê kezwanan re çû, berê xwe dayê pîrejinek li wê derê ye.

Pîrêjinkê got:

-Dawo were, tu li ser serê dayika xwe hatî, ez jî te digeriyam, tu li ku derê bûyî.

Tehlo gotê:

-Pîrê ez ji xwe re hatim kezwanan.

Pîrê got:

- Ho tu li ser serê pîra xwe hatî! Ka here zarokên xwe bîne ku ez ji te re xweyî bikim.

Ew jî çû mala xwe ji jina xwe re got;

- Hurmetê rabe biçin, pîra min li wê derê ye, biçine li cem pîra min.

Jinikê got:

-Xwelî bi te wero! Ew pîra mirovxwar e, dê me bixwe!

Tehlo got:

- Hişe! Ew pîra min e.

Ma jinik dê çî bibêje feqîrê. Wê jî du zarok hebûn; kurkekî wê hêj bi şîr ve bû ew birin û keçkek hebû ew jî birin û çûn. Çûn li wê derê, berê xwe danê pîrejinek li wê derê bû, pîrejinkê got:

- Werin.

Navê jinikê Mestan bû, pîrejinkê got:

- Mestanê dê were tu li ser serê pîra xwe hatî bi van zarokan ve.

Çû rûnişt xwarê. Roja paştir got:

- Em biçin balavê, serê xwe bişon.

Feqîrê Mestane jî got: Belê.

Çûne balavê Mestan got:

-Ez bi kurkê xwe re dê bêm.

Pîrejinkê got:

-Nebe! Bihêle malê, ez ê bihejînim heta ku tu tê.

Mestan rabû çû balavê ew û keça xwe çûn, ji balavê vegehrîn hatin.

Mestan got:

-Niha kurê min kiriye girî, ez biçim çîçikê bidim devê wî.

Pîrê Got:

-Hişe, kurikê xew e! Min gumtilekê şekirê danaye li ser devê wî.

Lê pîrê derew dikir, hêj Mestan ji balavê nezivirî girar bo kurikê anî kurik girar xwar û paşê pîra mirovxwar kurik ser jê kir û du qet kir, kire di nava mencelê de keland û hemî xwar. Tenê destekê kurikê mabû, hindî lê geriya destê kurikê nedît, ma di nava girarê de. Girar anî danande li ber dayîk û keçikê, keçikê çawa kewçiya xwe lê da, dest hate li ser kevçikê wê. Keçikê got:

-Dayê ev e destê birakê min e, ev e destê mirovan e.

Pîrê kulmek serê keçikê da û got:

- Hişe, destê birakê çî!

Feqîrê xwe kêşand, ma dê çî bibêje? Wisa ma heta ku bû şev got:

- Dayê dê rabe da birevin.

Rabûn da ku birevin biçin Mestanê got:

-Em ê çî bikin?

Tehlo got:

-Pîra min e, ew hema li we derê wekî golikekê ye.

Û Dehlo nehat. Rabûn ew û keçik da ku birevin lêbek(fêlek) kirin, çûn li cem

Pîra mirovxwar û keçikê got:

- Ez têhn bûm, ez ê avê vexwim.

Jinikê jî got:

-Keça min ava amanan venaxwe, ava moxil û bêjinkan vedixwe.

Pîra mirovxwar jî got:

-Ka bila ew neçe li ser avê ew dê şaş be.

Pîra mirovxwar ditirsiya ku keçik bireve, xwe bi xwe çû. Heta çû li ser avê û çendin bêjinkê xwe di avê re fikir av tijî nedibû, her carê dirêjiya. Av dê çawa bikeve di bêjinkê de her tê de diçû.

Pîrê got:

-Wellehî ev e lêb e!

Heta zivirî hat li cem wan jinik û keçik revîn. Hinek xwe ji pîrê dûr êxistin. Pîrê jî di dûv wan re çû. Jinik darekê xilole dît û keça xwe kire di nava wê dara xilole de û jinik revî. Jinikê jî xwe veşart. Pîr kerbên pîrê vebûn, derket qurmekê darê li wê derê dît hişk bûbû hilveşand û danande li ser milê xwe û çû malê. Çû Tehlo ser jê kir û qedoper kir. Kire di nava mencilê de ew qurmê darê anî dana di bin qeyla Tehlo. Ma bo çi keçik jî di nava wê qurmê de nebe! Dilê jinikê sot, keça jinikê di nava qurmê darê de bû, hin dît ku di nava agirî de dibe kiftekifta keçikê. Jinik neweriya biçe xilas bike kiça xwe. Pîrê jî ewqas qehirî bû, êdî ewqas zêde kurik jî xwarîbû, xwe qel kiribû ketibû li wê derê nivistîbû. Jinik hêdîka çû keça xwe ji qurmê darê anî der. Çawa keçik hate derê çû xwe veşart. Pîr jî hişyar bû her derdorên xwe nêrî, çû careke din bezî li ser mencilê rahn û pîlên Tehlo anîn derê xwar. Careke din serê xwe dana, Mestan jî dê çi bike ma? Ji tirsan çû cihekê dûr xwe veşart.

Pîra mirovxwer serê Tehlo tenê hêland û got:

- Dê were dayê! Jinik jî çû keçik jî

dê were nêçîrka min

min xwe bi xwe kir

min xwe bi xwe berda

rûyê Tehlo yê mayî bi tîr ve ye

ez ê çi bikim.

Serê Tehlo li serê givandê gêr kir heta ku serê çû binê givandê...

(Bêjer: Kenan Çiftçi)

2.1.1.11. Çilnaza Çilkezî

(Pîra mirovwxwer di vê çîrokê de jî hat pêşiya me. Lê li gorî gelek çîrokan pîra li vir hem xwedî zarok e û hem jî çêtir nêzîkî mirovan e. Wekî çîrokên din de deresayî nîn e. Keça wê Çilnaza Çilkezî jî wekî navê xwe ye. Ji bona şûyê xwe her tiştî dide kirin. Wekî jinên xazxazok dide temsîlkirin. Tişteke din jî ya baş ew e ku pîr û keça xwe ji hev û du dûr neşên bimînin. Çiqas pîr mirovwxwer jî be ji keçe dûr nakeve û dayîkbûna xwe ji bîr nake).

Mirovek hebû gotinê Hesên Berber. Dayîkek jî hebû, pîr bû. Navê wê pîra mirovwxwer bû, keça wê hebû navê wê Çilnaza Çilkezî bû. Paşayê gundi rabû gotê:

-Hesên Berber, min Çilnaza Çilkezî divêt.

Hesên got:

- Kî ji te ra bînît, pîrê mirovwxwer e. Kes neşê çîte mala pîrê Çilnaza Çilkezî bînît.

Gotin:

-Herin bêjine Hesên Berber; Çilnaza çilkezî divêt.

Hesên got: Ez ê çawankî jê ra bînim. Herin jê re bêjin bila qesrekê jê re çêken bila hestiyê filan be.

Paşayî got:

- Ez dê qesreka pê hestiya filan ji kî ve înim.

Hesên got:

-Here bêje padişahi, heft bar hûliya neşuştî, heft bar xwê ji min re bînit. Ez dê çim kelhekê jê ra çekem ji hestiyê filan.

Rabûn, çûn gotine padişahi. Heft bar xwê, heft bar hûliya neşuştî jê re rêkir. Hesên Berber bir çû çiyayî danî, gola avê hebû. Danîne tê da hûliya neşuştî û xwê jî, fil hatin ew xwê xwarin çûn. Ew der geriyan hûliyên neşuştî çûne kehniyan da êdî nikarî bûn ewê avê vexwen, bêhna kirêjê jê têt, ziwa bûye. Zivirîn zivirîn xwê xwarin av çûnebû vexwen, ew fil hemî mirin, çûn ew hestî anîn, bo Çilnaze kirine qesrek.

Paşayî got:

-Bila Çilnaz bête têda.

Çilnazê got:

-Min fistanek divêt ji pûrtê kewan.

Çû eynî wesa xwê da kewan jî, av nedayê. Anî fistan çêkir jê ra.

Paşayî got:

- Dê kî biçît bînit, Hesên Berber dê biçît binît.

Hesên Berber got:

- Min qesr çêkir, min fistan anî, ez ê çawan biçim wê jî jê re bibem,

Gotinê:

-Here bîne dê sed zêran dete te.

Hesên got:

- Herin daseke daran bo min tîj kin bînin.

Çûn dasekê daran tîj kirin û înanandin. Dana ser milê xwe, derê pîrê da gotê:

-Pîrê em hatin Çîlnaza çilkezî padişah ra biben.

Pîrê got:

- Ez nadim.

Pîrê xwe li wî kuncî da li wî kuncî da, da biçît Hesên Berber bixwet. Hesên Berber heft deran de derbas bû, şikênandin çû, derê sindoqeqê vekir danand ber derî. Dasa daran stûhê pîrê da pîrê kete erdî. Ewî Çîlnaza çilkezî danand tê da û çû. Bir, çû da padişahi, padişahi zêrê wî danê hate mala xwe, got:

- Ev e heft roje hatiye, serê Çîlnaza çilkezî maye neşuştî.

Wan got:

- Dê kî bişot?

Hesên got:

- Pîrê nemiriye, herin bêjine pîrê heke pîrê nebît kes neşêt serê wê bişot.

Çûn gotine pîrê:

- Serê Çîlnazê maye neşuştî, tu bêy serê Çîlnazê bişoyî!

Got:

- Dê kî bêt min bibet?

Gotin:

-Hesên Berber.

Hesên Berber jî dibêjît:

-Min carekê lê daye, ez cara din biçim dê min bixwet pîra mirovxxwer e. Pîrê em biçîn danê xwe çîrikînin jê ra.

Sindoqek danande ber derî. Kewlekê miriyan hevda zengil kir Hesên Berber, kire ser serê xwe da pêy pîrê ket da wî ali wî alî heta gotê:

-Pîrê here sindoqê da.

Pîrê dana sindoqê da bir, çû mala padişahi gotê:

-Wa min pîrê jî anî.

Paşayî got:

-Xwedê pîrê bîr kiriye şeh neaniye, bo serê Çilnaza çilkezî, çilkezîyêt wê hene, tu dê rabe wî şehi jî bînî.

Diçe û diîne, dete pîrê serê wê jî şeh dike, ew jî zêrêt xwe radike û diçe mala xwe.

Ew digehine mirazê xwe em jî têne mala xwe. Çîroka me çû deştê, dê û babêt me hemî çûn beheştê.

(Bêjer: Kenan Çiftçi)

2.1.1.12. Sê Diz

(Di çîrokê de em du jinan dibînin. Her du jî jinên mêrikî ne. Hewî ne. Li ser hewîtiya wan em nikarin ne baş ne jî xirab behs bikin. Ji ber ku delîl tune ne. Lê li ser keseyeta wan gelek tişt dê bîn gotin. Her du jî jinên yekî ne, hewî ne. Her du ne jidil hatine zewicandin, mecbûr mayîne. Her du jî bi jiyana li gel wî dîzî re xwe bextiyar dibînin. Li gel wî bi her tiştî re razî ne. Tu serîrakin, tu nerazîbûn em nabînin. Di serî de jina ereb qencyê lê dike. Li gorî wê qencyê jî ew wê li xwe mahr dike (bo paqîbûna wê, paqîjbûna wê!). Lê jina biçûk hêj biçûk e û çî şert jî ji bona zewaca wê nîn in ku bine sedem).

Sê mirov rabûn çûne diziyê, ji hevûdu re gotin:

- Em ê ji xwe re biçin di dinyayê ve bigerin ka em ê çî bibînin.

Çûne binê destekê di reyekê deştê de rûniştine xwarê, dizê yekemîn got:

-Her kê ji vê derê re derbas bibe dema me derfeta xwe dît em ê bigirin û şelînin, tiştên wî dê jê bistînin.

Hin dîtî ku sûwarek ji jor ve tê, gotin:

- Eh, ev e derbê me ye.

Sekinîn, rûniştine xwarê, sûwar hate rastê di navbeyna wan de her dizekê xwe da li rexekê rê, ji sûwarî re gotin:

-Nelive, em ê te bikujin.

Sûwar sekinî. Wextê sûwar sekinî berê xwe dayê sê zelum in, hêdî hêdî ji mahîna xwe pêya bû, dest avête rima xwe bi rimê sê çal koland. Ji dizan yek girt, kire di çalê de tijî ber û ax kir li ser dizî û vequta. Dize din jî girt kire di çala din de tijî ber û ax kir li ser dize din û vequta, yê sêyem jî girt kire di çalê de tijî li ser ax kir û vequta. Hespê xwe sûwar bû vetereqand, wextê çûyî tajiyek dûv re bû, tajiyê nêçîrê bû. Dizê sêyemîn kunek mabû ji wê kunê re her tişt didît, dît ku tajî hat kete li ser siha serê hevalê wî. Tajî bêhnekê ma û ma, rabû dest pê kir vekoland rasta dizê yekemîn, vekoland, sîngê wî anî li derê, destê xwe cergê wî da ji hûndirê dizî anî derê û xwar, stûyê wî xwar. Paşê hat kete rasta serê dize duyemîn. Sûwar çûbû, kes nizane ka ji ku ve çû. Tajî kete rasta serê dizê duyemîn, Gaveke din jî ma, ax vekoland careke din destê xwe da cergê wî jî anî derê, ew jî xwar. Wextê kete siha serê yê duyemîn dizê seyemîn got:

- Êdî vê neqlê dora min e.

Dinya li tajî germ bû, du destên cergan wê xwariye, hat û serê xwe şor kir rasta serê dizê sêyem. Dema ku tajî hat û devê xwe şor kir dizê sêyemîn devê xwe avête gewriya tajiye. Dema ku baş girt tajiye xwe vequtand, vejenî, wî jî her bizav kir, heta ku tajî hinek sist bû tajî di cih de mir. Tajî kete li ser derê çalê, dizê seyemîn derket, xwe vequtand got:

-Ez ji destê vê tajiye derketim ka niha ew xudanê wê li ku ye dê her vegere.

Diz berê xwe da wan deştan, darek ji dûr ve dît. Got:

- Xwedê ez ê biçim qesta wê dara hanê bikim, dê biçime li ser wê darê heke li wê derê stare nebim çi cihekê din stare nabim.

Dibêjin çû bi şûr û mertalan, çû li binê darê berê xwe dayê birkek li binê darê ye. Av li wê derê ye, cihê nivêjan e. Wî jî dest pê kir dest û çavên xwe şuşt û nivêja xwe ya nîvro kir. Hilda li ser darê çû di nava çiklên darê ra. Berê xwe dayê, toza wî sûwarî rabû li deştê, sûwar hat û qesta li wî erde kir ku yê ew mirov xwe lê veşartî. Wextê diçe li ser derê çalan çi berê xwe bidê, kelexên duyan li erdî, yekê derketî tajiya wî jî di cih de ketî û miriye. Wî devr da û vegeriya, lê geriya, her çû li derdorên xwe gerî tiştê nedît. Berê xwe dayê got:

- Ez ê biçim qesta kaniya hanê bikim, dê bêhna xwe vekim.

Çû gehişte kaniyê, wextê hate li ser kaniyê mahîna xwe girêda, dest pê kir dest û çavên xwe şuştin ku dê nivêja xwe bike, hindê av kire di devê xwe de, çawa serê xwe rakir, çavê wî veket yê li ser gupkên darê ye. Gotê:

-Tu dê ji ku ve xelas bibî, tu yê çawa destê min xelas bibî?

Dizî jî di dilê xwe de got:

-Dê were ez şûr û mertal im, tu jî şûr û mertal î. Ez li ser darê me, tu dê bi jor ve bê, heke ez çi nekim hema min jî bikuje wekî yên din.

Dibêjin; sûwarî hema hilda li ser darê, wextê hilda li ser darê wî bi jêrî ve şûrê xwe derxist, gehişte stûyê sûwarî, sûwar ji darê hat binî ket. Diz ji darê hate xwarê dest pê kir çilkên sûwarî ji ber kirin, kirine ber xwe û xwe bipêçîna, kêf û edalên wî dana li serê xwe, çilkên wî hemû ji ber kirin yên xwe jî êxistin, mahîne sûwar bû, mahîne tereqîya çû. Çendin hat da ku mahîne zêft bike, nikarîbû zêft bike, mahîne wisa xweş çû xwelîsero hin mayî li ser piştê mahîne dê mirîba. Wî hind dît mahîne rasterast çû di nava êlekê Ereban de. Reşmalên konan hemû bi hev re bûn, qesta di nav konan kir. Heta ku çû ber derê şêxê ereban sekinî.

Wextê li ber konê sekinî, wî jî kêfiya xwe ya Ereban ji ber devê xwe re biribû û ser û çavên xwe zefî kiribû. Xulamek hat û paziyê mahîne girt û ji mahîna îna xwarê da ku li wê derê ji Ereban re biaxive bi îşaretan ve got:

-Ez jî nesax im, serê min diêşe, min bibin rexê jinikan.

Çawa derbasî hûndir bû xwe mirand, şêxê Ereban kuştîbû mêrîkî, divê ya Ereban nezanîban! Ereban kom bûn koçikê gotin:

-Baş e çima şêx nahê da ku ji me re sohbetê bike ka evroj çî dîtiye, çî îniye.

Mêrîkî jî got:

-Bêjinê şêx nisax e, nikare bê koçkê.

Ereban veketin qehwe ji mêrîkî re anîn, qehweyên xwe vexwarin, mêrîkî qehwe da Ereban bêhnekê axiftin heta ku wextê nivistinê hat Ereban belav bûn. Mêrîkî çû li ser cihê şêxê Ereban yê kuştî. Berê xwe dayê jinikek hat ber derê wî xwe veşeland, xwe rût û rûs kir û xişî çû li ber mêrîkî xwe dirêj kir. Wextê çû xwe li ber mêrîkî dirêj kir mêrîkî destê xwe avêt jinikê zivirand, devê xwe bir di bin guhê jinikê got: -Ez ne mêrê te me, min mêrê te kuştîye, ez ketim ser bextê te, vêca tu û bextê xwe.

Çawa jinikê zanî, ne mêrê wê ye rasterast rabû cilên xwe kirine ber xwe û derket ji xulamekê re got:

- Ji me re mahîna baş zîn bike, şêx pirr nexweş e. Ez ê bibim li ser gora Xewsi li Mûsilê.

Xulamî jî her du mahînan veşidandin, jinik rabû kete di malê de çendîn zêr û zînetên di malê de tev kirine di nava xurçikê de danande li ser mahîne baş asê kirin û girêda. Piyê xwe avête rêkê ji mêrîkî re got:

-Rabe, hilo! Ez te îşev dê rizgar bikim. Heke gel bû roj Ereban bizanin û te bigirin pirta te qasî serî tiliya te dê lê bikin. Heke min xwe li ber te rût û rûs nekiriba û ez nehatibam li ber te bi rebê alemê bikim min pirtên te qasî guhê te lêkiriba! Bes madem min xwe rût û rûs kir û ez hatime di berê te de êdî te laşê min dît, te ez dîtîm. Êdî ez kêr tu kesan nahê, rabe, min jî bi xwe re bibe û xwe jî xilas bike hêj nebûye roj, hêj Ereban li me nehesiyan. Heke Ereban çend vê deştê dê têkve bidin hema bigihijine me bi xwedê dê min jî bikujin dê te jî bikujin.

Rabûn her du mahînan sêwar bûn, mêrîkê tereqand, sipêdê mahînan anî li ber derê mala xwe. Pêya bû, rûnişte xwarê, jinik anî piştê perdê, li xwe mahr kir.

Heyamekê wisa man, rojekê ew mirovên ku bixwazin şûna wî re biçin û diziyên bikin mêvanên wî bûn. Mêrîkî ji wan dizan re got:

-Bavê min hilo qesta mala xwe bikin, dizî kareke pûç e.

Ji kurê xwe re got:

- Babo rabe! Van mirovan her yekê du pezan bideyê bila xêra day û bavên min bin, fisebîlah bila ji xwe re bibin bila destan ji diziyê bihêlin, dizî ye xirab e.

Ev meseleya xwe ya diziyê hemû ji her sê mirovan re got. Mêrîkî dema mesele ji wan re got ji jinika ya li pişt perdeyî ra pirsî:

- Mesele wiha ye an na, ev tiştên min vegotî li serê min û li serê te hatiye an na?

Jinikê got:

-Welehî camêro tu rastî dibêjî, wekî tu dibêjî, çawa dibêjî aha ye we bû.

Wextê jinikê we got, mêrîkî ji kurê xwe re got:

-Her yekê du pezan bidê da ku ji xwe re bibin û biçin. Mêrîkî pîr bûbû, gelek sal li ser wê bûyerê derbas bûbû. Yekê got:

- Welehî gotina vî sofîyî ye, her yekê ji me du pezan bila bibe, helalî bila bide me, em dê biben û qesta mala xwe bikin.

Yên din gotin:

-Hey mala te mîrato! Em ê li cihê zozanê hatine li vê derê ji bo du pezan, wilah me nevê, em qebûl nakin.

Mêrîkî got:

-Hûn nabin?

Gotin: na.

Got:

-Dê bila ez bo we bibêjim, meseleke din ya serê min hatî ez ê wê jî ji bo we bibêjim.

Mêrîkî dest pê kir got:

- Dîsa ez û du sê mirovên din em rabûn me qesta diziyê kir. Em çûne çîyayekê li me bû şev, çûne di şikeftê de, me ji xwe re agir hilkir em rûniştine xwarê û me got; em îşev li vê şikeftê bin. Sipêdê biçine li vê geliyê jêrî da ku di rê de ka kes nakevine li destê me, da ku em şelînin ji xwe re tiştan jê bistînin. Bû êvar, me hin dît yekî got; eyyww! Birreke pezî hat, ne serê birrê diyar e ne binê birrê, çûn di

şikeftê re, şikeft bi devî re pez bû. Berê xwe deynê kafîrekî yekçav kizwanek qûlipandiye, danandiye li ser milê xwe girro danande li ser agirî. Beziyê beranekî zexm anî danand li ser agirî, xirro derê şikeftê vebû. Me got; erê, xwedê serê me her siyan çû! Em her sê rûniştine xwarê, çû bisteke hesinî li pişt kefirî anî kire di nav pelên agirî re. Em her sê rêz bi rêz rûniştine, xwe dirêj kir bi demekê xweş me hin dît rast rabû xwe vekêşand. Me bal lêkirê bista xwe anî derê di tenişt hevalê me re kir ji rêxê din derket. Hevalê me li ser agirî kuzirand, cilkên wî pêkve sotin destavêtê kelexê wî xwar û xwe pê bejiyek jî nehêla. Bista xwe careke din kire di nav pelan re xwe dirêj kire li ber agirî, em her duyên din man. Ne rê li dest me dikeve ne jî em dikarin birevin. Berazekî mezin danaye li ber derê şikeftê nahêle em derkevin, em têda zêft bûn. Bêhneke din ma biska wî sor bû rabû kêlekê hevalê min yê din da. Ew jî dana li ser agirî, cilkên wî sotin, dest avêtê ew jî xwar. Bista xwe kire di bin kuçê re û kete li ser tenişt xwe, xwe dirêj kir. Min got; ya rebî çandin malê min yê dinyayê hebe ez digel xwe bibim, çandin malê xwe yê mala xwe bikim xêr bidim şûna wê, hema ez ji destê vî kafîrî rizgar bibim.

Dema min we got, bêhnekê ez mam min dît bista wî sor bû, min bal lê kire bista wî, min bista wî hilkêşa, xwe li ser çavekê dirêj kirîbû ji xwe jî tenê çavekê wî didît. Ez rast bûm min got ya pêxemberê Xwedê! Tu aşî li van divanan, ya rebê alemîn. Vê neqlê min dît kafîrî xwe hilda, min bist anî derê, min danende li ser xoxilka çavê wî, min xwe bi jorî ve li ser çavê wî, bist çû li çavê din derket. Min xwe avête li nav pezî. Rast rabû balekirî ma, çavêkê wî lê kor bû çavê din jî lê peqand. Bist anî derê min we kir çû paşîya kerrî got:

-Tu rawesteke, te ev e ji min çêkir qewlê min û te sipêde ye.

Nav pezî ra hat û çû, hat û çû... ayo ayoo ayoo... pez ho birr bir bû bir, pez ho diçû ez gel pezî ho çûm ho çûm. Gûşo kete li ser çavên xwe, be çav peqîn. Got:

- Rawesteke qewlê min û te sipêde ye.

Min jî gotê:

- Heta sibê xwedê kerîm e.

Ez rabûm min beriya xwe dayê nêriyek li nav pezî wî da, şûbetî conegayekê ye. Ez rabûm min nêrî xirro ser jê kir, taze min nêriyê xwe ji kevil kir. Dest û pê wî hemi min hêlane pê ve. Weyî dî kelexê wî min avête nîveka şikeftê. Ew kevilê wî min îrand ser xwe da girt dest avête sujnê û benka, pê wî pê wî xwe ve dirûn, kevilê

wî pêve dirû ber singêt xwe min pêve dirû, destêt xwe. Heta min we lê kir serkê wî kevilê min ser serê xwe dagirt. Ber singêt wî min pêve dirû, min zeft kir heta ez pê dest û pêt wî ez sekinîm, çengeka stûr aha ya weha ya pê ve, min çenga xwe hejand bo zirrêna çengê. Kivanê sipêdê lê da rabû. Dest avêtê ew beraz xirro ji şikeftê avête derê, der ji pezî re vekir. Lingekê xwe êk avête vî milî êk avête wî milî û got:

-Dê were yaro ma nê qewlê min û te tamam bû, tu vêca were ji destêt min qurtal be.

Got: iy Gedo.

Navê nêriyê wî Gedo bû. Min çenga xwe hejand û ez çûm, min serê xwe çemand bin lingêt wî ra, destê xwe bin zikê min ra bir, holê kir û holê kir willah ez ji destî derketim. Kêş kete pezî çî peza hat arame dikir, destê xwe teniştê ra bin ziki ra dibir da dernekevim. Wextê ez derkeftim, gavekê ew qul hate vekirin. Hindî pezek mayî ewî kitkîte berda, tamam pez derket berazê xwe qel da ser dere şikeftê çû şikeftê ve. Be şikeftê kes tê ra nîn e, çû ser kelexê nêriyî, derkete ji der ve ma sekini got:

- Iyy Gedê min.

Gava gotî Iyy Gedê min, min gotê:

-Gedo dibêjîte hevko dê't xwediyê şermê ev e Gedo ber pêt te.

Wextê min we gotiyê ma ma ma ji kir tîrîkk ji qehrada ji nîvekê da peqiya kete derê şikeftê. Ez hatim min şikeft sah kir, ez berê xwe dideme, paşiya şikeftê destecohniyek tê qutaye, wela ez çûm min bal lê kiriyê, min her ho lê kir ho lê kir destecohnî gele gende ye. Min he leqleqand min ho înande derê, berê xwe dideme keçikek ya tê ve. Ya zerbûyî zerbûyî xwe şibeta biha kelandî lê hatiye. Min gotê:

- Tu çî tiştî li vêrê ve.

Got:

- Wellehî ez jî bisilman im. Ez ji vî gundî jêrî, vî geliyê jêrî me. Rojekê vî kafirî ez girtibûm li wêrê, ez îna bûm, ez kirime vêrê de. Ez kirime ve şikeftê ve, ez kirî me vê kunê ve. Ev destecohniye kirîye li vêrê ra dê êvariya dê hêt tîla min mêjît mêjît heta kefek di devî wî diket, careka dî ew destecohnî derî quta. Da çît heta bû êvar, ne zad û ne tiştêk ev e deh roje ez dîl kirime li vêrê ve.

Min gotê: -derkeve.

Çingilê wê girt derêxist. Min ew keçik da gel xwe min înande mal gel wî pezî, hindî ew kerriya pezî min da gel xwe înande mal. Min ew keçik benê hêj keç bû hûrmetê, min ew jî li xwe mahr kir, min ew pez îna kire nav pezê xwe. Înande derê mala xwe hindî pezê min yê hey min kire xêr û xêrewat min da. Gote kêçikê:

-Ya we bû ya we nebû?

Keçikê ji pişt perdeye:

-Camêro tu ku dibêjî eynen we ye.

Gotê:

-Dê birayên ezîz, babo sipêhê rabe her yeke ji van çar pezan bidê fisebîlah bila bo xwe biben û biçin bila neçin malê diziyê heram e. Çimkî dizî çi nabîte bo mirovî, mirov kevîte belayên mezin.

Hindî du bûn qane bûn yê sêyê got:

- Welehî em bo çar pezan ji cihê evraz nehatine, bo diziyê hatine, Xwedê me nevêt.

Gotê:

-Meseleka dî ji ser min ve hatiye ez wê jî bêjim êdî hûn kêyfa xwe ne. Malê hecê kete destê min, malekê stûr bû. Min parên xwe yên hecê lêk dan, min got ez dê çime hecê. Em hecî vêk ketin gemiye sûwar bûn. Gemî nav behre ket, ez çûm. Çi şevêkê çi du roja çi çar roja em ketine ser behrê. Rojekê bayek hat gemiye da, gemiya me xerg kir, çava gemî xerg bû, em hecî pêkve xerg bûne behrê. Îrada Reb'l alemîn depekê darê kete bin sînga min. Hema min xwe avête li ser depî ez depî sûwar bûm. Min lingêt xwe depî derînan. Hewayê behrê dê lê bidet, min hin dît em ho ve birin, min jî nizanî hema ez mame depê xwe ve min zeft kir û ez mame ser depî.

Dizê sêyem dawiyê kefte di nav axiftina wi da û got:

-Dê bes e. Her yekî ji me pênc pezan bidê. Em ne diziya te dê bikin û ne jî guhdariya meseleyên te yên xilas nabin dê bikin.

Herkes gehişte daxwaziya xwe. Spas bo guhdarên ezîz.

(Bêjer: Hüseyin Armut)

2.1.1.13. Xaîn û Faîn

(Di wê çîrokê de du heb jin tîn pêşiya me. Yek pîrejin e. Pîrejin li Faîn xwedî derdikeve. Wekî rola dayîkê hilgirtiyê ser xwe. Di nava hemû tuneyî de jî çî ji destî têt dike ku kurikî memnûn biketin. Lê kêmasiyan jî hal û ehwalên der doran û bajarî jî agahdar e.

Jina din jî keça Paşayî ye. Di wê çîrokê de jî keça paşayî bêpîrs, bê fikr li gel yekî tê zewicandin. Lê yê ku pê re dizewicînin vê carê ne kesek kal e. Ser van hemûyan de jî wekî gelek çîrokên din yê pê re dizewice cudatiya xwe ve (aqil) wê heq dike. Lehengê me yê vir jî wê sax dike û bo xwe dibe. Ne tenê wê, mal û milk û derfetên paşatiya bavê wê didetê ew hemû jî bo wî dimînin.

Kesê xirab yê çîrokê de ev car mêrik e û ew jî digehe heqê xwe).

Dibêjin rojekê, navê êkê Xaîn bû navê êkê Faîn bû. Di nava bajêr digeriyan, rabûn bilî boyeçitiyê çî kare wan nebû, Faîn got:

-Xaîn!

-Keremke Faîn.

-Em dê çine bajarê Mexzebûnê, şola wi bajêri zêde heye. Em dê bo xwe pê şol ken, em dê pêve zengîn bibin. Tu nanê bara xwe dagire ez jî dê bara xwe dagirim.

Ew nanî bara xwe bir ewî jî bara xwe birin. Rê da çûn bû şev xwe avêtine şikeftê, rê da çûn nanê xwe xwarin. Faîn got:

- Xaîn, tu nani bîne her du nana bike navê da. Her çî me xwar yê mayî em dê raken bo şevêk dî. Du rojan paşê em dê gehine bajarê Mexzebûnê.

- Na wele em dê yê te xwen bila yê min bo sibê bît.

Nanê Faîn xwarin. Xaîn yê xwe neda, danande ber rexê xwe. Wê şevê nanê xwe xwarin, hin dîtin rûviyek û gurgêk û hirçêk hatine şikeftê ve. Şikefteke kûr e. Êvarê wextê razan, berê xwe danê her sê derî da hatin.

Gotin: -Hûn zanin mîrê Mexzebûnê bo çî wiha desteng e?

-Bo çî heval?

-Mamê hirç heke fahm kiriban, serê bajêr kolaban, dê av hatiba, dê cih bûba.

-Dado hirç te çî guh lê bûye, got;

-Min jî guh lê bûye dibêjin binê bajêr bikolin dê xizîne derkevît, dê çî tiştê xwezîn dê bajêr hebîtin dê bajêr mezin bîtin.

- Be mam rûvî te çî guh lê bûye?

- Ez lê simsimîm, guhê min lê bûy, kiça paşayî ya dîn bûyî, rûs tavêne odekê da nahêlin kes biçîtin. Ha min zanî fahm kiriban pezekê reş bênişan ser jê kiriban, xwîna wî kiribana satilekê. Ew satil biriban der vekiriban ji nişka ve ji çavan de kiriban dê ciniqît, dê çê bît.

Xaîn û Faîn gotin: -Ev e sê!

Rabûn sipêdê hişyar bûn çûne hindav wê avê, gotin:

- Benê çi hirç û rûvî vêrê nîn in.

Demek kî ev fikre yê bo xwe rakir. Xaîn jê veqetiya, Faîn birsî hate bajêr, hate dev pîrkekê gotê:

-Pîrê hinde avê bide min.

- Pîrê gorî te bajêr xirab kiro, ma çi av têda heye.

Rabû kikaçîl muçkê da, muçîk hestkê da, hestîk taskê da, kire şeqleşoq îna dayê.

- Ev av e nexweş e.

- Dawo av nîn e. Min binê amanan ya daye te.

- Dayê çi heye bajêri?

-Dawo bajêr desteng e, bajêr bêav e, kiça paşayê Mexzebûnê jî we dîn bûyî odekê da hekîm dest nakenê.

- Dayê heke ez kiça paşayî sax kem dê çi dene min?

- Paşa dibêjît her kê kiça min sax ket, ez dê kiça xwe deme mîratê xwe jî deme.

Rabûn du qasid rêkirin çûn gotine paşayî. Paşa got:

-Herin gel biaxivin, paşê gel min biaxivin ka çi kes e mala pîrê?

Çûn gotinê got:

- Ez ê sax kim.

Rabûn çûn nik paşayî, gotin:

- Rast e, gencek li wêrê dibêjît ez ê kiça paşayî sax kim.

- Herin bêjine wî bila bête vêrê.

Rabû hate dev karşi hizûra oda wî da sekini gotê:

- Tu çi yî, şêxatiya te heye, melatiya te heye?

-Nexê hema yê li fikra min daye ez ê sax kem, belê bes divê tu bo min pezekê reş û bênişan bînî ez ê sax kem.

Rabûn bal li xulama kir, rabûn pezekê reşê bînîşan ser jê kirin. Xwîn kirine taskekê, got:

- Bila wezîrê te yê rasti û wezîrê te yê çepê li gel min bîn.

Her du qurmayêt paşayî gel çûn derê odê vekirin, ku der piçekê vekirin xwîn avêtê. Xwîn nav çavan da kir, kiçikê got:

-Ay hawar!

Rabû cil kirine ber xwe, wezîrê paşayî rabûn çûn gotinê:

- Mîrim, kiça te sax bû, dibêjît ka bo min cila bînin.

- Herin wî bînine vêrê.

Înandin, gotê:

- Ev hukme te ji kî girt?

- Min aqlê xwe girt.

- Ew wezîrê yê milê te yê rastî wezîrê te ye.

Paşatiya xwe dayê, nav bajêr geriya hat û çû. Faîn hat û çû, dît ku Xaîn yê koşê çarşiyê şîşka tejmît, ya duya sêya firoşît an nafiroşît. Xaîn Faîn dît got;

-Faîn!

Be Faîn bûye mîrî mexzebûnê, Xaîn gotê:

-Kuro te ev aqle ji ku ve girtiye?

-Min ev aqle şikeftê girtiye!

-Min da û xwidanên şîşka gawo, ez ê pê şîşkan ku zengîn bim, ez jî da biçime şikeftê bo xwe aqlî bigirim.

Rabû çû şikeftê, her yê tirsît, her yê xew diçît. Wextê şevê pê da çû, hirç û rovî û gurg hatine şikeftê. Ewî jî xwe jor ve kêşand, da bo xwe aqilekê bigirît.

- Dê rûnin, dado hirçê te çi gulê bûye?

-Binê bajêrî kolayne xizîne derxistîne, bajêrî mezin diken.

- Mamê gurg te çi guh lê bûye?

-Ava serê bajêrî derxistîne, hipêne ava têt bajêrî.

- Be mamê rûvî tu ho simsimi te çi guh lê bûye?

-Ya min guh lê bûyî jî, kiça paşa sax kirine ewa dayîne şû jî.

Gotinê:

-Mamê rûvî rabe simsimok tu dê bînî!

Be rûvî ye, simsimi simsimi çû goşe, ragirt kêşa got:

- Min dît!

Xaînê min wê derê şexopîlo kir, şîva xwe xwar vêca çûne nav gundî. Faîn ma paşatiya xwe ve nav bajar geriya. Kiça paşayî bo xwe mahr kir, paşatî bo xwe stand, wezîrên paşayî bûn wezîrê wî yê rastî, bû wezîrê wî yê çepê.

Vêca insanê xaîn ne çi caran têr dixwet, ne jî riya rastî çi caran tê pêşika wî!

(Bêjer: Kenan Çiftçi)

2.1.1.14. Keça Mîrî

(Di wêjeya kurdan de ya devkî û ya niviskî de jî gelek çîrok li ser mîran hatine gotin û nivîsîn. Di van çîroka de mirov êş û janê, jiyane (Jîn), jiyana rojane, şer, jin, evîn û hwd her mijaran dibîne.

Dema mirov çîrokekê diwxîne yan jî û guh dide, wê demê çanda wê civakê jî nas dike. Mîr û mîratî li her alî xwe dide ber çav. Lê ya pêwîst ew e ku di wê çîroka me peyda kirî de tiştek cûda heye. Ew jî bala mirovî dikêşîne. Mînak di vê çîrokê de cara yekeme ku keçek dibe mîr. Bi serê xwe, eqilê xwe û karê xwe, keda xwe ve dibe mîr.

Ev jî nîşanî mirov dide ku dema mirovî îradeyeke bêhempa nîşa dabe jin be yan jî mîr be, ciwan be yan jî kal be dawxaziyên xwe bi cih diîne. Di vê çîrokê de jî keça mîr li hemberî hemû zordariyan jî ser dikeve. Bavê wê jî vê rewşê dibîne û keça diîne cihe xwe û bi keça xwe re serfiraz dibe.

Di wê çîrokê de sê jin tên dîtîn. Jin û qîza mîrî û xesûya keçikê. Jin û keça mîrî serakirîn e, xudanên qesên xwe ne. Keç daxwaziyên xwe bêtirs tîne ziman. Dayîka wê jî piştgiriye didetê. Keçik bi hers û aqildariya xwe li rastê bav, mîr û civakê hemûyê dide. Xesûya wê jî ne kesek xirab e bo bûka xwe. Belkî jî rewşa mala wê, hal û ehwalên wê ew qewet jê wergirtibe. Lê dinêre ku bûk bo her tiştf wan pêş ve dibe rola xesûyek baş tê pêş me).

Mîrekî keçek hebû. Gelek kesan ew ji xwe re xwastibûn. Lê belê wê keçê kesên ku hatin û ew ji xwe re dixwast rûyê wan temaşe dikir û digot:

-Ez bi te re nazewicim.

Di navberê de gelek wext derbas bibû. Cihê ku mîrî hikumdariya xwe lê dikir jin û mêrekî kal hebûn. Wan tenê kerek hebû û ew gelek xizan bûn. Her roj ev pîremêr diçû daristanê, dar li kerê xwe bar dikir û anî koşka mîrî. Li hemberê vi karî her roj mîrî dîrhemek dida wî. Wan jî bi vê dîrhemê tenê rojeke xwe derbas dikirin. Wan debara xwe bi vî rewşê derbas dikir.

Carek din demek dirêj derbas bibû di nav jiyana wan mirovan de û hatibû zanîn ku wan jin û mêrên kal lawikek heye. Heft saliya xwe û pêve digel bavê xwe ew jî diçû daristanê û dar kom dikirin. Ew î jî ji aliyê xwe ve alîkarî dida debara malbata xwe.

Jina mîrî pê hesiyabû ku darên pîremêr û kûrê xwe diîne ji darên berê lawtir in, baştir in. Ewê jî biryar da û li hemberî vî karî ji wan re 1.5 dîrhem bide. Û ji pîremêrî re pirs kir.

-Çima darên niha hûn diênin ji yê berê baştir in?

Pîremêrî jî got:

-Ez berê bi tenê serê xwe bûm. Min tenê ev kar dikir. Lê niha lawê min mezin bu û alîkarî dide min.

Dema ku pîremêrî ev behs ji jinêkê re dikir keça wê jî ew guhtar dikir. Jina mîrî ji pîremêr re dibêje dema ku sibê tê bila kurê xwe jî bi xwe biîne û ew jî wî bibîne. Pîremêr dibêje:

-Kurê min nikare bê. Çunkî ew bê libas e. Cil û bergên wî ne law in. Kevn in û bi vê rewşê dernakeve ber we. Dibêje:

-Bi vî halî dê ew çawa bê koşka mîrî. Ew dê şerm bike. Pîremêr wiha bersiva xwe dide.

Dema dibe şev pîremêr diçe mal û tiştên jina mîrî jê re gotî dibêje kurê xwe. Kurê wî jî wek tiştên ku bavê wî gotine jina mîrî dûbare dike. Û bi înat dibêje ku, ez nayê. Bi vî gotina wî bavê wî dibêje, heger ku ew bi wî re neçe ew wan daran neşên bifiroşin, ew dê bimînin bê perê û ew dê bimînin birsî. Piştê van gotinan xurt biryar dide ku bi bavê xwe re biçe.

Roja din di nêzikî wextê êvar de kerê xwe dibin daristanê û darên komkirî lê bar dikin. Pişt re rêya koşka mîrî digirin. Jina mîrî ji bo na daran 1.5 dîrhem, ji bo na lawî jî ku libas bistîne 5 dîrhem dide pîremêr. Qîza mîr wan temaşe dike û ji pencerê da bang diya xwe dike:

-Dayê, perê wan ez ê bidim.

Diya wê jî dibêje:

-Qîza min ma çi ferq e; ha te dayî, ha min?

Qîza wê:

-Na, ez ê perê bidim ji bo cil û bergên wî.

Qîza wê bi vê gotina xwe rik digre. Diya wê jî:

-Bila qîza min tu bide, dibêje û di heman wextê de bihêrs lêva xwe leq dide.

Sal bo salê kal û kurê xwe vî karê dikin. Rojekê dema pîremêr barê kerê xwe danande xarê keça mîr nêzik dibe û jê re dibêje:

-Bisekine! Tu sibê naçî daristanê û tê bê min ji kûrê xwe re bixwazî.

Dema pîremêr van qesên ku di devê keçikê de derdikevin guhdar dike, hevsarê kerê wî ji destê wî dikeve, dilerize û berdide giriyê.

Pîremêr ji keça mîrî re dibêje:

-Tu dê min ji nanê min bikî; serê min, jina min û kurê min jêbikî. Ma em ew kesin ku qîza mîrî bixwazin, em layiqê mîrî nîn in. Çima tu vê xirabiyê me dikî?

Keça mîr:

-Ez dibêjime te dirêj neke. Here û sibê were min bixwaze. Heke tu nehatî ezê ferman bidim ku serê te jêbikin.

Pîremêr dibeze. Bi şaşitiya xwe piyekê xwe li ser rê yê din jî di bin rê dide û digehe mala xwe. Dema digehe mala xwe jina wî pirs dike:

Bo çi te ewqas xwê daye? Bo çi digirî?

Pîremêr tiştê ku serê qewîmî ji wê re dibêje:

-Rewşa me nebaş e, em xizan in, em layiqê mala mîr û keça wî nîn in. Em dê bi xwastina wê keçê ve di nava cîvakê de kepaze bibin. Dê bi mê re bikenin. Em birevin jî em xilas nabin û serê me dê bê jêkirin.

Serê sibê dibînin ku ew bê çare ne, rêya koşka mîrî digirin. Digehin koşkê, û dîvanê dirûnin. Dema ku bi mîrî re dimînin tenê mîr pirsê wan dike:

-Xêr hatin, derdê we çi ye? Hûn çi daxwaz dikin?

Pîremêr dibêje:

-Bi xêr be mîrî min, em hatine ku keça te bixwazin.

Mîr dengeke bilind li wan qîrî dike.

-Hûn kî nin ku keça min dixwazin.

Mîr gazî celadên xwe dike û dibêje, wan biben serê wan jê bikin.

Dema ku celad wan dêbet jina mîrî wan dibîne û pirs ji mîrî dike:

-Ma te pirs ji qîza me kiriye ku tu serê van mirovan jê dikî? Ma tu nebûyî ku te soz dabû keça xwe. Tu wê nadeye kesî ku ew jê hez neke.

Mîr dibêje:

-Rast e, min ew soz dabû.

Mîr gazî keça xwe dike û vê mijarê jê pirs dike. Keçik jî bavê xwe re bersiv dide:

-Heke kesek hebe ku bê serjêkirin ew jî ez im. Ji ber ku min ji wan xwest ku bîn min bixwazin.

Li gorî vê bersivê mîr soza xwe bi cih înanî û keça xwe da kurê pîrî. Lê belê hinek daxwazyên wî jî hebûn û wiha rêz kirin:

-Çu kes divê nizane min keça xwe daye we, davetê nakim. Ez mîr im û devereke pir mezin tîm nasîn. Divê kes nizane min keça xwe daye maleke xizan. Yê ku pê bihesin dê bi me re bikenin. Qîza min tenê bi libasê berkirî ve dê bê û tenê çîta serê xwe ve.

Pîremêr keçe dibe û rêya mala xwe digire. Dema di rê de diçûn jin û mîr di navbera xwe de diaxiftin:

Mala me de cihê razanê nîn e, nivîn nîn in, em dê çi bikin? Ay Xweda ev çi bû bi serê me hatî?

Dema gehîştine mala xwe keça mîrî çîta serê xwe jêkir û da hevserê xwe. Ji wî re got:

-Wê bibe sûkê û bifiroşe.

Çîta wê bi armîşî ve hatibû avkirin.

Keçik ji hevserê xwe re dibêje:

-Ev çît bi qasî 15 dîrhem e. Bi 5 dîrhemê ve rûdoşek û rûlihef, 5 dîrhemê ve jî patê bi armîşî ve hatiye avkirin, 5 dîrhemê ve jî tiştên xwarinê bikire.

Xurt wekî gotinên wê dike û wî karî her roj dubare dike. Bi vî halî demeke dirêj debara xwe devam dikin. Xwudanê dikana ku çîten keça mîr lê dihate firotin mîrê wê re dibêje ku wî kâr kiriye û dixwaze bihayê wi zêde bike. Bi vê gotina xwe ve 5 dîrhem zêde dike. Ew jî vê 5 dîrhemê ji herkesan vedişêre û kom dike. Keça mîr jî çêkirina çîten xwe zêde dike. Dema destpêkirî yek çêdikir lê belê niha rojê dehan çêdike. Piştî du salan pereyekî berkeftî kom dikin û ew mala feqîr, xizan û dewlemend dibin. Bi vî perêyî ve li rastê koşka mîrî ew jî koşka xwe çêdikin. Dema mîr dibîne koşkek li rastî ya wî tê çêkirin jina xwe re pirs dike:

-Xwudanê vê koşkê, vê qesrê gelo kî ye?

Jina wî dibêje:

-Min bihîstiyê ku ew ya zavayê mîrekî ye.

Mîr dibêje:

-Ji min re behsa keça min û zavayê min neke. Heke ez dê serê te bidim celadan.

Zavayê wi çêkirina koşka xwe xilas dike û mala xwe dibe wira. Jina wî jî piştê bar kirin koşka xwe xizmetkarên xwe rê dike koşka bavê xwe. Malbata xwe gazî dike mala xwe ji bo şîvê. Mîr û jîna xwe vê daxwaza keça xwe qebûl dikin û diçin mala wê. Mîr şaş dibe. Keça wan dewlemend bûye, qesr avakiriye, xizmetkar hene. Keça wan dixwaze ew şev jî bimînin mala wê. Ew vê daxwaziyê jî qebul dikin. Hêj mîr nerazayîbû difikirî, ka vî çawa, çi rewşê keça xwe kiribû bûk, çawa rê kiribû mala hevserê wê, libasên ber wê, çîta serê wê û hwd.

Wê demê bi tenê serê xwe bi xwe re axivî:

-Ew xizan bûn, çi tiştên wan nebûn. Min fikiriya bû ku ew layiqê min nebûn. Rewşa min gelek baştir bû. Lê belê ez niha dibînim ku keça min û zavayê min jêhatî ne, berkeftî ne. Aqilê xwe bikar anîne, bazirganiya xwe ji min çêtir kirine û ew dewlemend bûne.

Mîr bi van hizra ve xew diçe. Sibê dema hişyar dibe bang li keça xwe dike û dibêje wî mîratiya xwe daye keça xwe. Ew dê vê biryara xwe jî li hemû deverê îlan bike. Destê jina xwe digire û dikeve rêya mala xwe.

(Bêjer: Hüsnu Kazak)

2.1.1.15. Bersêl Beg û Ehmedê Milî

(Di wê çîrokê de em jinên bêsuval û bêcab yê ten bindestkirin, zewicandin û kuştin dibînin. Her sê jinên axayî bi xwe di wê zewacê de hewî ne û nayê zanîn ka çi rewşê de ne. Li gel vê jî mêrek din tê wan li xwe mahr dike û zelumê wan yê pêşiyê tê wan dikuje. Tenê wek trajedî bê navkirin baş e!

Jina dawiyê ya axayî bona xwe îrandî tê ber çavên me. Ji bo civanî û delaliya wê şer hatiye kirin, zewaca li gel pîremêrekê lê hatiye ferzkirin. Dawiyê çiqas ew jî timam tiştê rast nebe jî digehe axayê Mîliyan Ehmedî. Ya ku axayî dibe şerî ji bona wê jinkê belkî ne tenê delalî û civaniya wê be. Belkî nerazîbûna zewaca wê ya li gel pîremêrî jî be. Lê bes eynî axayî (Ehmed) xwe jî sê jin hebûn).

Ehmed Axayê Milî hebû. Mezinê Mila bû. Sê jinên wi hebûn, xulam û xidamên wi hebûn. Êkê digotinê Bersêl Beg. Hema yê piştî sêlê bû, nan ji jinikan hilgirt û werdigêrand, li ser sêlê nan dipat.

Roj hat dewleta Tirkan gote Ehmed Axayî divê biçîte eskeriyê. Hingê eskerî gelek sal bûn. Ehmed Axa birine eskeriyê. Beyzadeyek wî jî hebû, ew jî digotinê Ehmed. Wela birine eskeriyê hindî salekê duyan ma Bersêl Beg rabû got:

-Ez mezinê Mila me.

Ew ê piştî sêlê rabûyî ho kir. Digot; manê Ehmed Axa çû, ka ku lê hat, nehate ve, aha ez ve me, ez mezin im.

Dê êre ve wê ve rabû xwe kire mezin. Rabû her sê jinên wi mahr kirin. Ma li ser malê, bû axa.

Beyzadeyê Ehmedê Milî rabû çû, geriya geriya geriya çû heta Adiyemanê. Ehmed Axa yê li wê rê û eskeriya xwe diket. Dê êre ve wê ve gotê:

-Te xêr e?

Gotê:

-Wela ez ê hema hatime sera te axayê min. Ez yê ji te xerîb bûm.

- We nîn e! Tu dê bêjî.

- Belê wela.

-Na.

-Be dê were axayê min. Bersêl Begê xulamê te yê şûna te bûye axa, axayê Milî. Her sê jinên te jî yê li xwe mahr kirî.

-Hey ne ne.

-Belê.

Rabûn ev û beyzadeye xwe gehîştine yêk û hatin. Hatine şehrekê çî bibînin. Çi êre ve çî wê ve her çar milan şer e li wi gundi. Dê êre ve, dê bi wê ve keçeke can ya heyî, dê bidene yekî pîremêr. Wê naken vêca bi şer in. Ehmed Axa jî bi beyzadeyê xwe ve hate nav şeri. Wî jî şer kir û keç bo xwe jê stand. Cihûyek jî ji wê ve hat û ev jî kuşt. Mirtalên wî dane beyzadê xwe. Hatin lê her cihên cuda yên dikevîne şeran. Ehmed Axayî her digot:

-Ax kula Bersêl Begî, ax kula Bersêl Begî!

Ha dûr ha nêzîk wela gehîştine gundê xwe. Berê xwe dayê Ehmed Axa wela Bersêl Beg axayê Mila ye û her sê jin jî jinên wi ne. Pêşiyê çû Bersêl Beg wekî berê deynande pişta sêlê û ew kuşt. Paşê çû her sê jin jî kuştin.

Jina din kire jina mala xwe. Li gel beyzadeyê xwe mane gelêk. Car din çû eskeriya xwe timam kir û hate ve. Heta dawiyê li devera xwe axatiya xwe li gel jina xwe û beyzadê xwe dewam kir.

(Bêjer: Emine Adıyaman)

2.1.1.16. Bêaqilî

(Em di wê çîrokê de jinên cuda cuda dibînin. Xesû û bûka bêaqil, jinika nezan ya mêr xwe jê zanatir dibîne, jina bêmerifet û sivik ya bi mêrê xwe û jiyana li gel wî nerazî ya dawiyê jî jina cotyarî ya saf. Her çiqas di çîrokê de em li ser jinan bisekinin jî lê li vir de mêrik jî wekî wan in. Tenê kurikê pêşiya çîrokê mezin dibe û her tiştî li serî wan hemûyan diîne. Çiqas mêr di jinên xwe re xeberan bêjin, qisên nexweş bêjin, her tiştî li wan bikin jî em dibînin ku jin car din li gel wan in û bêdeng in. Lê tenê jinika bo demek kin li gel wî dizewice mêr û jiyana xwe ya berê nerazî ye. Ew jî mixabin ji bo xweş û kêfa mêrikî bikar hatiye).

Jinikekê bûkek hebû. Bûk siharê zû rabû mala xwe lêk da. Şûnde çû ser kaniyê. Rexên kaniye kulîlk bûn. Bûk rabû xwe vequta, hilquta, daquta. Xesû hat û gotê:

-Te xêr e?

-Min dê kurek hebît, dê êt wê kulilkê jê veketin, dê kevîte kaniyê de û dê xeniqît.

Go xesûyê jî xwe hilquta, daquta û vequta. Go xwezûr jî ma hiviyê ev e nehatin çû dev wan. Go ev tişt gotine wî jî. Wî jî şîbî wan xwe hilquta, daquta û vequta.

Kurê wan yê mezin û zelamê bûkê jî çû, ma eynî halî de. Go bû şîn û girî. Go kurek piçûk jî hebû. Çû gotê:

-Ev e çi hal e? We xêr e?

-Hal û ehwal ev e ye.

Go kurik çû çiçek hemî jê vekirin. Hilkêşan û gote wan:

-Xwedê ez li vê malê navegerim. Heta ez ji he we bêaqiltir nebînim.

Kurik çû tena serê xwe çû li dinyayê geriya. Çû şûnwarekê cerikek dît. Hilgirt û çû gundekê. Go:

-Xwîşkê xwedê ez gelek birsîme.

-Xwedê mêrkê min ne li malêye.

Cerikê xwe înande derê. Wê jî gotê:

-Ew çi ye?

-Ev dûrbîne ye, tişteş baş e.

-Hoo, wela mêrkê min jî gotibû dûrbînekê bo min bikire. Çendê ye?

-Bîst mecîdiya ye.

-Giran e. Me nozdeh yên heyîn. Dê çim mala cîranan yekî qer bikim.

-Na, bo xatira te bila nozdeh bît.

Nozdeh zêrên xwe hejmartin û kurik çû. Zêlamê wê hat û wê gotê:

-Min bo te dûrbîneyek ya kirî. Ha.

-Be kanê dûrbîne? Ma dûrbîne ji ho ne hey tu ji kerî bûyî. Be ka mêrik ji ku ve çû?

-Wela ez nizanim. Aha li ho ve çû.

Go mêrik mahîna xwe suwar bû û kete şûpêya wî. Go mêrik ho berê xwe didetê mêrik yê wekî bayî ketiye dûv û tê. Gotê:

-Te kes nedîtiye?

-Na. Ma tu dê hoke gehiyê.

-Be ku dê gehimê?

Hima got: yek û du, yek û du, ma tu dê vêra gehiyê?

-Bedê ka mahîna min bigre.

Mêrik mahîna wî hilgirt û lê suwar bû çû. Mahîn jî bir.

Mêrki gotê: Tu bûyî û tu heqî jî.

Çû mal gotê:

- Hîrmet wêkî dibêjin xweşmêr xweşmêran nasdiken.

-Çi bû, çi ne bû?

-Hima hişe mahîn jî bir, zêr jî birin çû.

Mêrik çû berê xwe didetê jinikekê dibînît. Berê jinik sil dibûn. Dibêtê:

-Te xêr e?

Behsê mêrê xwe dike, ka çawa ye û bo çi pêk naken. Mêrik jî dibêjîtê:

-Be dê gel min were. Ez bime mêrê te û tu jî bibe jina min.

Navê wê Eyşo bûye. Dibêt:

-Wela çi şolê wî nîn e.

Li gel mêrikî dide û diçe. Diçin dibine mêvanên malekê. Şîvê bo tînin. Jinik dibêje:

-Wela zêlamê min asîdê naxwet.

Wan jî şîva xwe xwar. Bû wextê razanê mêrik dibêjîte jina xwe:

-Xanim te bo çi got zêlamê min asîdê naxwetin. Paşê min jî şerm kir bixwim.

-Camêro wela min jî devê xwe sot, min we got.

-Benê ez beecîm bo wê asîdê.

-Benê ez dê biçim bo te hinekê înim ya mayî.

Jinik çû ku dê asîdê bînîtin. Lapê xwe tê hîlînand, li wan deran geriya çî tişt nedît ku biketê. Hema kire lapêt xwe.

Mêrikê malê got ka dê mêvanên wan biçine destenivêjê, rabû bo wan dê çirayê berdetê. Jinikê jî destên xwe veweşandin. Ma bo çî çipkek naçîtin devê xudanê malê da. Gotê:

-Xwedê, gê mêvanê me şîrîn e.

Mêrik rabû jina xwe aciz bû ku ev tiştê înande serê wan. Xatir xwestin û çûn. Çûn wextekî keyfa xwe jinikê kir û mahîna xwe suwar bû û gote jinikê:

-Here tu ku ve dîçî, tu bo xwe ez bo xwe.

Çû berê xwe didetê cotyarek yê cotê xwe diketin. Du gayet law yên ber coti. Cotyar jî berê xwe didetê mahîn çî mahîn e. Ya li gel bayî diçîtin. Gotê:

-Ez wê mahîna xwe difiroşim.

-Çendê?

-Çi kesê têr nîskê bidete min, ez dê demê.

-Be tu dê li êre sekîni heta ku ez biçim mal bo te nîskê bideme çêkirin û tîm?

-Erê, ez dê du roj din xwe nîskê bigirim.

Wela ew ku çû malê mêrikê me her du ga ji ber nîreyî vekirin û dane pêşiya mahîne û çû.

Cotyar çû mal gotê:

-Hîrmet hilo. Mahînek ho ho ya hatî, mîrkî hema got kê nîskê bidene min bo wa ye.

Jinik rabû nîska li mal înan. Ew piçek dît. Çû mala bavê xwe hindek din înan. Nîska xwe înan dana ser kuçki. Çêkir û kire cerî. Mêrikî hêj da neçûyî gotê:

-Hîrmet ka were heta nîska me çêdibe, em biçin hafirkê mahîne bo çêbikin.

Çûn hafirê mahîne çêbikin. Çêkirin û mêrikî serê xwe kire hafirî de gotê:

-Ka pişt min re here. Kanê dê pê min gehîte te yan ne. Belkî mahîn ye pêavêj bît.

Jinik ye bihal bû. Mêrikî serê xwe kire hafirkê de û jinik hate pişt. Wî pêhnek lê da. Xwe serê dilê jinikê da. Jinik êk neqil kefte wêrê. Mêrikî got:

-Wela min jina xwe kuşt da qet çi ne biçim, da mahîn jî neçît.

Nîska xwe kire cerî û têkire parzunî da ku kefte rê. Jina wî jî ser xwe ve hatibû. Jinê gotê:

-Tu çûyî?

-Erê.

-Nihê sibahî nîsik nivî yên me ne nivî yên mala babê min in. Ew mahîn jî ye bi nivî nivî ye.

Mêrik ewqas qehirî bû da çemît û qirşekê raketin û bêjîtê -Mala babê te wî qirşikî jî nabet- ma bo çi cerikê nîskê pê da nebû. Serî heta binî bû nîsk û revî. Çû got:

-Bigehimê kanê ku li mahîne û mêrikî hat.

Çû berê xwe dayê du qiran yên dadane ser nîrên ga. Dema nêzîk bû qiran jî pirdan û çûn. Wela zivîrî hat û got:

-Hîrmet min ho li te kir. Ev e jî hate serê min. Xwedê gayên me jî bûne du qir û ew jî çûn.

Mêrikê me zerên xwe, mahîna xwe, kêfa xwe li jinikê jî înanî, her du gayên xwe jî birin û çû mala xwe. Dema hatiye mala xwe gote yên malê:

-Wela yên he we kertir jî yên heyî.

(Bêjer: Ebubekir Öztunç)

2.1.1.17. Hacîreşk

(Di wê çîrokê de jineke wêrek çawa xwe û hemî milletê xwe hin cûre zindiyên xelas dike tê dîtîn. Rastî mimkin e ku bitirse jî. Lê dinêre ku çî xelasbûn û başbûna wê û biçûkê wê nîn e. Dema hal wisa be ew jî xwe feda dike ji bo kurê xwe. Lê ev tiştê wê kirî tenê wan her duyan xelas nake, tim milletê wê herême têxe bin bandora xwe. Bi saya wê jinika wêrek millet jî radibe ser piyan û berxwedana xwe dike. Ew tirsê mêj da bona wan çêbûyî li ser xwe diavêjin û şer dikin. Dawiyê jî xwe û hêrêma xwe ji wan dijminan azad dikin).

Ev çîrok herêma Colemêrgê, Gundê Dizê û Zozanên Kanîkilê derbas dibe.

Dibêjin wextî de hacîreşk hebûne. Dema behsê hacîreşkan dikin mehlûqatek mirovxwer bûye, xwînxwar bûye û ketine geliyên Colemêrgê û yên Kurdistanê. Çî tiştî zindî yê peşiya wan ketibe hemî qetil kirine, hemî xwarine. Ev e jî nîşa dide ku ev mehlûqet ji van mirovên vî cihê cudatir bûne.

Demekê şahê cihê tê zozanên Kanîkilê û li vê derê li ser kevîrekî mezin, latekî mezin qîr dike. Dibêje ku:

-Dê kî biwêre vê çaxê biçê nav gundi û xwîna hacîreşkekê û ew gustîlkên wan yên bi nav û deng ji destê wan derbixe û bîne.

Kesekê deng dernakeve. Bes jinikek nûka zayî derdikeve û qîr dike. Dibêje:

-Riha min e û riha biçûkê min e. Ez dê xwe li berdim û biçim geliyan, dê biçime Gundê Dizê, xwîna wî hacîreşkî dê bînim û gustîlka wan ya bi nav û deng jî bi xwe re dê ser êxim. Dê înim.

Jinik diçe, diçe geliyan, diçe Gundê Dizê. Lê dinêre ku ji dûr ve du hacîreşk bi hev re diaxivin û rêkê de tên. Jinik demekê disekine û xwe li cihekê vedişêre. Lê dinêre ku hacîreşkek bo hacîreşkê din tişteke dibêje. Dibêje:

-Bêhna mirovekê li van deran tê.

Hacîreşkê din qebûl nake. Dibêje:

-Na, tu wisa dikî ku tu min bixapînî, min lehbînî. Çî bêhna mirovan li van deran nayê.

Ev e pê re diçe û şer dike. Hacîreşkek hacîreşkê din dikuje û dihêle wî cihê. Rêya xwe digire û diçe.

Jinik jî ferzenda xwe dibîne diçe ser termê hacîreşkî. Lê dinêre ku ne ku wekî wan e. Çawa dibêjin eynen wisa ye. Ji wan cudatir, bejin kurt ne, bejin bilind ne; çav

zîq ne, çav dirêj mehlûqek ji wan cudatir. Patê di destê xwe de xwîna hacîreşkî dide û gustîla hacîreşkî jî ji destî derdixe û destê xwe dike û ser dikeve. Lê dinêre ku çend hacîreşk wê dibînin û li dûv de tên. Ew jî ji wan xweştir bazdanekê dike û li ser wan çiya dikeve. Tê nêzikî zomê, hacîreşk dibînin hatiye zomê, agir li wê derê hatiye hilkirin hacîreşk zivirin û diçin. Bi tirsaxwe bin çî bin êdî nizanin.

Jinik tê patê bixwîn û gustîlka hacîreşkan nîşanê hemû kesan dide. Dibe nik şahê mezin. Şahê mezin jî bi gotina xwe ya pêşiyê rabû û gotibû:

-Her kî biçe xwîna hacîreşkekê û gustîla wî bîne çend cihê vî welatî ez dê bidim wî.

Wê gotina bicih tîne. Li wê derê diyariya xwe dide wê jinikê. Çend welatên wî cihî; Kanîkil, Dizê, geliyên Zê hemûyan dide wê jinikê. Jinik bêhnekê diçe ku piçûkê wê digire, heta diçin li keçikê dinerin, jinik ser xwe ve diçûyîye. Wekî kevirekê lê hatiye û miriye.

Piştî wê çaxê êdî bawer dikin ku hacîreşk ne kesên wisa ne ku nehêne kuştin. Bi lehengiya wê jinê insan û mirovên wê çaxê yê van geliyan bihêrs dikevin û bi hêrsek mezin ve diçin geliyên xwe û van hacîreşkan ji geliyên xwe derdixînin. Bi wêrana jinikê ve ev axên henê ji hacîreşkan xelas dibin.

(Bêjer: Kenan Çiftçi)

2.1.1.18. Gulbeyaz

(Em di jiyana Gulbeyazê de jineke çiqas bicesaret dibînin jî, jineke ewqas birijd tê pêş me. Ji ber ku li ser gotineke jintiyê radibe û ji bo zilamê xwe ku kurekî bidetê jinekê dixwaze. Ev bûyer ji bo hema hema tim jinan tiştêkî giran û bêmefer e. Tiştêk wiha ye ku ew wekî dîn tê dîtîn. Jineke kedkar e û zîrek e. Lê em di jiyana wê de vê jî dibînin ku; xwedîbûyîna zarokê kur bona civakê pir mûhîm tê dîtîn. Ew jî bona mîrasî ye. Ji rexê keçê ve tiştêk wiha nîn e. Li rastî hemû neyîniyan jî ya xwe dike û hewiyê li ser xwe tîne. Heta niha ev rewşê her tim ji jina yekemîn ya veşartî yan jî li hemberî wê dihate kirin. Lê di vir de jin bixwe dike li ber nerazîbûna malbat û hevserî ve jî.

Lehenga duyemîn hewî ye. Lê ev hewî wekî hewî ne, wekî keç tê qebûlkirin. Zarokên wê jî ne nevîsî ne, zarokên dayîka mezin in. Her du ne hewî ne, dê û keç in.

Lehenga dawiyê jî jintî ye û li vir kesa nebaş û temsîlkêra nêrîna civakê dike.

Em dibînin ku îredeya Gulbeyazê ne rastî jinan şer kiriye, rastî hemû civakê serî xwe rakiriye).

Li Colemêrgê jinikek hebû. Zêlamê wê çû Iraqê bazirganî dikir. Jinik gele ye zîrek û ye bedew bû. Xudana du keça bû.

Rabû pale berdane giyayê xwe. Jintiya wê tê û dibêjîtê:

-Her bike Gulê, her bike. Her manê bo biçûkên me ye. Tu her xwe zîrek bike.

Jinkê jî rabû înad bo çêbû. Rabû çû û got:

-Benê ez wê malê bo zarokên we nahêlim.

Rabû çû kiça camêrekê xwast. Mêrikî gotê:

-Ez dê ku kiça xwe ser te de bidem, tu ev jin e.

Gulê gotê:

-Te şol pê nîn e. Înada min ya heyî. Tu bide min kiça xwe. Ya din ez dizanim.

Mêrik rabû kiça xwe dayê. Kesekê hay jê nebû. Malbaba Gulê jî hay jê nebû.

Gulê rabû gustîlk bir û kire tiliya keçikê û gotê:

-Qewlê min û he we eve ku hûn qed behs neken, bo kesê nebêjin. Heta zêlamê min ji Iraqê têtin.

Zêlamê wê ji Iraqê tê û dibêjîtê:

-Sabrî min bo te jinikek ya xwastî.

Mêrik ew bû ji hiş ve diçû. Mêrikî gotê:

-Ez qet jinê li ser te tînim. Eger we be ez li vê malê nabim. Te ku ho kiriye?

Gulê dibêjîtê:

-Ne tu deyneke. Înad ya bo min çêbûye. Te şole jê ye.

Rabû bo mêrikê xwe her tişt got. Bo çi we kir, kiça kî ye, gustîlk dayîna xwe û her tişt. Dibêjîtê:

-Te qebûl bît, te qebûl nebît ez dê bo te înim.

Ho got û çû. Nûke gote birayên xwe û kesên xwe ku çi kiriye. Kesên wê jê sil dibim û dibêjinê ku ew ya dîn û har bûye, ku diçe û li ser xwe jinekê dixwaze. Axiftina wan dirêj dibe û dawiyê hinek qebûl dikin, hinek jî qebûl nakin. Radibe hin tiştan bo bûkê hazir dike û rê dikeve. Hinek bira û kesên wê rê de digehinê û dibêjinê:

-Te em şermizar kirin. Tine ku têyî?

Dibêjîte wan:

-Hûn li gel min nehatin û ez jî mecbûr bûm.

Rabûn çûne mala kiçikê û gotê ku sibê vî demî dê were û bûka xwe bibe.

Roja paştir dibêjîte kesên xwe dê bên an nayên ku biçin bûka xwe bînin. Ew jî dibêjinê:

-Te em yên mecbûr kirî, bê em dê bên.

Diçin ku bûkê bînin, berê xwe didenê gundi mela çinîn e. Diçe ji derve gazî birayê xwe dike. Birayekî wê mela bû. Bira dibêjîtê:

-Bira wela ez nayê xanî ve. Herin bo xwe melayek din bibînin. Ez nayê yeke din li ser te mahr nakim.

Gulê dibêjîtê:

-Were welah tu mecbûr î, tu dê jinikê mahr bikî.

Rabûn çûn, du bira bûne şahit yek jî bû mela. Jinika xwe mahr kir û înande mala xwe. Çend sala jinik mal li gel zalami. Xwedê we kerem kir wê salê de Gulê jî hewiya wê jî hemle keftin û her yeke kurek îrandine dinê. Şeş heft salan jinik mal li gel zalami. Xwedê du kur û du keç dane jinikê. Zalami emrê xwedê kir. Piştî mirina wî du sê sal jinik mal li malê da. Gulê dibêjîtê:

-Rabe keça min. Xwedê ji te razî be, tu rabe tu cihêl î, biçûk î; tu ne hewiya min î, tu şîbî keça min î. Rabe here mala babê xwe, ez dê cihêza te çêbikim. Çi kesî

te dixwazît şû pê bike. Cihêza te xema min. Te bo min du kur û du keç înanandin, mala te û bavê te ava. Ez dê zarokên xwe xudan kem.

Rabû jinik çû mala babê xwe. Kesekê jinik xwest. Gulê rabû cihêz nik xwe çêkir, gote babê wê:

-Ez dê deme şû, tu nadayê şû. Te carekê ya daye min wê carê ez dê bidem.

Gulbeyaz keça xwe dide şû û heta dawiya emrê xwe li gel zarok û nevisiyên xwe dije û dimire.

(Bêjer: Ayşe Ücar)

2.1.1.19. Qumrî

(Di çîroka me ya Qumrîkê de dibînin ku ka jinê çawa her tişt ji ber zarokên xwe, mezinên xwe û civaka xwe neçar maye û qebûl kiriye. Zewacên bêdilî, zoriya civakê ne tenê Qumriyê; kesên dor û rexên wê jî xemgîn kiriye. Ji ber wê dayîka xwe jî winda dike. Xwedîderkeftina mafên jinê bi destê wê nayê kirin, kurê wê ji bo wê serî radike malbatê û civakê. Hinek bi saya kur û bi dawiyê ve jî bi saya zelumê wê ve jiyaneke çêtir derbas dike).

Di demekî dûr de jinikek hebûye. Navê wê Qumrî bûye. Di panzdeh saliya xwe de bêdilê wê ew dayîne mêr. Biçûkên wê hemî şîrje bûne. Di deh saliya zewace wê de zelumê wê tê kuştin.

Jineke gelek berkeftî bûye, ye taze bûye. Gelek kesan daxwaziya wê kiribûye. Heşt tiyên wê hebûne. Ji ber wê çendê çawa zewaca wê de zilm lê hatibû kirin, wê carê jî ji ber tiyên wê eynî tişt serî hatiye. Ku ji malê neçîtin xwastine bidin tiyekî wê. Jinikê ev qebûl nekiriye û reviyê çûye mala mamê xwe. Birayên wê çiqas qebûl nekiribin jî car din ji ber xatira mamî û mezinên eşîrê qebûl kirine û ew dayîne tiye wê yê herî biçûk. Careke din Qumrîkê bêdilê xwe zewacek kiriye. Ji wî zelumê jî du kur xwedê dayîne. Kurê wê yê biçûk çend mezin bûye her sal ji ber jiyana dayîka xwe, qedera dayîka xwe pitir keftiye di nav xemgîniyê de. Dibêjîte dayîka xwe:

-Dayê ez dê her mezin bim û jiyana te bikime film, bikime kîtap.

Lê demek şûnde kurê wê mezin bûye û çûye ji der ve. Dema çîtin jî dibêjîte dayîka xwe:

-Dayê ez dê ji ber xatira te biçim. Da ku jiyana te bikim kîtap. Mamê mezin û xalê xwe jî efû nakem. Ewqas li te zilm kirin. Dê jiyana te bikim kîtap ku ev tiştên wisa serê çî jinikên din neyên.

Kurik çûye dayîk jî maye di nav jiyana xwe ya giran de. Dayîka Qumrîkê ji ber rewşa keça xwe nexweş bûye û çûye ser dilovaniya xwe. Ji ber ku zelumê wê ji wê gelek biçûk bûye, ji birayên xwe şerm kiriye ku berevaniya jina xwe biket. Lê malbata wê ji jiyana wê agahdar bûye. Çûyîne bi mamê xwe re jî gotine. Malbat hemî çûyîne mala wê li gel malbata zelumê axiftine. Ji ber zewaca di nav her du malbatan xwebixwetî bûye mam û birayên Qumriyê gotine rexê din:

-Eger hûn bi vî şiklî berdevam bikin em dê xwîşka xwe biben û keça we jî rêbiken.

Li ser wê gotinê hinek paş ve çone. Lê pişt ve jî ku li ser Qumriyê hewiyê bînîtin zelumê wê dayîne zorê. Bes wi qebûl nekiriye.

Qumriyê çend nexweşî dîtîbûne jî ji aliyê zewac û jiyana xwe di dawiyê de hêdî hêdî li ser keftiye û hinek jiyaneke xweştir jiyaye.

(Bêjer: Nimet Uçar)

2.1.1.20. Darka Berhêk

(Di vê çîrokê de sê kesayetên jinan tên xuyakirin. Herî pêşiyê em keçeke paq û paqij dibînin. Ev keçe ji alemek derasayî hatiye ji bo kurekî beşer. Ji xeynî delaliya wê û paqijiya wê, destxistina wê ya efsanewî li cem kurikî wê qîmetir dike. Wekî çîrokên din de di wê çîroka me de jî safîtiya wê gelek tiştên nebaş tîne sere wê. Lê pîrika li wê xwedî derkeftî û encama berhemê ya erênî dawiyê xweş dike.

Kesa duyemîn jî pîrika li wê xwedî derkeftî ye. Li vir dîmenên wekî ku dayîk e, dide pêşçav. Ji her aliyan ve lê xudan dibe, dayîktiyê lê dike.

Kesa sêyemîn jî qereç e. Li vir jina nebaş temsîl dike. Ji xeynî lehb û lêbazên wê li keçikê kirin; reşatî û kirêtiya(!) wê jî şanî meriv dide ku kesek nebaş e. Dawiyê heqê xwe mîna jinbirayên di çîroka Dirê de dibore dibîne. Li vir keçên navçeyê û dayîka kurikî -ku her dem piştgira kurê xwe dike- jî derbas dibin. Lê wekî van kesan bandor nekirine).

Hebû tûnebû. Kralêk hebû, wi jî tenê kurek hebû. Kurê wi çi kesê razî nedibû.

Rojekê wezîrê wi gotê:

-Kralê min kurê te bila biçîte rêka dara berhêk. Gava çû û nêzik bû dê bêjin 'hat û hey hat'. Eger qet xwe şaş nekey dê gehîte ber darê. Tu dê sê hêkan ji wê darê vekey. Dê dîsa hespê xwe suwar bî û zivirî. Gava vêca tu zivirî dê bêjin 'bir û hey bir'. Dîsa xwe şaş neke, pişt xwe nezivire heta tu nav derdikevî.

Kurê kralî wekî gotinên wezîrî cih înanandin. Çû û hêkên xwe înanandin û zivirî. Dema zivirî du ji dest keftin û şkestin. Êk ma destî de. Ya maye destî de gava ji nav wî qewmî de derkeftî li pişt wî bû hûriyek. Keyfa kurikî gelek hat. Gelek ye law û berkeftî bû.

Hat nêzikî gundî bû, li gundi bîrek hebû. Li nik bîrê darek bişengê hebû. Keçik înan dana bine wê bişengê. Gotê:

-Ez te ho nabem, ez dê bi dahol û zirnê ve, bi şahî û dîlanê ve te bem. Tu li vir heviya min bisekine.

Çû gote day û babên xwe:

-Min ya dilê xwe dît. Em dê rabin daweteke heft roj û heft şevan biken, dê şahî û dîlanê berdewam biken.

Dema kurik li dev keçikê çû ku dawetiyên bibîne, qereçek hate ser bîra avê. Gotê:

-Ev a hinde law, tu êre tinê çi rûniştî?

-Ez bûka krali me. Kurê wî ez bi vi halî ez dîtîm û niha jî çûye ku dawetiyên bînî û min biket bûk.

Her tiştî ji wê re dibêjît. Qerec jî palekê lêdidet û wê diavête bîrê da. Demek diçe kurê krali û dawetiyên wî têne ser bîrê. Berê xwe didetê êke pîr e, dest û til reş e, xwe jî reş e. Dibêjîtê:

-Tu ho nebûyî.

-Ez nazika nava hêkê bûm. Hewayî min da ez reş bûm. Eger ez jî zanim ez ho nebûm.

Kurê kralî jê bawer kir û lê belê dilekî nexweş bir. Wextî dawet ser bîrê çuyî, pîrikek feqîr ji gundi dûr bo xwe hate avê. Berê xwe didetê rewneqekê ya daye îveka avê û deng jî jê tê. Ew ê satila xwe dahêla bîrê û keçik pê ve hat. Pîrê gotê:

-Tu kî yî, ji ku ve hatî?

Keçikê gotê:

-Pîrê hema ez ya te me. Min bo xwe bibe, ez hêdî keça te me.

Pîrê keç bir, nêzik salekê zeman ser da çû. Çiyê çû kiça pîrê dît hema mane şaş. Xelkî gote kralî:

-Pîrê ewqas kiçek hinde law heyî, te bo çi keça pîrê neînan?

Kurê kralî bîaqîlbû. Gote dayîka xwe:

-Dayê rabe keçikên gundî berhevke, bila hiriyê şeken bo kepenên şivanan. Belê bila her yek serhatiyekê bêjîtin.

Hemî hatin, keça pîrê jî hat. Lê her derê xwe pêçabû. Keçik rûniştin hirî şekirin, serhatiyên xwe gotin. Kurê kralî jî neçûbû û piştî deri guhê xwe didayê. Wextî dor hatiye keça pîrê, keçikê dest avête serhatiya xwe. Qereçê landika xwe dihejand û kurê xwe girî dibir ku dengê keça pîrê kes gulê nebît. Wê ew naskiribû. Her duyan yek din naskiribûn. Wextî kurikî guhê xwe didayê nivî gulê bû, nivî gulê nebû. Dayîka wi keçik rêkirin. Lê gotê sibê bîn ca hiriyê xelas bikin.

Roja din dîsa berhev bûn. Kurê kralî gote dayîka xwe:

-Dayê bila keça pîrê ewil bêjît çîroka xwe.

Kurikê pê hesiyabû ku ew ew e. Kiçekê hemî serhatiya xwe serî de bo wan got. Kurê kralî der vekir û gotê:

-Ev e kî bû ew serhatiyê gotî?

Gotin:

-Keça pîrê got.

Rabû ew bir û çû mala pîrê. Pirsê pîrê kirin:

-Ev kiça te ye?

-Ev keça min nîn e. Min ji binê bîrê derêxist. Ew nazika niveka hêkê bû.

Qereçê palek lê da bû ew hawetibû binê bîrê. Min ew hilgirt û înanî.

Kurê kralî her tişt ji pîrê re got.

Pîrê got:

-Here kurê min hespekê tehnî bike êkê jî birsî bike. Bila hesp cezayê wê bidenê.

Kurê kralî rabû we kir. Şûnde jî rabû ji pîrê keça wê xwest û daweteke xweş, bi şahî û dîlanî kir.

Ew gehîştin miraza xwe, hezar rihmet da û babên guhdaran.

(Bêjer: Nimet Uçar)

2.1.2. Berhemên Stranî

2.1.2.1. Vê Narê Tevnek Çêkir

(Ev stran li ser jinên erdnigariya di Kurd de wek mînak hatiye nivîsîn. Çi ma mînak; ji ber ku her aliyên xakên kurdî jinên wiha hebûne û li ser wana rist hatine nivîsîn. Di wê stranê de jî em hem li xerîbiya wan, hem delalî ya wan û hem jî bilindbûyîna wan ya asta rêveberiyê û hem jî ya di nava gelemperiya cîvakê de dibînin. Viyan bin, neviyan bin; şû bin, revandî bin çî cihên çûyîne karên xwe, jiyana xwe ji dest bernedane. Li rastî hemî êş û janên dinyayê pêş ve çûyîne. Li serê xebata me heta ku niha me gelek jinên kurdan yê wisa nas kirin. Gulok, Fat û Eys jî hin jî ji wan in. Jin e, jiyana e, xerîb e, zana ye, rêveber e û hwd).

Vê Narê tevnek çêkir

Nar nar nar nara min

Davek ser davê têkir

Nar nar nar nara min

Navên xerîban lêkir

Nar nar nar nara min

Vê narê tevnek danî

Nar nar nar nara min

Davek ser davê danî

Nar nar nar nara min

Navê dostan lê danî

Nar nar nar nara min

Vê Narê tevnek anî

Nar nar nar nara min

Nexşê gul sor lê danî

Nar nar nar nara min

Navê dostan lê danî

Nar nar nar nara min

Navê nara min Gulok e

Nar nar nar nara min

Kemera wê ziryok e
Nar nar nar nara min
Paşa rabû ji Dihoke
Nar nar nar nara min
Navê nara min Fat e
Nar nar nar nara min
Kemer piştê wer hate
Nar nar nar nara min
Paşa rabû ji welate
Nar nar nar nara min
Navê nara min Eys e
Nar nar nar nara min
Kemer rabû bin kevşe
Nar nar nar nara min
Paşa rabû ji mîr Eyşe
Nar nar nar nara min

(Bêjer: Yasin Tertemiz)

2.1.2.2. Hay Sînemê Sînemê

Hay Sînemê Sînemê yar delalê Sînemê
Sînem heyva çardêwa
Yar delalê Sînemê
Wel nîveke asmana
Yar delalê Sînemê
Heçiyê Sînem nenasî yar delalê Sînemê
Yar delalê Sînemê
Mêzeke rengê dayê
Yar delalê Sînemê / Bara xwe da dinyayê
Sînemoka delal e bara xwe da asmana
Ber rengê Sînemokê / Yar Sînemê Sînemê
Erd û asman rewneq dan
Yar Sînemê Sînemê Yar delalê Sînemê
Sînemokim nexweş e
Girtî derdê nezerê
Min kir Sînem ramûsim
Felekê çerxek lê da
Yar Sînemê Sînemê Yar delalê Sînemê
Hûn bêjne hostekaran
Qebrê Sînemê teng e
Rehmet bavê melayî
Terqînê dixwînît deng e
Yar Sînemê Sînemê Yar delalê Sînemê
Hûn bêjne hostekaran
Qebrê Sînemê kûr e
Rehmet bavê melayî
Terqînê dixwînit hûr e
Yar Sînemê Sînemê Yar delalê Sînemê
Hûn bêjne hostekaran
Salê salîne leng e
Rehmet bavê melayî

Terqînê dixwînît deng e
Yar Sînemê Sînemê Yar delalê Sînemê
Salê salînê ferş e Yar delalê Sînemê
Rehmet bavê melayî
Terqînê dixwînît xweş e
Ehd kirî li mar û mişka
Ca nexwin çavên reş e.

(Bêjer: Yasin Tertemiz)

(Li gorî gotinên wê stranê dayîka Sînemê û xweştîviyê wê bi wê re dibêjin. Sînem ewqas keçeke bedew bû ku hemiyar behs jê dikir. Dibêjin ji ber wê delaliya xwe bi derdê nezerê diçe ser dilovaniya xwe. Ew dema ku li axê tê veşartin bi wê ve dibêjin. Gelek caran em dibîhîsin, dibêjin: - Ji bo jinê şer ji tê kirin, ser jî tê dayîn. Ji bo delaliya jinan gelek bûyer di dirokê de peyda bûne. Li gorî civakê jinê û delaliya wê gelek kes birine mirinê, ji bona evîna jinekê di navbera dewletan de jî gelek pevçûn çêbûne. Lê em di serpêhatiya strana Sînemê de dibînin ku bedewiya wê li ser canê wê bûye encam. Yê ku bi delaliya wê ve hesûdî kirî yan jî çav pê nerabûyî bi nezera xwe ve ew birine mirinê. Bona Sînemê ev rist ji tînan gotin).

Yar Sînemê Sînemê
Sinemok ye nexweş e
Bêjne dayîka Sînemê
Dê bêjine hostekaran
Da çêken kêlî û ferşan
Yar Sînemê Sînemê
Heyla gîdiyê Sînemê
Heçkî Sînem nedîtî
Mezê biken rengê dayê
Qesra xan Sînem tê da
Ya li nîveka behre da
Sînem heyiva çardeho
Şewqê da bû dinê oo

Dê bêjine hostekaran
Lê biden hûr bizmaran
Da nexwîn mîşk û maran
Hay Sînemê Sînemê
Heyla gidiyê Sînemê

(Bêjer: Ayşe Êcar).

2.1.2.3. Warê Mendana

(Mendan zozaneke bajarê Colemêrgê ye û li aliyê Silehê cih digire. Ev bûyera dilşewat ya ku di ristên jorî de derbas dibe li wir qewimiye. Di erdnigariya Colemêrgê de bûyerên hewayî tûndî derbas dibûn.

Di demek wiha de, di avetîkên nîsanê û gulanê nexweşiyên wek xerik, zatûre û sorikan li nav miletî de binecih dibin. Berf, bager, boran bi hev re li ser wan dibare. Tiştên wan, sewalên wan gelek telef dibin. Dayîkek kur û keça xwe ji xuriyan winda dike û bi vê zêmarê ve jî hestên xwe anîne zimên. Niha jî navê cihê ku zarokên xwe lê dayîne axê, ji vê gêdûkê re dibêjin ‘Zinya Gurgo’.

Ev avetîkên herêmê ewqas bi nav û deng in ku li ser helbest, rist hatine nivîsîn. Dixwazin mînakek kurt bidin dayîn:

‘Avetîkên gulanê
Jê tîn taviyên baranê
Pezê kûvî yê li ber zayîne’

(Bêjer: Ayşe Ücar)

Lê divê bê gotin ku ji bona van ristên li jorî çîrokek din jî tê gotin. Li gorî vê varyantê jî tê gotin ku mendan ji bo zarokên hêj di landikê de tê gotin. Ê li gorî vê çîrokê di herêmê de nexweşî li nav zarokan de derdikeve û gelek zarok heta mezin bi van nexweşiyên ve jiyana xwe ji dest didin. Çi tişt ji destê dayikan naye û ew jî bi vî halê xwe ve hêstên xwe bi ristan ve dilorînin.

(Tesbîtkirina wê varyantê: Kenan Çiftçi)

Lê divê bê zanîn ku xebateke li ser wê mijarê hatiye kirin jî heye. Li gorî wê xebatê bûyer bi serê koçeran tê. Koçer koç dikin tîn wê zozana Colemêrgê û dema avetîkan e. Ji ber rewşa hewayî ya nebaş riya xwe nizanin, nexweş dikevin û bêtişt dimînin. Dawiyê de jî dayîkek zarokên xwe winda dike. (Yaşar, 2011: 359).

Lê divê bê zanîn ku ev bûyere divê li gorî vê varyantê nerast be. Ji ber ku yek; koçer cihî nezanin jî, dem û demsalan baş dizanin. Ya duduyan jî di ev dema hatiye dayîn ‘dema avetîkan’ de hêj da ev ware di bin befrê de ye).

Mendaniyê warek lêj e
Wan teyrokên vêje vêj e
Daxwaza Gurgo bi şîrêj e

Mendaniyê mêrg û kanî
Wan eşîran mal lê danî
Dayîk korê qet nezanî
Daxwaza lawan bi cih neanî
Mendaniyê warek banî
Wan eşîran mal lê danî
Dayîk kor be qet nezanî
Cotê cana li bin axê danî
Xelef bira were lê re
Gel xwe bîne tevr û bêre
Lawê min Gurgo pê veşêre
Mendaniye li ber gedûkan
Xerîk hatin li nav biçûkan
Gel xwe dibet zava û bûkan

(Bêjer: Turan Harmancı)

2.1.2.4. Hêy Hêy Çûme Suwara Xelê Wa

(Di van ristên jêrî de em evîna zilamê misilman û keça felah dibînin. Zilam di her çarînan de hestên xwe yên hemberî xweşikiya kêlokê tîne zimên. Çiqas hestên derûnîkûr jî bin bi zimanekî nerm û heyrankî têne gotin. Ji bo evîni, delalî û civaniya keçikê çî tîn serî mêrîkî û ew jî li ber van hemûyan çawa ber xwe dide dibînin. Li rastî hemûyan jî baweriya xwedîbûna wê delalê ji bo xwe rast û teqez dibine).

Hêy hêy hay canê canê canê
Hêy hêy keçikê kiras kitanê
Hêy hêy wê li xwe kirî xiftanê
Hêy hêy keçkê kiras kitanê
Hêy hêy keçkê çiqas ciwanî
Way way keçkê çîqa ciwanî
Hêy hêy çûme Suwara Xelê wa
Way way çûme Suwara Xelê wa
Hêy hêy kêlokek nava rê wa
Way way kêlokkek nava rê wa
Hêy hêy çî kêlokek çî can e
Way way çî kêlokek çî can e
Hêy hêy memik tiriye rezan e
Way way memik tiriye rezan e
Hêy hêy rojî me remezan e
Way way rojî me remezan e
Hêy hêy rojiya min pê noqsan e
Way way rojiya min pê noqsan e
Hêy hêy kirasê wê kitan e
Way way kirasê wê kitan e
Hêy hêy hatime Suwara Xelê wa
Way way meşyam Suwara Xelê wa
Hêy hêy kêlokek rê da tê wa
Way way kêlokek rê da tê wa
Hêy hêy yar Xwedê bo min bê wa

Way way yar Xwedê bo min bê wa
Hêy hêy çî kêlokek çî can e
Way way çî kêlokek çî can e
Hêy hêy memik sêvên rezan e
Way way memik sêvên rezan e
Hêy hêy ew Xwedê bo min dane
Way way ew Xwedê bo min dane
Hêy hêy rojiya min pê noqsan e
Way way rojiya min pê noqsan e
Hêy hêy Suwara Xelê kanî ye
Way way Suwara Xelê kanî ye
Hêy hêy min qîzîk hev zanî ye
Way way min qîzîk hev zanî ye
Hêy hêy Xwedê bo min aniye
Way way Xwedê bo min aniye.

(Bêjer: Mahmut Balıkesir)

2.1.2.5. Dîlber

(Di vê stranê de çiqas em bi devî zelumî ve jî be, ji jiyana jinikê agahdar dibin. Evîneke veşartî, zewaceke nejidil, rewşa aborî ya nebaş û ku li ber evîndaran dibe asteng dibînin. Hin kes li rastî van şer dikin û serdikevin, lê di vir de wisa nabe. Ji xeynî van hemûyan jî li rastî zordariyan bêdengiya jinê berdewam dibe).

Dîlberê dilber canê
Sibê bûye
Xaniyê mala babê dîlbera min
Heylê lê vaax hevî lê lê ayyîûû,
Heylê weylê lê
Du qanat e (qata avahiyan) ayyy vîî
Weyla karê kubarê
Mine sebir revînê hevî lê lê, hey lê lê
Netewa te weylê lê oyy
Weyla mihemê canê min e per evînê lê lê
Weylê hey lê lê
Lê lê neqanate vaaax
Sala îsaleke vezê xerîb ketime
Parçe bûme pir û pare tê me veriyane
Vezê çawa bimrim weylê lê lê vaax hevî lê lê
Hey lê lê ca bême ba te vaax dîlber
Û dîlber vayê haaîîî li min dîlber canê.
Dîlberêêê dîlber canê
Sibe bû vezê çûme Kela Hevîlê lê lê vaaax
Hevî lê lê hey lê lê, lê lê ca ew çima nayê vaaax
Vezê daketime deştê nav qolê zerîesmeran tevî lê lê vaax
Hevî lê lê hey lê lê, lê lê berîvana min vaax.
Heçî kete kalê kundi re nava du dila çarçawa xeber bide,
Îtîrazê bike, terefê alemê jê re bê dev be, hevî lê lê.
Vaax hevî lê lê hey lê lê, lê lê êşa dev û didana ûûûû
Vaax ax dîlber, dîlber vayê hay li min dîlber canê ûûû.

Dîlberê dîlber canê sibe bû, dîlbera min derkete derê malê ûûû
Lê lê min dinêre ûûûû.
Bejna min re tê mêgulî, çav û biriyên belek, ax li min
Ser da tê sê qol zêr e, hevî lê lê hey lê lê vaaax
Tunebûna malê dinyayê ya sê hezarê heta çûme welatê
Xerîban û xurbetê vegeyame, destê dîlbera mi girtin hevî lê lê vaax hevî
Lê lê hey lê lê, lê lê dane mala mêrî vaax
Ax Dîlber dîlber vayê hay li min dîlber canê hayyy hayyyîîî.....

(Bêjer: Selim Şen)

2.1.2.6. Ber Mizgeftê Nişivî

(Di van ristan de keyfxweşiya du dilan dibînin. Ev straneke dîlanî ye. Di dawetan de tê gotin. Wek em di stranê de dibînin ku aliyê zava û aliyê bûkê ji hev û du dilşad in. Bûk û zava, mêr û jin wekî evîndarên mezin Xecê û Siyabend tên fikirîn. Ya din jî em di van ristan de bandora eşîriyetiyê jî dibînin. Ew fikra ku şens, qencî, rastî, îqbal û hwd bi saya wê ve, di gelek cihan de bi hev re girêdayî tê dîtin).

Ew tene nişivî

Şûr zêro Bedirxan Beg

Rex mizgeftê nişivî

Şûr zêro Bedirxan Beg

Jê derkeft geliyê kovî

Şûr zêro Bedirxan Beg

Dê şêran bikene rovî

Şûr zêro Bedirxan Beg

Ber mizgeftê derkeftin

Rex mizgeftê derkeftin

Serê rima wî keftin

Her du cun eşîret in

Kela kelhê biçûk e

Dava dav lê biçûk e

Serê şawxa pîla wo

Binê şawxa neynûk e

Ser Sîpanê Xelatê

Pîroz bin zava û bûk e

Kela kelhê mezin e

Dava dav lê mezin e

Serê şawxa pîla wo

Binê şawxa asin e

Ser Sîpanê Xelatê

Pîroz bin mêr û jin e.

(Bêjer: Mahmut Balıkesir)

2.1.2.7. Bejna Bilind

(Di van ristan de li rastî eşq û evînê çi ji mêr û çi ji jin, çawa hêstên xwe dianîn ser ziman dibînin. Eşq û evîna wan li rastî kîjan şert û mercan tên, kî ku lê dinêre û çawa dawî tên xwestin hemû hatine ser zimên. Keça xwe bawer û dizane çi hez dike û çi dixwaze dikeve pêşiya me).

Bejna bilind minare ye
Sihar e mela dixwînît kebare ye
Derdê dilan bêlome ye
Dîtina çavan bêfayde ye

Bejna bilind wek çinarê
Mela wê't xwînît kebarê
Derdê dilan zor e yarê
Dîtina çavan naden çare

Bejna bilind li min şîrîn e
Mela kebarê wê't xwîne
Eşqa dilan zor e kes nebîne
Dîtina çavan fayde nîn e

Wey li min ê wey li min ê
Min pepûkê dewra dinê
Dayê zor e derdê eşqê dilketinê
Yê min divêt min bidinê
Bi dîtina çavan min nedene.

(Bêjer: Mahmut Balıkesir)

2.1.2.8. Zêmara Dayîkê

(Di van ristan de em zêmara dayîkê ya ku bixwe bi kur û birayê xwe ve gotî dibînin. Çi ji kezebê tê xwarê ew hatine gotin û me jî wî halî nivîsandiye. Dilnermiya jinan, a dayîkan, sotina cerg û dilên wan em dibînin di van gotinan de. Ev bûyereke rast e. Bêjera me bi xwe li ser gotiye û dawiyê de xelas jî nake. Lê mixabin nikare dawiyê lê bîne. Me jî zorî lê nekir).

Rebenê dayê, jarê dayê
Exsîr im dayê, belengaz im dayê
Wela dayê rêka Wanê min kiriye li cade wo dayê
Reben im dayê, jar im dayê
Xalê min êxistibûne li erdî vedane dayê.
Wale xwîşkê ez çûm geriyam negeriyam
Min ne dîtî çavên belek, bejna bilind dayê.
Wela min gotê Fevzî tu bi Xwedê dihebînan
Tu lawê min cindî bişo.
Got: Dayîkê ser xatira te naêşînim dayîkê.
Hay li min ê, hay li min ê.
Wela dayê, wela xwîşkê reben e, xwîşkê evdal e.
Xwîşkê exsîr e dayê
Wela dayê ez geriyam negeriyam
Wela dayê min çi kes li der dorên xwe nedît dayê.
Wela dayê ev bû serê panzdeh salan
Xwîşka reben şevê rojê dikir û digot
Berevancî yan bo min digot
Xato tu ye serê min bixwûyî
Wela dayê min wê rijê bexçika lawê xwe derêxistin
Min gotê Özal ooo tu bi Xwedê tu hebînan
Tu ye wê qata lawê min bide yekî temîz bila berkert
Peş çawê dayîka te bêt û biçît
Mal xiraboooo
Gotî dadê tu reben î, dadê tu jar î dayê

Te serê me xwariye dadê
Wela min gotê bira
Bila înşalah hemî bo wê bine nivîştî
Bira cergê dayîka te kul e, birîn e bira.
Weyla hay li min ê hay li min ê.
Hay li min ê, hay rebenê ez ê.
Wela dayê dayîka kor e şev û rojê diket û dibêjît
Wela dayê hêdî deng û seda yên min biriyane dayê
Hay li min ê hay li min ê.

(Bêjer: Hatem Cankurtaran)

2.1.2.9. Xecukê Sêhlê Bîne

(Di wê stranê de em dilxweşiya mêrî li gel jina xwe Xecukê dibînin. Xecuk hem jinek jîr e, hem dayikek baş e û hem jî cîranek bimerîfet e. Li ser van hemûyan mêr jî bi gotinên xweş ve wê gazî diketin).

Xecukê sêhlê bîne
Xecu dilê min
Dindikan biqelîne
Xecu dilê min
Bahra biçûkan bîne
Xecu dilê min
Xecukê xecîkukê
Yeman yeman yeman
Te dindik pirr wê şorkê
Xecukê dilê min
Tu avê bîne ji cukê
Yeman dilê min
Xecukê sêhlê bîne
Xecu dilê min
Dindikan biqelîne
Xecu dilê min
Bahra cînanan bişîne
Xecu dilê min
Xecukê bilan bilan
Xecu dilê min
Wêd meşît her du milan
Xecu dilê min
Mihiba her du dilan
Xecu dilê min

(Bêjer: Mahmut Balıkesir)

2.1.2.10. Hicrokim

(Di van ristan de em evîna xortî ya bo Hicrokê dibînin. Di nava ristan de em dizanin ku Hicrok keça yekî dewlemend e. Qesrê de dimîne. Lê car din kêfxweş nîn e. Ji ber ku wek kotirka li nav rikê de tê girtin hatiye taswîrkirin. Di nav eşq û evîna bo Hicrokê ku xort di xwe de mezin dike de dilşewatiyek jî bo hal û ehwala wê jî heye. Lê car din xort li rastî hemî zoriyên wê eşqê wekî Qenber li cem evîna xwe dimîne).

Hicrokim hicran pêdan
Eman eman im
Qesra Hicrokê tê da
Eman eman im
Hicrok wê di mal babê da
Qenber yeman im
Ew qesra hemyan jêr da
Eman eman im
Newêrim çime tê da
Eman eman im
Hej tirsê day û babê dan
Qenber yeman im
Ew qesra hemyan wê da
Eman eman im
Hicroka min wê tê da
Eman eman im
Ramûsim mal babê da
Qember yeman im
Ew qesra ji hemyan jortir
Eman eman im
Hicrokim bûye kotir
Eman eman im
Te cerg û dilêm sotin
Qenber yeman im.

(Bêjer: Mahmut Balıkesir)

2.1.2.11. Dêp Nîmo

(Li gorî gotinan meseleya Nîmoyê ev bûye: Nîmo kêlok bûye. Mintiqeya Tiyarê bûye. Wî demî zelumê wê mezinê wir bûye. Dema zelumê wê diçe li ser dilovaniya xwe rêveberiya herêmê Nîmo dike. Stran wekî ku bi devê zelumê wê ve hatiye gotin wisa hatiye neqilkirin. Belê em di gelek stranên ku vê herêmê hatine gotin de jinên rêveber, serbixwe û xwe pêş ve birin dibînin. Nîmo jî yek ji van jinan tê nasîn).

Dêp Nîmo Nîmo Nîmo
Dêp Nîmo bana leylê
Dêp Nîmoka Ertoşî
Dêp Nîmo bana leylê
Te li serî qere poşî
Dêp Nîmo bana leylê
Ser memika nafiroşî
Dêp Nîmo bana leylê
Hop Nîmo Nîmo Nîmo
Hop Nîmoka Tiyarî
Te li serî tora tarî
Dêp Nîmo bana leylê
Ser memikan nadet yarî
Dêp Nîmo bana leylê
Hop Nîmoka Tixûbî
Dêp Nîmo bana leylê
Çav stêrka ser mexlûbî
Bextê min tu ye bi şûbî
Hop Nîmo bana leylê
Hop Nîmo kiçka gundî
Ne kurt î ne bilind î
Ew bahra malxwê gundî
Hop Nîmo bana leylê.

(Bêjer: Mehmet Uçar)

2.1.2.12. Werî lê lê

(Di vê stranê de em xweşikbûyîna jinê ya li ber çav û dilê evîndarî vê ve çawa ye em diderxînin. Bêjer li rastî hemî zor û zehmetiyan ku evîndara xwe biparêze nav û navnîşana dîlbera xwe nadete diyarkirin. Nedîtina evîndarê ya di çavdêriya zîlamî de belkî elameteke nebaş jî tê fikirîn ji aliyê zelamî ve).

Werî lê lê lê delalê oyy

Werî lê lê mala bavê delala min danayî rexê rê oyy

Wela çi sibê heta êvarê hire hira û gire gira van teqsiyayê oyy

Wela hindî ez yê çavên xwe digerînim û nagerînim

Wela ez yê nabînim delalika dile xwe li hewşa malayê

Benê te ez kuştim, sotim helandim derdê eşq û evînê

Benê te ez berdame serê çol û çiyayê

Ax werî lê lê werî lê lê

Werî lê lê lê delalê oyy.

Werî mala babê delalîka min danîne bin lo van mirtîkayê

Benê çi sibê heya êvarê hire hira û gire gira van tirimbêlkayê

Wela hindî ez yê çavên xwe digerînim û nagerînim

Wela ez yê nabînim delalîka dilê xwe li wan eywankayê

Ax werî lê lê werî lê lê

Werî lê lê lê delalê oyy.

Wela hindî ez yê çavên xwe digerînim û nagerînim

Wela ez yê nabînim delalîka dilê xwe li wan eywankayê

Benê te ez kuştim, sotim helandim berdaye sere van rêkayê

Ax werî lê lê werî lê lê

Werî lê lê lê delalê oyy.

Keçik dibêjît kuro lawo dîno, rebeno ma çima tu nayê

Berî derê mala babê min rebena xwedê yo bimêvanî

Mala babê te ava

Wela sibê heya êvarê çavên min rêka ve hişk bûn

bi rêkên ber derê van malayê

Dê tu hedî hedî bilezîne were ber derê mala babê min

Rebena xwedê yê da bibînim bejn û bala te yê
Ax werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê lê delalê oyy.
Werî mala babê delalîka min danîne pişt malên lo van girtikayê
Wela çi sibê heya êvarê hire hira û gire gira van tirimbêlkayê
Wela hindî ez yê çavên xwe digerînim û nagerînim
Wela ez yê nabînim delalîka dilê xwe, bejna bilind çavên reş û belek lo van
pencerkayê
Benê te ez kuştim, sotim helandim berdaye serê van çiya û milkayê
Ax werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê lê delalê oyy.

(Bêjer: Feysel Koç)

2.1.2.13. Wey Te Bar Kir

(Di van ristan de em evîndarekî bêhêvî dibînin. Hinek jî hişên xwe ve jî tevlihev e. Êdî jiyane û hezkiriyê çî zorî bona wî derxistine ku di vî halî de ye. Lê di rexê din keçeke evîndar û li ber her tiştî di serî de amade dibînin. Evîneke mezîn lê belê ye bêncam li ber me xuya dike).

Were bar kir, bar kir

Malan ji vî warî bar kir

Dilê min rebena xwedê bi kul û xem û derd kir

Te barê eşq û evîne li ser dilê min rebena xwedê giran kir.

Wey te bar kir.

Malan ji vî warî bar kir.

Were bar kir, bar kir

Malan ji vî warî bar kir

Dilê min rebena xwedê bi kul û xem û derd kir

Te barê eşq û evîne li ser dilê min rebena xwedê giran kir.

Wela ji êvarê heya sibê serê min rebena xwedê

Li ser cotê balîfan qet xew nekir.

Wela serê vê sibê gel yê avdanê

Min yê serê xwe li ser cotê balîfan rakir.

Wela min yê pêl û bala xwe daye şûna waran maye xir û xalî

Wela rexeke teyr û tawala pê wer kir

Di rexê dî gurgan û hirçan tarûbar kir

Te bar kir, bar kir

Malan ji vî warî bar kir.

Keçik ya dibê; kuro lawo, dîno mala babê te xirabo

Wela vi yaşê biçûk da çima te goştê leşê min helando

Wela te ez yê êxistime ber kulan û derdan û xeman û van kederano

Wela mala babê te ava yo çima te ez nexwestim nerevandim

Te ez hêlandim li ser van kulan û derdano

Were bar kir, bar kir

Te mal ji vî warî bar kir

Were bar kir, bar kir
Malan ji vî warî bar kir
Dilê min rebena xwedê bi kul û xem û derd kir
Te barê eşq û evînê li ser dilê min rebena xwedê giran kir.
Wey te bar kir.
Malan ji vî warî bar kir.
Kuriko got; kiçê dînê rebenê mala babê te xirabê
Wela te bo çi ne bi xeberê min kir
Te yê goşt û leşê min helandî
Wela te yê hêlayê wê kolanê
Dê komekê ji komê van hestiyan
Ez nizanim ji wê yaşî paşî û pê ve tu çi ji min xwazî.

(Bêjer: Feysel Koç)

2.1.2.14. Melîlo

(Strana evîndariyê ye. Ya keyf, kul, derd, xem û hiyalan e. Bêjer çiqas xweş bibîne û pê ve xweş bibêje jî car din li cem keçikê bersivek ronî lê nayê dayîn. Evîna keçikê ewqas bandor lê kiriye ku dîtina wê, behna wê, axiftina wê û hwd bi devê kurikî ve pêşdarkirinên xweş û balkêş lê hatine kirin).

Ax melîlo melîlo melîlo

Wala ez melîl nebûm, te ez kirime melîl

Ez garîp nebûm, te ez kirime garîp

Ez feqîr nebûm, te ez kirime feqîr

Ez din ne bûm te har kirim berdame wan kolanan

Melîlo hoy hoy hoy

Wela min rezkekê dana bişta mala rezê tirî.

Min ê li nav da dana qefteke gul û rihana

Wan sûsîna û wan beybûna

Wala min ê nav wa da dana guleke sora Mihemedî

Heke rojê du caran, se caran ez bêhn nekemê

Wê dinyayê ez ê dîn im, mehrûm im wey lê yarê

Ax melîlo yarê kurik yê dibejîtin

Kiçikê mala bawê te xirabê min rezekî dana pişta mala babê te

Rebena xwedê rezê tirî

Rebenê dinê, çaw birî reşê.

Kezî sorê navteng ziravê, çav bîmê

Min ê rezekî dana pişta mala babê te

Rebena xwedê li rezê tirî

Wala min ê serda berda, rebenê dinê disa li ji te ra deravê avê

Avêt van zozana, avêt tezî

Kiçê mal xîrabê wala tu wekî wê gûla Mihemedî

De lê lê kiçikê qesra mala bawê te bilind e

Ketiye biniya vî rezî, vî baxî

Kulê dilê min gelek in.

Wala ez e rojê bejna bilind çar caran pênc caran nebînîm.

We dinyayê malxirabê, ezi dîn û har im, ez mehrûm im
Ez melîl nebûm te, ez melîl kirim.

(Bêjer: Feysel Koç)

2.1.2.15. Hacan

(Lehengê me yê li vir Hacan e. Nav e yan rengdêrê wî ye nayê zanîn. Lê li gor ristan em tê derdixin ku mêrek şervan, zîrek, suwarek jêhatî ye. Îhtîmalek mezîn e ku Hacan mînakê şervana ye. Her şervanek xwedî tiştên herî baş in. Loma şervanê me Hacan jî xwediyê dindil, çav bikilê û Xatûn Zînê ye. Çavbikil û Xatûn Zîn temsîliyeta jinan dikin. Wekî xelatên herî baş û qeç tèn dîtin).

Hacan hacan hacano
Hacan hacan hacano cebrano
Sing li mêrgê qutano hacano
Golik lê girêdano hacano
Derbenêt wan qetyano hacano
Yêb çûne nav ziyano hacano
Zerî bi dûv da meşyano hacano
Kemberêt wan qetyano hacano
Hacan sûwarê dindilê hacano
Bajo here Mûsilê hacano
Mêvanê çav bikilê hacano
Hacan sûwarê mahînê hacano
Bajo rêka Mêrdînê hacano
Mêvanê Xatûn Zînê.

(Bêjer: Ayşe Ücar)

2.1.2.16. Kavrê Kur

(Stranek biherket e û piranî li govendan tê gotin. Neqlek sivik tê gotin. Dema em li wateya wê dinerin; kesê dibêje kur e, hevaltiyek binecih, cangorî heye û ji bo xwesûya xwe jî rêzgir e. Li ber xatira jinikê karek tê kirin û ev ji qîmetdayîna wê civakê nîşan dide).

Çoho kavrê kur,
Nextê bezê sed û sih
Hatine rezê hop lerî
Çi hop lerî
Kafiro tac li serî
Tacê te serê te bît,
Serê te singê te bît
Mîr Mahmut mîrkê me bît
Kuştina me dê her hebît
Kaniya li ber hesuyê,
Herama ber hesuyê
Min kola pê teşiyê,
Ser xatira xwesûyê,
Hewalo yarka min çû, hat ya te,
Sed rehmet day û babê te.

(Bêjer: Mahmut Balıkesir)

2.1.2.17. Cotyar

(Bûyer li nav gundên Elkîk û Şîvav de dibore. Bûyerek rast e. Şerê li nav eşîrên Pinyanişî û Ertoşiyân derbas dibe. Ji her du aliyên koman jî kur, xort tîn windakirin. Dawiyê jî çî tişt nagehe çî û tenê wekî her kuştinan, her şeran dilê dayikan tê şewitandin).

Dê were were were hoy cotyaro oyy

Wela roja me derkeftê serê çiyaye van ecema oyy

Şewq û şemala roje havite zozanên jêrî girê, hêlîn û nihalan oyy

Lo ber gund û zozano oyy

Wela cotyarê mala babê min serê vê sibekê rabû û

Cote gamêşan li ber xwe kir û berê xwe da zozanên jorî

Li nav şûnewarên par û pêrar

Wela her roj heya êvarê te xet kir û xet wergêra

Ji êvariya gundan û pay da qaçax û firarê dewleta

Van Tirkan oyy

Wela kê nezanî serê sê şevan û sê rojan te tamam nabît

Dê biyê gîrtiyê ax lo eşîreta van Kurdan oyy

Axx dê were were were hoy cotyaro oyy

Wela cotyarê mala babê min jî sibe heya êvara

Xet kir û xet wergera oyy

Ji êvara gundan û paş da bi sê denga dikete gazî

Kemalo kurê mino tu yê lez bike. Hebikê li pê xwe balîne

Suwar kêmidê babê xwe bîne, zînekê lê bike

Tang û bertang li piştê bişidîne

Pê xwe pavêjê rikêbê berê xwe bide mala bavê xwe di kolê da oyy

Kemalo kurê mino tu yê lez bike hebak ya piyê xwe ve helandî

Wela sor kêmidê bavê xwe îrandî, zînek yê lê kirî

Tang û bertang li ber piştê şidandî

Pê xwe avêtiye rikabê

Berê xwe da gunde mala babê xwe di kolê da.

Wextî diçî di kola gelî, berê xwe didatê li werê êkê kozika xwe danandî

Çepera xwe çêkirî

Dibêjîtê ez yê li bextê te da, tu ye li bextê xwedê da
 Bêje ka carê tu kî yî
 Te kozîka xwe li rêka mala babê min de danandî oyy
 Dê were were were were hey cotyaro oyy
 Wela sibe heya êvarî te kir û kare feqîr û van jarano oyy
 Ji êvara gundan oyy pay da firar û qaçaxê dewleta van roma oyy
 Kê nezanê serê sê şevan û sê rojan te tamam nabît
 Dê girtî biye bêgirtin li eşîra me Kurdane oyy
 Wela wextê wê dibêjîtin Tahirê Silo bi sê dangan diket gazî
 Dê kuro bêje Kemalo ka carê ev e sê şevan û sê rojan e
 Ez yê li esmanan li babê te digirim
 Babê te yê li erdî di destê min dikevît.
 Ka carê bêje babê xwe kî da ma oyy
 Kemale kurê bi sê dangan diket gazî dibêjîtê:
 Xan Avdelê babo wela were yekê li kozika xwe
 Yê ku li koça sêvê danî li rêka xweşmêr û me egîdana oyy.
 Wextê wê dibêjît Xan Avdelê delal destê xwe daye darê way li malê hêdî hedî
 Ew ê li malê berê xwe didete êkê kozika xwe li wêrê danaye
 Bi sê dangan gazî dike dibêjîtê
 Ez yê bextê te da tu yê li bextê xwedê da Tahirê Silo
 Erz û eyalê me li mal da bêxeweyî bêxudan e
 Tu yê kozika xwe, xweş hêlîka me da rake, min hevî û rica
 Ji her bedela te û babê te heye oyyy
 Dê were were were were hey cotyaro oyy
 Ay dayîka Tahir Şemsixanê hay lê nîn e wextê we dibêjît Tahirê Silo
 Kuro ev e serê sê şevan û sê rojan e ez yê li esmanen li te digirim
 Tu ye li erdî li destê min yê dikevî
 Ayy laa min çend cara gote te nerake, nedane disa ha weylo wey cotyaro oyy
 Ay cotê xwîşkan di mal dane
 Dayîka Tahir Şemsîxanê di xewa xwe da dîsa di gundê
 Mala babê wê rebena xwedê dîsa şibî avê xwîn dibare oyy
 Heylê xwîşkê Xan Avdelê delal li gelîkê jêr da dibêje

Xwedêyo, Rabbiyo şerek yê li mala babê min da qewimî
Şeva din wela me yê xewna xwe da dîtî
Xewneke pir giran e
Em ê rabin cotê destmalan destê xwe bigrin
Em ê kevine dîsanê dûv dilbirînên cotê birayano oyy
Ax were were were were lo hey cotyaro oyy
Tahirê Silo wextê gotiye Xan Avdelê delal
Bi sê dangan dikete gazî wez yê bextê te da
Tu yê li bextê xwedê da
Tu yê kozika xwe ji rêka me rake
Tahirê Silo gulek bi bejn û bala Xan Avdelê delal ra berdaye
Wela Kemalê kurê şev bi hevayê barûtê li erdi keftî oyy
Xan Avdelê delal gulek a bi bejn û bala Tahirê Silo re berdaye
Wela serê vê êvarê dîsa li nav gola xwînê digevizyaye oyy
Were were were were hey birîndaro birînkûro
Şemsîxanê lî gundê jerê de hal tenê oyy
Ax were were were were birîndaro birînkûro
Tahirê Silo, egîdê mala giro
Wela birînên te kûr in dîsanê derman lê nehatiyaye oyy
Dê cotê birayan bûne qaçax û firarên dewleta van roman oyy
Ev e serê sê şevan û sê rojan lê tamam nebû
Aha dîsanê dê bine girtiyanê eşîreta me kurdano oyy oyy

(Bêjer: Feysel Koç)

2.1.2.18. Mominê (1)

(Li vir em sê cûre jinan dibînin. Yêk; dayîka dilsoj e. Her tim dilkul, xema xwe û zarok û kesên xwe dikêşe. Çi ji destan bê dike lê car din dawiyê hêstran dibarîne. Du; keç e. Jêhatî, paq û paqij ê. Lê bêbextî lê hatiye kirin. Çiqas ew û hezkiriyên wê hewldana parastina wê biken jî mixabin dawiyê kesên nebaş armanca wan dihêlin bêencam. Ji ber ku keç e û her tim ew sucdar nebe jî dawiyê ew nexwesiyar dikêşe. Sê; jinên din in. Ew jî hinek ji bo buyerê baş fikirin jî çi nakin û yê nebaş fikirin pitir in û denge wan jî yê din bêtesîr dikin. Dawiyê gelek ji wan poşman dibin lê hedî ji bo her tiştî gelek dereng e).

Mominê werde werde

Hey Moma dayê.

Destkûkan ji kevirî berde

Hey Moma dayê.

Xwîn rijiya bi eniya zerde

Hey ciwana dayê

Mominê we ne we ne

Hey Moma dayê

Ma xelkî gazinde ne

Hey Moma dayê.

Ma şivan yarên te ne

Hey ciwana dayê

Mominê koç verêkir

Hey Moma dayê

Rûnişt û kofi çêkir

Hey Moma dayê

Bêriyan bûxtan lêkir

Hey ciwana dayê

Avxerkê xweş zozan e
Hey Moma dayê
Bexê Momê beran e
Hey Moma dayê
Yarê Momê şivan e
Hey ciwana dayê

Avxerkê tî ye tî ye
Hey Moma dayê
Pejanê gulê spî ye
Hey Moma dayê
Miqabil Amedî ye
Hey ciwana dayê

Şertî birakê biçûke
Hey Moma dayê
Sond xwarî bi cuzûke
Hey Moma dayê
Dê Momê kene bûke
Hey ciwana dayê

Şertî birayê navê ye.
Hey Moma dayê
Sond xwarî bi kilamê ye
Hey Moma dayê
Dê Momê dene şû ye
Hey ciwana dayê

Şertî birayê mezin e
Hey Moma dayê
Sond xwarî bi mal û jin e
Hey Moma dayê

Em dê Momê kujin e
Hey ciwana dayê

Qebirkê li nizaran
Hey Moma dayê
Sibeyan û evaran
Hey Moma dayê
Tewaf e li bin guharan
Hey ciwana dayê

Qebirkê li berojan
Hey Moma dayê
Sibeyan û navrojan
Hey Moma dayê
Tewaf e li bin guharan
Hey ciwana dayê

Qebirkê Momê di rê da
Hey Moma dayê
Heçî hat fatihek pê da
Hey Moma dayê
Moma çavreş e tê da
Hey ciwana dayê

Avxerkê bê hîvî ye
Hey Moma dayê
Bêrî dikin şînî ye
Hey Moma dayê
Wey ji bo bêbextî ye
Hey ciwana dayê

Momina Hacî Sînan
Hey Moma dayê
Avkoka nav mesînan
Hey Moma dayê
Melhema ser birînan
Hey ciwana dayê.

Momin 1: Ev bûyer li zozana Avxerkê qewimiye. Momin keça mîrekî kurd yê li devera Geverê bû. Momin êkane bû û sê bira hebûn. Mîrekî din dihat ew ji bo kurê xwe dixwast. Lê Momin ji kurmamê xwe Ehmed hez dikir. Ehmed êtîm û sêwî mezin bibû û şivanê wan bû, Momin jî bêrîvan bû. Bavê Mominê hez dikir ku wê bidete kurê mîrî. Mominê berxikek hebû û dayika wî mirî bû. Mominê berxik dişibande êtîm û sêwîtiya evîndarê xwe Ehmedî. Berxê bê dayîk kezeba wê dişewitand û wê jî her roj carekê memikê xwe dida deve berxikî. Heya ku memikên Mominê bi şîr dikevin û ew jî her roj dide berxî. Her kes bihîstiye ku Momin şîrê xwe dide berxikî. Mîr jî guhdar bibe û ji kurê xwe dixwaze ku dev ji xwastina Mominê berdetin. Bavê wê jî dibihîse û fermana kuştina wê dixwaze. Ji kurên xwe dixwaze ku Mominê bikujin. Hinek ji wan dibêjin Mominê û Ehmedî bidin hev û bila zewicin, hinek jî dibêjin Mominê bikujin. Birayên wê wextekî şevê diçin wê ji zozanê dûr di newalekê de didin ber kêran û xenceran û vedigerin malê. Wê şevê Ehmed di nava xewa xwe de qerîna Mominê dibihîse û bi rêberiya teyrekê diçe û wê dibîne. Car din dema ku ji bo birînen wê giyayan digere teyrik bi qîje qîja xwe ve giyayên ku dê wê baş bikin nîşanê Ehmedî didin. Ehmed bi wan giyayan ve birînen wê derman dike û ji wir diçin. Cihê lê niştêcîh dibin daweta xwe dikin û li wir dijîn. Berxik bi çûna Mominê lawaz dibe, roj bi roj kêr dibe û dimire. Mirina berxikî li ser gundiyan bandoreke mezin çêdike. Ew jî wî radestî axê dikin û tîrbeya wî çêdikin. Demek şûnde Momin û Ehmed jî ji mirina berxikî xeberdar dibin. Momin ducanî dibe lê di encama nexweşiya anîna zarokî de diçe ser dîlovaniya xwe. Li ber van nexweşiyên Ehmed jî bi dilek şewat dawî li jiyana xwe tîne. Li gorî wesiyeên wan her duyan diben li nik tirba berxikî li wir binax dikin. Dayika Mominê jî stranên li ser wan dibêje û heta roja me ev gotin tînin. (Ak, 2016: 574).

2.1.2.19. Mominê (2)

(Li vir de ya herî pêşiyê çavên me dikeve xwedî nederkeftina malbatê ye. Tenê dayîk piştgiriya keça xwe dike. Bira li bin bandora jinên xwe û gotinên bêrîvanan wê bi kuştinê ceza dikin. Keçik hêj da ye biçûk e lê Xwedê kerem lê dike û şîr têxe memikên wê. Berxikê sêwî hêdî dayîkek heye. Lê keçika paq û bêguneh bi bêbextiyan ve rasterast dimîne. Civak guh nadetê û şivanî jî guhdar nakin. Tenê fatûreyê ji bo keçikê dibirin. Ew jî wê fatûreya bêbext bi canê xwe ve radizîne. Dayîka dilsoj û bêkes, kurên bin bandora jinan û gotinên civakê, kesên hesûd û keçeke bêguneh û berxikê ji tunebûna wê mirinê xelasî dibîne. Hemî bi hev re stemkariya jiyanê dide ber me).

Mominê hede hede Momê dayê
Mominê hede hede cana dayê
Tu rûne biskan berde Momê dayê
Tu rûne biskan berde cana dayê
Mominê pez bêrî kir Momê dayê
Mominê pez bêrî kir cana dayê
Şivanan bêbextî kir Momê dayê
Şivanan bêbextî kir cana dayê
Keriyên milan cot in Momê dayê
Keriyên milan cot in cana dayê
Bêriyan xeber gotin Momê dayê
Bêriyan xeber gotin cana dayê
Xwedê dê Momê sojin Momê dayê
Xwedê dê Momê sojin cana dayê
Hey Momê Momê Momê Momê dayê
Hey Momê Momê Momê cana dayê
Keriyên milan sê ne Momê dayê
Keriyên milan sê ne cana dayê
Şivan yên pê da tene Momê dayê
Şivan yên pê da tene cana dayê
Xwedê me Mom nevêt Momê dayê

Xwedê me Mom nevêt cana dayê
Hindî birakê mezin e Momê dayê
Şertî birakê mezin e cana dayê
Sond xwar bi mal û jin e Momê dayê
Sond xwar bi mal û jin e cana dayê
Em dê Momê bikûjine Momê dayê
Em dê Momê bikûjine cana dayê
Hey Momê Momê Momê Momê dayê
Hey Momê Momê Momê cana dayê
Hindî birayê navê ye Momê dayê
Şertî birayê navê ye cana dayê
Sond xwarî bi Xwedê ye Momê dayê
Sond xwarî bi Xwedê ye cana dayê
Xwedê min Mom nevêye Momê dayê
Xwedê min Mom nevêye cana dayê
Hey Momê Momê Momê Momê dayê
Hey Momê Momê Momê cana dayê
Hindî birakê biçûk e Momê dayê
Şertî birakê biçûk e cana dayê
Sond xwarî bi cuzûk e Momê dayê
Sond xwarî bi cuzûk e cana dayê
Momê nakeme bûk e Momê dayê
Momê nakeme bûk e cana dayê
Mexbera nava rê da Momê dayê
Ziyareta nava rê da cana dayê
Heçiyê hat tevrek lê da Momê dayê
Heçiyê hat tevrek lê da cana dayê
Dê Momê kene tê da Momê dayê
Dê Momê kene tê da cana dayê

Çavkanî: Gelêrî. Bêjer: Ayşe Ücar (Ji merhûm Ebûbekîrê Osman guhdarî)

Momin 2: Momin keçeke sêzdeh-çardeh salî bû. Diçû bêrê. Miheke wan zayî û mir. Berxik dimîne bêdayîk. Hindî gundiyan berxik li bin mihên din danandin ku bimêje lê wî berxikî çî mih nemêtin. Momin ye biçûk bû û aqilê wê wekî temenê xwe da şoli. Rabû berxik anî cem xwe û memikê xwe têxist devî wî. Çend rojan wiha kir û Xwedê keremek lê kir. Şîr ketin memikên wê û wê jî berxik xudan kir. Her roj diçû û veşartî şîr dida berxikî. Bêriya digot ‘qey çima memikên wê ewqas mezin bûne, hebe nebe ev keçe ye ducanî ye’. Dema berx berdana nav pezan, berxikî qesta Mominê fikir û wê jî dibir, şîr didayê. Bêbextiya bêrîvanan berdewam kir. Li gorî wan Momin û şivanê gundî bi hev re ne. Ev bêbextî diçe guhe malbata wê. Birayê mezin sonda kuştina wê kir. Birayê nava ji dûv yê mezin çû. Birayê biçûk jî sond li ser bûkaniya Mominê xwar ku wê neke bûk. Dawiyê çiqas dayika wê lê xwedî derkeve jî Mominê ji kuştina destê bira û jinbirayan û bêbextiyên bêrîvanan xelas nake. Dema binaxkirina wê berxik diçe ser gora wê, wê digere. Nûka dizanin ku ji ber mêjandina berxikî şîr ketiye memikên wê û kesan bêbextî lê kirine. Piştî mirina Mominê di demek kin de berxik jî li ser gora wê dimire û li cem wê binax dikan.

(Bêjer: Ayşe Ücar)

2.1.3. Berhemên Çîrokî û Stranî

2.1.3.1. Emer û La'lê

(Rastî ev e serpêhatiyek e di Colemêrgê de qewimî. Her du evîndar binav û deng in. Jiyan bo wan zehmet hatiye lê evîna wan ser her tiştî ketiye. Em di vir de dibînin ku ka çawa eşq û evina jinekê çiqas jiyana xeter li ber çavên mêrîkî xweş kiriye. Jinik çawa bi evîna mêrîkî razî bûye. Her keyf û şahiya dinyevî, her tiştên şênber çawa bêqîmet hiştine li rastî jiyana xwe, eşq û evîna xwe. Heta roja dawîya emrê xwe bi hev re di nava aramiyê de borandine.

Ya herî baş ev e ku herême ev tê zanîn. Dema aşiqên mîna wan dibînin wekî navê wan gazî dikin û nav dikin.

Ji aliyek din ji tiştên herî baş ev e ku mirovên bajarî di nava xwe de ev her du insane xudan kirine. Wekî kesên malên xwe dîtine. Debara wan hilgirtine li ser milên xwe û xudankirina wan wekî kare xwe yê xusûsî dîtine).

Ev e rivayet e, serhatiyek e li devera Colemêrgê çêbûye. Du ciwanan, hejêkirina wan, evîna wan û jiyana wan, dema borî de ew bûyer çawa qewimtiye, çi serê wan hatiye qala wan tê kirin.

Civanekî dibênê Emer navê keçikê jî Tolê ye. Hej yek û di diken û dizewicin. Mihbet û hejêkirina wan gelêk ewqas heye bêhev çi demên rojê naqetînin. Her du jî ciwanên taze ne û ser xwe ne.

Emer eslê xwe Gewda ne. Demek dirêj geliyekê dimînin piştî demek din mala xwe bar dikin û diçin Bêşebabê. Jiyan xwe li wir gelêk diborînin. Hêla aborî de kêmasî û zehmetên wan hene lê mihbet û evîna wan ser her tiştî dikeve.

Wekî hatiye gotin Emer û La'lê tên nasîn lê navên rastî Emer û Tolê ne. Tolê piştî demekê lal dibe. Ev e ne demekê radibin diçine ser germavê. Wê şeve dimînine ser germavê. Derengê şeve gurg li wan miselet dibin. Di nav şerê wan û revda gurgan de çavekî Emerî diteqe. Çavekî xwe berze diket. Vi şerê wî û revda gurgan de tirs û lez û heyecanê de Tolê jî lal dibît. Piştî hindî Tolê diben ni hekîm, mela û pîrejînikan jî Tolê sax nabe û lal dimînin. Şûnde ker û lal yan jî kore û lal tên binavkirin. Ji ber ku Emer çavek û guhekê xwe winda kiriye.

Piştî demekê bar dikin û tên herêma Colemêrgê li merkezê (navend). Merkezê demekê kin li Pîroda dimînin. Piştî hingê bar dikin, diçin Kiranê xaniyên kirê heta

demekê. Piştî hingav ev e bar dikin diçine Xelîla. Gundê Xelîla heye dema diçin bo Xenanîsê. Ser gundê mala Hemdî Efendî. Demekî dumahiyê ve hêdî pîr dibin car din bar dikin û tîn Girikê Paganê avahiyek hebû dimîne wê rê. Bele wê demî gelekî pîr dibin. Zehf destê hev digirtin wekî niha mesela gencên vê demî çawa digirin wisa wan jî digirt. Wi yaştî destê yek digirtin çûne malên cîranan yan jî diçûn sûkê dikanan digeriyan. Miletî alikarî didanê. Jiyana xwe di xîzaniyê de borandibûn lê miletî hinças ew nasdikirin hin hêz jê dikirin û ew jî gel milêtê xwe ewqas tîkildarbûn, miletî heta roja dawiyê berê xwe dida wan. Jiyana xwe heta dawiyê di vî avahiyê de borandin. Pêşiyê Emer emrê xwedê dike paşê La'lê dimire.

Bi eşq û evîna xwe ev ên tîn nasîn û tîn hejêkirin di navber wan de bend jî hatine gotin. Lê mixabin tenê bendên Emerî li ser La'lê gotine me dest xistin. Ew jî ev in:

Hay herê La'lê, Lala min êêê
Hay herê Tolê, Tola min êêê
Ez nedînim negerim li dinyayê
Bê te.
Ne şeva min şev bît
Ne roja min roj bît
Jiyana min halî bît
Çol û çolistan bît
Yêk demê yêk seatê nemînim li dinyayêêê
Hay herê kulîlkêê, kulîlka min êêê
Kulîlk û mihuba dilê min êêê
Ez êê berê xwe bidime mihuba dilê min
Jiyana canê min
Ez êê bê te ne vê dinyayê ne li axretê nemînim nebînim.
Hay herê Tolêêê
Hay herê La'lêêê
Wez çi bikim feqîrî, xîzanî mohra reş eee
Belê demê ez dê berê xwe deme mihuba dilê xwe
Weka nêrgîzên çiya yên Çiyayê Reşêêêê.

(Bêjer: Mahmut Balıkesir)

2.1.3.2. Dirîkê û Jinbira

(Di wê çîroka me de keçekeke ji aliyê jinbirayên xwe ve hatiye buxtankirin dibînin. Mixabin di malbabê de kes ji keçikê guhdar nake. Xirabiyên jin lê jinê dike, bi riya namûsê ve dike û dawîya wê ya herî nebaş hemî riprût pêşîya me ne. Çi di çîrokan de meseleyên wiha borin jî di jiyana rojane de jî hêj ev bûyerên wiha diqewimin).

Dirkek hebûye û gel jinbira xwe çûye balavê. Tûtirkan dibîne, tûtirkan veket û dixwet hemû leke digire. Çîte rex jinbira xwe, jinbira wê dibêjê:

- Te henekê kirî! Te xwe lewitandiye.

- Min henek nekiriye.

Dirik xew dihêlin, tevsiyek avê, tevsiyek xwarinê, dîk, se, pişik, jê ra dihêlane mal da. Malbabi ser dirkê bar kirine û çûyine. Dirkê wextekê xwe hesibî, ji xwe re dibêje:

Dirkê dir çînîne

Paxlê mi'r çikîne

'Ji qala jinbirê xwîn e

Dirka mîr mendan e

Balgihê wê hinban e

Xwara wê laka seya ne

Wextê wiha dibêje, ji xwe ra dibêje;

Dîk ka qîj qîj neke

Pişikê new new neke

Seyo ew ew neke

Dirkê'j xew nerake

Dirka mîr mendan e

Balgihê wê hinban e

Xwara wê laka seya ne

Wisa dibêjê xwe, derkevît pey malbata xwe diçe. Du birakê wê hene, babî wê, diya wê. Pey birakê xwe diçe, yek bûye şivan, yek bûye berxevan babê wî jî bûye gavan. Wextê çîte dev şivanî dibêjêtin;

-Ho şivano, tu salûqê mala baban nadey?

Şivan't bêjîtin:

- Mala baban çi nîşan e?

Bêjîtin:

Mala baban babo pîr û kal e

Dado reş û çal e

Her du bira şûr û mertal in

Her du jinbira benîguhar in

Ew jî xwişka xwe ceribînît, ka xwişka wî rasti henek kiriye an ne! Bêjîtê

- Henekekê de min ez dê bideme te salûqê baban.

Ew jî ser ra dibêjît:

Dirkê dir çinîne

Paxlê mi'r çixlîne

Qala jinbirê xwîn e

Dirkê naket tu henekan

Dê xwe bavête ger û gerînekan

Rex wî birayî diçe û rastî birayê dî tê, dibêjîtin;

- Ho berxevano! Tu salûqê mala baban nadey?

Bêjîtin:

-Mala baban çi nîşan e?

Bêjîtin: Her du jinbira benîquhar in

Her du bira şûr û mertal in

Dadê reş û çal e

Babê pîr û kal e

Ew jî dibêjît:

-Henekekê de min ez ji te ra bejim.

Dibêjîtin:

Dirkê naket çi henekan

De xwe bavête ger û gerînekan

Diçît derbas dibît rastî babê xwe têt. Babê wê jî eynî tiştî jê re't bêjît, jê bawer naket, vêca dibêjîtin:

- Em çi bikenê, em biçin bînin her du jinbirêt wê ciza biken.

Hespekê têhn diken, yekê bi su'd ken, giyayi danine ber yê têhn avê danina ber yê su. Lingê jinbirayekê hespekê ve yê di jî hespê dî ve girê diden. Yê avê bezîte avê, yê dî jî bezîte yê dî, jinîk hûr hûr diket. Dir jî çîte devê çemî, xwe tazî diket û xwe tavête gerînekan.

Êdî ez nizanim di gerinekan de dimîne an diçe.

(Bêjer: Asım Özcan)

2.1.3.3. Dirik

(Di wê çîrokê de wekî çîroka me ya car din bêbextî ji aliyê jinbirayê ve li xwîşka heft birayan tê kirin. Cizakirina kesên xirab wê çîrokê de jî wek ya din e. Lê cidahiya baş ev e ku wê çîrokê de dayîk keça xwe diparêze. Dawiyê de jî keçik xwe naavête gera avê de, xwe nakuje).

Heft bira û dayika dirikekê hebûn, çûne ber avê helhelokên daran ve, çû cil raêxistin, helhelok jî kirine danga xwe û înan. Helhelok sor in, mane danga wê ve. Jinbirayê got:

-Ew çi ye danga te ve, xwîn e?

Çû malê heft birayêt wê ra got:

-Dirikê xwe kirêt kiriye, dirikê xwe rezil kiriye.

Gotin: hûn zanin em dê ku biken; êk dê bîte şivan, êk dê bîte berxvan, êk dê bîte aşevan, êk bîte cotyar, êk bîte gavan, êk bîte pale, em dê dîkilê xwe û tajiye bo dirkê hêlin em dê vê warî bar ken. Bila dirik mînîte xewê da em dê cilêt xwe guhirînin. Bila dirik ber me da bêt biborît. Em dê ceribînin, heke fikra wê ya pîsatiyê bît dê belî bît, heke ya pîsatiyê nebû em dê ket û ket êcar dora wê. Rabûn bar kirin, dirik girtine xewê da. Dîkilkê xwe û tajiya xwe hêlandin. Du sê rojan dirik ma xewê da, ciniqî ne war ne malî. Dîkil maye tajî maye, kes nemaye. Derket wê ve çû, çû berê xwe dayê şivanek wêvetir dest û çavêt xwe pêçanin, got:

-Şivano şivano!

- Ha lebê, ka koçêt babano?

- Koçêt baban çûne Mûşê.

Got: Akrê wan reşepêl e

Hûr hûr ke devê le

Dirkê xew de pêle

Tajiye zûzû neke

Dîko qîqî neke

Dirkê xew nerake

Gotê: Henekekê bide min ez dê bo te bêjim.

Gotê: Serê bab û kekan

Nakim çi henekan

Xwe tavême av pêlekan

Şivan çû û got:

-Temam, ev e ya xirabiyê nîn e.

Çû yê dî eynî, yê dî eynî, heta çû ya herî dumahîkê, got:

- Ho gavano, neçû koçêt babano?

Got: Koçêt baban çû Mûşê.

Got: Karikêt wan reşepêl e

Hûr hûrke bivire

Dirkê xew de pêle

Got: Henekekê de min ez dê bo te bejim.

Got: Serê bab û kekan

Nakim çi henekan

Xwe pavêm avpêlekan

Dirka mîr mendal e

Xwişka heft bira ne

Jinbirê gotê xwîn e

Daykê got derewîn e

Got: Here ev e ne koçêt baban

Hatin hatin ser yê heftê sekînîn

Gotin:

- Wele derew e! Em dê çi bikin? Em dê çin hespekê têhnî ken, êkê birsî ken.

Ev ê jinbirayê bêbextî xwişka me kiriye. Em dê dersa wê bidene.

Êk birsî kirin êk têhnî kirin, ew şeqepîlo kirin, xwişka xwe jî hilgirt û birin.

Aha ev e ez jî hatim tişteke nedane min, siheta we jî xweş...

(Bêjer: Fahri Ücar)

2.1.3.4. Feqe

(Di wê berhemê de keçeke wekî Xatûna di destana Zembilfiroşî de tê pêşiya me. Navê wê ne diyar e, lê tê gotin 'Qîza melê'. Wekî Xatûnê ew jî hêstên xwe aşîkar tîne zimên. Ewqas li Feqeyê zewicî re evîndar dibe ku derdê hewiyê jî qebûl diketin. Lê yê pozbilind e jî. Eger ji aliyê Feqeyî ve neye xwestin, ne Feqeyî ne jî sin'etê wî li gundî naxwaze).

Lawek hebû navê wî Feqe bû. Feqe û hevalên xwe gund bi gund geriyan, erbane lê didan. Jinik, gundi lê kom dibûn, kêfa wan diînandin. Wan jî nivîşk, keşk û tiştên wisa danê.

Rojekê ev Feqe çû zomekê. Feqe lawek gelek jêhatî bû. Kiça melayî li wê zomê bû. Digotinê Qîza Mela. Feqe jî nav feqe bû heke ne îlmdar bû. Kiça mela berê xwe didetê Feqe ev e hat ne dilekê sed dila lê aşiq dibe. Kurikî haj li kiçekê nebû. Keçik kefte dûv kurikî. Kî erde kurik diçûyê ew jî diçû û rast singê kurikî rûnişte xwarê. Dawiyê diçe kunê dawiyê û ji wir jî da çîte zomek dî. Wextê keçikê zanî dê ji wêrê çît, kiçkê çû karşiyê wî bendek pê ve got:

Feqe lo lawo,

Heke tu gul î, ez rihan im.

Heke tu sosîn î, ez beybûn im.

Heke tu sûk î, ez dikan im.

Belê ez hal hawalet te nizamim.

Here lo lo.

Feqe lo lawo,

Bejna min rebenê ne kin e ne dirêj e,

Fenanî çiçekê canamergê beroj e,

Roj bi rojê xwe diavêje.

Feqe lo lawo,

Xwezî xera Xwedê mîrê mirada,

Min zanîba ka ca esaletê te tu ji ku yî?

Kurikî cab dayê:

Herê qîza melê

Heke tu suala esaleta min ji min bikî

Ez xelkê gundê Qestemanê me

Dibêjine min Feqe
Kurê Hesenê dengbêj im
Here lo lo.
Keçikê gotê: Feqe lo lawo
Kaniya gundê me li wî gundî
Birek kewên narincî ser da difirincî
Xwezî min zaniba ka ca tu ezebî an zewicî?
Kurikî gotê: Herê qîza melê
Heke tu sualê zewacina min ji min bikî
Ez yê xelkê gundê Qestemanê zewicî me
Wela heft jî heyranên min şîbî te hene.
Keçikê got: Feqe lo lawo,
Bejna min rebenê wê şîn dike şeva din
Dara biyê ser kaniyê.
Tu were min ji xwe ra bixwaze
Ez dê çend saleka qalê bêgarê
Qebûl bikim ser hewiyê
Here lo lo.
Feqe lo lawo
Were min bixwaze ji xwe re
Eger min nexwazî
Saz û sin'etê xwe hilde ji gundê me here.

(Bêjer: Hüseyin Kazak)

2.1.3.5. Eşîr

(Wê berhemê de tê dîtî ku jinek bi delalî û wêrekiya xwe ve çawa li hember mêran serbilind sekiniye. Çend zorî û zilm lê hatibe kirin jî bes nekiriye û ber xwe didaye. Eşîr keçek e, ji kurdên Îranê ye. Navê yê Eşîr ji bo çine lê nehatiye danandin. Navê wê netewa wê temsîl dike. Yê ku li serê netewa wê tên kirin ji aliyê netewên din ve di kesayeta wê de tê îfadekirin. Serîrakirina wê vê temsîl dike. Lê ne tenê ev e, bendên ji bo lawê bo evîndar jî hêz çêkirine. Lawik di riya wê de her gotinên wê bi cih anîne).

Keça camêrekê hebû navê wê Eşîr bû. Xelkê, Kurdê Îranê bû. Tixûbê Îranê bûn. Hindê hin yê delal bû, dengê delaliya wê çû şahê Îranê jî. Şahê Îranê got:

-Ka ev e kîşk e? Ew ê bînin nîşa min û neviyê min biden. Ca ez bo neviyê xwe bixwazim.

Înan nîşa şahê Îranê dan wî gelek begenkir. Neviyê wî jî got:

-Eger ev e ya min bît, bila Kurd bît. Îlah bo min e. Şahê min wê bo min bixwaze.

Keçikê gote şahi:

-Ez şû wî nakim.

-Bo çi?

-Çimkî tu û neviyê xwe dijminên min in. Ez Kurd im hûn Ecem in. Ez dê şû bi kurdekî bikem bila feqîr bît, belê Kurdê eslî bît.

Şahi qebûl nekir. Keçik kire hefse da. Du salan ma hefsê da. Mektubek bo şahê Îranê rêkir. Gotê:

-Sed sal dî ez li vir de bim, ez navê te gulê dibim û aciz dibim. Ez wê qebûl nakim. Sed sal din ez dê vir bim lê te û neviyê te qebûl nakim.

Şahê Îranê gazî wezîrên xwe kir. Gotê:

-Ev e mektuba wê ye. Min zulm ya lê kirî. Neviyê min dibêje îlah bo min e. Ev dibêje min ne tu divî ne jî neviyê te. Hûn dijmin in.

Wezîran gotê:

-Madem tu û neviyê te nevêt û hûn dijmin in divê hûn wê nefînin. Rabin berdin.

Rabûn berdan. Keçik çû mala xwe. Mala wan tam tixûbê Îranê bû. Tam pêş gundê xwe û mala xwe bibû pezê rexê Tirkan û Îranê ketin navêk. Xudanê berxkan

diçîtê lê neşêt cuda biketin. Wê gavê keçikê dibîne û xwe dide nasîn. Wextek şûnde dibêjite keçikê:

- Ez hatime dilê min li ser te ye.

Keçik dibêjît:

-Şahê Îranê ez xwestime bo neviyê xwe min şû pê nekiriye.

Kurik dibêje:

-Ez dixwazim tu bo min bî. Heke te dil pê heye ez dê bêm te bixwazim.

-Wela min haj te nîn e, belê me edetek heye. Eger tu aşiqê min î, bendekê bi min ve bêje.

Kurik gotê:

-Temam.

Kurik rabû çû Mûşê. Çû dev dengbêjan. Fotrafê wê bir û çû. Wan jî stranek nîşa kurikî dan. Wextekê ma li wir. Heta bo xwe stran zanî vegeriya ve. Gote keçikê:

-Were min stranek bi te ve gotiye. Eşîrê canê tu were karşiyê min rûne xwarê.

Tu bêje kuriko ka ca bejn û bala min çawa ne.

Keçik hat û gotê:- kuriko ka ca bejn û bala min çawa ne. Ez çawa delal im?

Kurikî gotê:

-Eşîrê canê ez ji te re sond bixwim

Bejna te ne hevala çi bejna ne

Pêyên te nazik û biçûk in

Layiqê qundira, solan û mehsan e

Kemera piştê te balîf e

Navtenga te zirav e

Layiqê kemera zêran e.

Singê te nerma latîf e

Mîna doşeka taze derkeftî bo me

Li hemî şehran e.

Cotê memkên te mînanê cotek sêvan e

Gerdena te spî dîke ser bedena kişyayî

Mirov dibêjît berfa serê çiya ne

Çena te mirov dibêjît te ra îstikan e

Devê te biçûk in levên te dibêjît qeytan e.

Çav û biriyên te reş in
 Malxirabê mînanî kewan e.
 Eniya te qudreta Rebê alemê mirov dibêjî meydan e.
 Pora nava serê te
 Rasta bedena te sekinî
 Mirov dibêjît kepra firinga ne
 Êqîna te Xwedayî bêt hindî min ji te ra gotî car û nîv
 Hin jî di dilê min de mane.
 Keçikê gotê: Pekî ew car û nîv çî ne? Êê tu dê wê jî bo min bêjî.
 Kurikê gotê:
 -Eşîrê canê ez ji te re sond bixim
 Bejna te bilind e
 Çav û biriyên te belek in
 Eniya te kever e
 Tilên te nazik û malmidûn e
 Rabe derkeve derê malê
 Ba tê, behna gulan behna çiya kepiyê te xweş bûne
 Tu here nava baxçe gula sebra xwe pê bîne.
 Gerkî dilê te xem e qelbê te xemgîn e
 Belkî Xwedê Rebê alemê
 Derman û melheman bihebîne
 Mirad û mesqedên te hasil ket
 Xemên dilê te birevîne.
 Eşîrê canê were ez dê ji te re sond bixim
 Ev e çend sale hevesa min raza bû
 Te qelbê min hejand û xew hişyar kir
 Te dilê min evdalê xwedê te sê derba birîndar kir
 Ez dê ji te re sond bixim
 Destê xwe kilamê qedîm bidem
 Heçiyê ji te re hevaltiyê dike û bo xwe bibet
 Dunyayê axretê tev jî kar diketin.

(Bêjer: Hüseyin Kazak)

2.1.3.6. Cînar

(Di wê berhemê de dibînin ku kurik di serî de çiqas bersiva erênî wernegire jî li pey evîna xwe diçe. Ev biryara wî dayî dawiyê ji aliyê keçikê bersiv dibîne. Şûnde diçe leşkeriyê û tê. Lê dibîne ku her tişt wek berê nîn e.

Lehenga me Cîran bi delaliya xwe ve nav kiriye. Xewn û xeyalên kurikî dixemilîne. Bersiv dide eşqa kurikî lê belê şûnde bîryarek ne ji dilê wê lê têt dayîn. Rondik rijandina wê de em wê encamê derdixînin.

Ji xeynî Cîranê kesa jin em dayîka wê dibînin. Ew jî bi gotinên kurikî ve derdikeve holê ku kesek nebaş e. Hesudiya wê kirî her du evîndaran jêk diqetîne).

Kiçkek gundekê hebû, babê wê navê wê kiribû Cînar. Kiçkek gelek jêhatî bû. Kurkek jî li wi gundi hebû. Ev gunde aliyê Gewerê, navê gundi Nêbarî bû. Kurik dilê wi kefte ser kiçkê û gelek hej kiçkê kir, kiçkê hejê nedikir. Kurik aliyê kiçkê ve diçîtî û bêjîtê:

-Were ez ê te bo xwe xazim şû min bike.

Kiçik bêjîtî:

-Riziyê şîbî te zahf in. Min şû kirba heta nehe deh caran min şû kirbû. Kurik bejîtê:

-Çawan min jî asalatek û rûyekî paqij heye. Ez jî tolazek taze me. Malbata min heye ma çi kêmasî li min heye? Kiçkê gotê:

-Nexêr dinya xirab bîtin ez şû te nakem.

Kurik çû, keçikê pez da bêrê, bihar bû. Gopalek dest da bû, kofiyek serî bû. Keçik çav birî reş û navteng zirav bû, kurik jî bedew bû lê dilê wê nebû. Kurik çû pêş bêrê ve li ser serê berekê rûnişt û bi dilê sotî dest avête stranê.

Gotê:

-Cîran canê bihar e xweş bihar e

Min dît cînara min bejn bilind e, çav belek e, kofî xwar e.

Tobe singê cînara min ji min re zozanên jorî mihte dil e

Cîran canê dilê min heçkû ji du gula bîrandar e bo te.

Cîran canê havîn e xweş havîn e

Min dît cînara min derkeftiyê derê mala babê xwe digere xwe dihejîne

Tobe gava kumla çavên min te dikeve

Hişên min diçe aqil serê min namîne

Cîran canê payîz e xweş payîz e

Min dît zozanên jorî befir barî terazina girtin hus û buz e

Belê wela çi bikem diya te fesad e babê te xweş ezîz e.

Pişî van bendan dilê kiçikê dikevîte kurikî. Keçikê gotê:

-Belê wela here ekseriya xwe bike û were, ez dê şû te bikem.

Kurik rabû çû ekseriya xwe. Heta hatî kiçik dabûne yek din. Şeytan keftibûn arayê. Da wê şeytan hatibû navkirin. Dema bû bihar dê bên kiçikê dê ben. Kurikî gotê:

-Cîran canê heçkî orta min û Cînara min xirab kirî

Hiviya min ji Rebê alemê axreta xwe de bêîman be

Çi car ser dinyayê xêr û xweşiyên canê xwe nebîne.

Belekên befrê ketine çiyayî. Kurikî zanî wext hatiye bo birina wê. Gotê:

-Cîran canê bihar e

Belekên befrê xwe kişyane

Mehelê xatira xwe dane serî giran

Min nezanî îro sê rojê kê çi gotiye cînara min

Çav û biriyên reş û belek xalî nabin ji rondikan.

(Bêjer: Hüseyin Kazak)

ENCAM

Stran û çîrok cureyên cuda yên wêjeya gelêrî ne. Ji aliyê civakê ve gelek tiştan di hundirê xwe de vedişêrin. Hem kesên wê civakê bi xwe û hem jî kesên biyanî bi riya van berhemên hunerî ve wê civakê nas dikin.

Her du cureyên wêjeya gelêrî jî pêşiya nivîsê di nav kurdan de dest pê kiriye. Bi devkî di nava civaka kurdan de li xwe dewam kirine. Çîrok bi giştî li ser lêvên jinan xwe xwedan kiriye. Nifş bo nifş hatine gotin. Stran bi riya her du zayendan ve jî tên gotin. Her du cure jî hestên wekî eşq, evin, xem, xweşî-nexweşî, başî-xirabî, aqilbarî- bêaqilî, lehengî û hwd parve dikin. Taybetiya hinkerî jî di xwe de dihevin. Ji ber ku riyên nû, fikirên nû danîne pêşiya mirovan.

Di xebatê de gelek berhem hatine berhevkerin. Lê me ji nav van berhemên çîrok û stranên gelêrî yên nasnameya jina kurd nîşanê me didin jê girtin. Di her cureyê de temsîlkirina wê bi şiklekî cuda tê pêşiya me. Nêzîkî çil û pênc berhem hatin berhevkerin û tenê çend heb ji varyant manê tên pêş me. Hemî berhem bi deng û nivîsî hatin qeydkirin. Di hinek berhemên nasnameya me ya jinê; baş e, hinekan de xirab e, hin rêveber e, hin bindest e, hin pîrek e hin mirovxxwer e, hin dayîka dilsoj e. Hin cihan jî jinbab, jinbira û xwîşkên neyar in. Yanî her şiklî ve tê pêşiya me.

Di şûna xebatê de em dibînin ku rewşa jina kurd di hin cihan de bi erênî pêş ve ketiye, di hin cihan de jî bi neyînî paş ve ketiye. Bi civakî, perwerdehî, hiqûqî û zanyarî ve pêş ve çûyiye. Lê mînak bi rêveberiyê ve paş ve ketiye. Armanca me jî rewşa jinê ji berê heta ku roja me danasînkiribûn bû.

Ji ber ku di kurdî de di karê berhevkarîyê de çî xebatên berfireh û biteferûat yên wêjeyî û gelemperî jî bi vê naverokê ve nehatine kirin dibe ku kêmasiyên me jî hebin. Lê ev xebate jî bona vî karî belkî bibe pêngavek.

Dema destpêkirina xebatê de hat dîtin ku herêma ji aliyê çavkaniyan ve gelek dewlemend e. Lê kêmasî ew e ku hêşta vebêjî di rewşek devkî de diçe. Lê divê neyê jiberkirin ku eger nivîs nebe dê ev xizineyên henê bîn windakirin.

Pirsgirêka hatî pêşiya me ne tenê ew e bû. Rast e, jinan gelek tiştan de xwe pêşve birine. Lê tena serê xwe ev têra naketin. Jiyan ye hevpar e. Her du zayendan hewcehî li hev du heye. Ya herî rastirin jî ew e civak û mirovahî gelek tê avakirin û azadkirin. Eger tê xwestin ku civak bê astek bilind û pêşveçûyî, divê jin piştgiriya

jinan bikin. Ev jî ne bes e, ji ber ku nîviya din maye. Eger tê xwestin ku cîvak, mirovahî û dinya bibe cihek bêhempa divê zilam jî alîkarî bidin wan. Bi kurtasî;

Eger tê xwestin ku jin û nasnameya jinê pêş bikeve, divê ne tenê bi serê xwe berxwedanê bike. Divê bi civakê ve, bi bilindkirina sewiya çand û perwerdehiyê ve ser bikevin. Bi encama vê pêngavê ve jin û nasnameya wê di riya hevçax, ronîdar, aqlane û wekhev de dê pêş ve bidetin.

ÇAVKANÎ

A. Çavkanîyên Esfî

- Adak, Abdurrahman (2011). “Erdalanlı Bir Kadın Saray Şairi: Mahşeref Mesture Hanım (1804-1847)”. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi (1-5 Ekim 2009)* (amd. Vahit Tane ve Kemal Varol). Hakkâri. Hakkâri Üniversitesi Yayınları. r: 131-143.
- Adak, Abdurrahman (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Ak, Wasfi. (2016). *Çil Kelatên Kurdistanê*. Wan: Weşanên Sîtav.
- Alakom, Rohat (2009). *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Alakom, Rohat (2005). “Yirminci Yüzyılın Başlarında İstanbul’daki Kürt Kadınları”. *Devletsiz Ulusun Kadınları. Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*. (amd. Shahrzad Mojab. wer. Fahriye Adsay û nd.). Stenbol: Weşanên Avesta. r: 75-100.
- Albayrak, Nurettin (2004). *Ansiklopedik Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: L&M Yayınları.
- Alış, Ahmet (2011). “Türkiye’de Kürt Kadını ve Siyasi Tarih-siz-liği 1959-1974”. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi. (1-5 Ekim 2009)*. (Amd. Vahit Tane ve Kemal Varol). Hakkâri: Hakkâri Üniversitesi Yayınları. r: 208-213.
- Allison, Christine (2005). “Folklor ve Fantezi: Kürt Sözlü Geleneğinde Kadınların Sunumu”. *Devletsiz Ulusun Kadınları. Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*. (amd. Shahrzad Mojab. wer. Fahriye Adsay û nd.). Stenbol: Weşanên Avesta. r: 245-263.
- Anonim (1976). *İnsan ve Toplum I. Gelişim Genel Kültür Ansiklopedisi*. İstanbul: Gelişim Yayınları.
- Anonim (1993). *Temel Britannica, IX*, İstanbul: Ana Yayıncılık.
- Arslan, Tarık (2000). “Tarihte Kadın ve Kadın Hakları”. *Yabancı (Biyânî). Kültür-Sanat-Edebiyat Dergisi*. 1 (Nisan): 17-21.
- Artun, Erman (2014). *Ansiklopedik Halkbilimi/ Halk Edebiyatı Sözlüğü Terimler-Motiifler-Kavramlar*. Adana: Karahan Kitabevi.
- Aslan, Mustafa (2011) *Kürt Kadınının Toplumsal Statüsü*. Uluslararası Kürt Kadın Kongresi 1-5 Ekim 2009 Hakkâri. weş. Hakkâri Üniversitesi. amd. Vahit Tane ve Kemal Varol. r: 113-122.

- Ayata, Ayşe Güneş (2015). “Türkiye’de Kadının Siyasete Katılımı”. (Ed. Şirin Tekeli). *1980’ler Türkiye’de Kadın Bakış Açısından Kadınlar*. İstanbul: İletişim Yayınları. r: 261-278.
- Aydoğan, İbrahim Seydo (2011). “Di Metbexa Ziman û Wêjeyê de Jina Kurd”. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi. (1-5 Ekim 2009)*. (Amd. Vahit Tane ve Kemal Varol). Hakkâri: Hakkâri Üniversitesi Yayınları. r: 65-81.
- Bedirxan, Celadet Elî (2009). *Ferheng (Kurdî-Tirkî)*. Stenbol: Weşaneên Avesta.
- Bedlîsî, Şerefxan (2007). *Şerefname*. (Wer. Ziya Avcı). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Beşikçi, İsmail (1969). *Doğu’da Değişim ve Yapısal Sorunlar*. Ankara: Doğan Yayınevi
- Bruinessen, Martin van (2005). “Adile Hanım’dan Leyla Zana’ya Kürt Tarihinde Siyasi Liderler Olarak Kadınlar”. *Devletsiz Ulusun Kadınlar: Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*. (Ed. Shahrzad Mojab). (Wer.: Fahriye Adsay hd). İstanbul: Avesta. r: 139-153.
- Boratav, Pertev Naili (1973). *100 Soruda Türk Folkloru*. İstanbul: Gerçek Yayınevi
- Colemêrgî, Îhsan (2001). *Cembelî Kurê Mirê Hekaryan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Diljen, Haydar û n.d. (2014). *Dergûşa Nasnameyê*. Wan: Weşanên Sîtav.
- Ecevit, F. Yıldız (2015). “Kentsel Üretim Sürecinde Kadın Emeginin Konumu ve Değişen Biçimleri”. (Ed. Şirin Tekeli). *1980’ler Türkiye’de Kadın Bakış Açısından Kadınlar*. İstanbul: İletişim Yayınları. r: 105-114.
- Edgü, Ferit (2019). *Hakkari’de Bir Mevsim*. İstanbul: Alfa Yayınları.
- El Saddavi, Nevval (2018). *Sıfır Noktasındaki Kadın*. (Wer. Selma Demiröz). İstanbul: Metis Yayınları.
- Ergül, Selim Temo (2011). “Modern Kürt Kadın Şairleri”. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi. (1-5 Ekim 2009)*. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi. (1-5 Ekim 2009)*. (Amd. Vahit Tane ve Kemal Varol). Hakkâri: Hakkâri Üniversitesi Yayınları. r: 60-64.
- Evdirehman, Elîyê (2012). *Xatê Xanim*. Amed: Weşanên Lîs.
- Farqînî, Zana (2004). *Ferhenga Kurdî-Tirkî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Farqînî, Zana (2012). *Ferheng*. Stenbol: Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.
- Ferat, Bawer (2016). *Dewrêş île Adûle*. İstanbul: Weşanên Yurt.

- Fichter, Joseph H. (2002). *Sosyoloji Nedir*. (Nilgün Çelebi). Ankara: Anı Yayıncılık.
- Galetti, Mirella (2005). “Kürt Toplumunda Kadınların Rolü Üzerine Batılı Tasvirler”. *Devletsiz Ulusun Kadınlar. Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*. (Amd. Shahrzad Mojab. Wer. Fahriye Adsay ü nd). Stenbol: Weşanên Avesta. r: 283-305.
- Gemi, Ahmet (2011). “Berdel: Kürt Kadınının Kaderle İmtihani”. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi. (1-5 Ekim 2009)*. (Amd. Vahit Tane ve Kemal Varol). Hakkâri: Hakkâri Üniversitesi Yayınları. r: 20-26.
- Goldstein, Kenneth S. (1983). “*Sahada Folklor Derleme Metotları*.” (Wer. Ahmet E. Uysal). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Gök, Fatma (2015). “Türkiye’de Eğitim ve Kadınlar”. (Ed. Şirin Tekeli). *1980’ler Türkiye’sinde Kadın Bakış Açısından Kadınlar*. İstanbul: İletişim Yayınları. r: 161-175.
- Hesen, Şerzad (2011). *Jineke Xinanî*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Hür, Ayşe (08.03.3009) “Sizin Kahramanınız Hangi Kara Fatma”. Taraf.com.tr, <http://www.taraf.com.tr/yazilar/ayse-hur/sizin-kahramaniniz-hangi-kara-fatma/4405/> d.g. 08/02/2019.
- Kaplan, Yaşar (2015). *Kanîya Stranan*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Kılıç, Dünder Ali (2011). *Hakkâri Tarihi*, Hakkâri: Hakkâri Valiliği Yayın (6), r: 57
- Korkmaz, Engin (2018). *Hakkari’de Aşiret ve Siyaset İlişkisi (1880-2011)*, Wan, Sitav.
- Lescot, Roger (2010). *Destana Memê Alan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Mojab, Sharzad (2005). *Devletsiz Ulusun Kadınları*. (Wer. Fahriye Adsay). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Sezen, Lütfi (2005). “Türkiye’de Evlenme Biçimleri”, *A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*. (27):185-195.
- Sönmez, Nesim (2017). “Mesture Mahşeref Hanım’ın Hayatı”. *Sosyal Bilimler Dergisi*. 4 (15): 308-315.
- Tan, Sami n.d. (2010). *Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*. İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.
- Tek, Leyla (2011). “Ferit Edgü’nün Roman ve Öykülerinde Kadın”. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi. (1-5 Ekim 2009)*. (Amd. Vahit Tane ve Kemal Varol). Hakkâri: Hakkâri Üniversitesi Yayınları. r: 273-283.

- Tekeli, Şirin (2004). On Maddede Türkiye’de Kadın Hareketi. 20 Ocak 2007. <http://www.turkhukusitesi.com/showthread.php?t:2740&page:2> d.g. 11/06/2019.
- Tekeli, Şirin (2015). *1980’ler Türkiye’sinde Kadın Bakış Açısından Kadınlar*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Tekeli, Şirin. (2004). Yeni Dalga Kadın Hareketinde Örgütlenme. 20 Ocak 2007. http://www.ucansupurge.org/index.php?option:com_content&task:view&id:749&Itemid:69 d.g. 11/06/2019.
- Top Mehmet (2011). *Hakkâri*. (Ed. Mehmet Top). Hakkâri: Hakkâri Valiliği Yayınları.
- Xanî, Ehmedê (2017). *Mem û Zîn*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Wedel, Heidi (2005) *İstanbul’a Göç Eden Kürt Kadınlar: Cemaat ve Marjinalleştirilmiş Bir Sosyal Grubun Yerel Siyasete Katılımının İmkanları*. amd. Shahrzad Mojab. Devletsiz Ulusun Kadınları. Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar. wer. Fahriye Adsay û nd. weş. Avesta, İstanbul, r: 155-182.
- Yalçın, M. Halit (2017). *İnsanlığın Ortak Aklı*. İstanbul: Kent Işıkları Yayınları.
- Yalçın-Heckmann, Lale (2016). *Kürtlerde Aşiret ve Akrabalık İlişkileri*. (Çev. Gülhan Erkaya). İstanbul: İletişim Yayınları.
- Yalçın-Heckmann (2015). “Aşiretli Kadın: Göçer ve Yarı Göçer Toplumlarda Cisiyet Roller ve Kadın Stratejileri”. (Ed. Şirin Tekeli). *1980’ler Türkiye’sinde Kadın Bakış Açısından Kadınlar*. İstanbul: İletişim Yayınları. r. 247-258.
- Yaşar, Tahir (2011). “Hikayeli Şarkılarda Kürt Kadınında Aşk ve Sadakat”. *Uluslararası Kürt Kadın Kongresi. (1-5 Ekim 2009)*. (Amd. Vahit Tane ve Kemal Varol). Hakkâri: Hakkâri Üniversitesi Yayınları. r: 355-360.
- Yıldırım, Kadri û n.d. (2013) *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, weş. Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, ç:1, İstanbul, r: 135-136.
- Yûsif, Ebdurleqib (2012). *Şaîrên Klasîk ên Kurd*. Stenbol: Weşanên Dîwan.
- Zeki Beg, Mehmed Emin (2013). *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*. (Wer. Muhammed Ali Avni, Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan). İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Zilan, Reşo, Roşan, Serdar (1996?). *Destanên Kurdî -Ji Zargotina Kurdî-*. Stockholm: Weşanên Weqfa Kurdî ya Kulturî ya Stockholmê.
- Zinar, Zeynelabidin (1991). *Siyabend û Xecê*. Stokholm: Weşanên Pencînar.
- Hakkari.ktb.gov.tr. /TR-158549/hakkari-tarihi.html

<https://wqferheng.tr.uptodown.com/android/download>

B. Çavkaniyên Zindî

1. Nav Paşnav: Ayşe Uce
Temen: 1953
Perwerdehî: Nexwendî
Karê wî/wê: Bermalî
Dayîkbûn: Bêşebap
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

2. Nav Paşnav: Amina Adıyaman
Temen: 1943
Perwerdehî: Nexwendî
Karê wî/wê: Bermalî
Dayîkbûn: Gundê Makîtana
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

3. Nav Paşnav: Ayşe Ücar
Temen: 1942
Perwerdehî: Nexwendî
Karê wî/wê: Bermalî
Dayîkbûn: Bêşebap
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

4. Nav Paşnav: Selim Şen
Temen: 1963
Perwerdehî: Nexwenda
Karê wî/wê: Pişeya serbest
Dayîkbûn: Gever
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

5. Nav Paşnav: Halil İbrahimoglu
Temen: 1959
Perwerdehî: Dibistana Amadeyî
Karê wî/wê: Teqawid
Dayîkbûn: Silehê/ Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan guhdarî

6. Nav Paşnav: Kenan Çiftçi
Temen: 1992
Perwerdehî: Zanîngeh
Karê wî/wê: Endezyar
Dayîkbûn: Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji dapîrkê guhdarî

7. Nav Paşnav: Hüsni Kazak
Temen: 1964

Perwerdehî: Dibistana Dawî
Karê wî/wê: Bazirgan
Dayîkbûn: Başkale
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

8. Nav Paşnav: Emine Adıyaman
Temen: 1959
Perwerdehî: Nexwendî
Karê wî/wê: Bermalî
Dayîkbûn: Bêşebap
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

9. Nav Paşnav: Ebubekir Öztunç
Temen: 1956
Perwerdehî: Nexwendî
Karê wî/wê: Bêkar
Dayîkbûn: Bêşebap
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

10. Nav Paşnav: Nimet UÇAR
Temen: 1974
Perwerdehî: Dibistana Sereke
Karê wî/wê: Bermalî
Dayîkbûn: Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji dayika xwe.

11. Nav Paşnav: Hüseyin Armut
Temen: 1980
Perwerdehî: Zanîngeh
Karê wî/wê: Xwendekar
Dayîkbûn: Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji bapîrê xwe

12. Nav Paşnav: Yasin Tertemiz
Temen: 1981
Perwerdehî: Zanîngeh
Karê wî/wê: Karmend
Dayîkbûn: Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji bavê xwe

13. Nav Paşnav: Turan Harmancı
Temen: 1970
Perwerdehî: Zanîngeh
Karê wî/wê: Bazirgan
Dayîkbûn: Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

14. Nav Paşnav: Mahmut Balıkesir
Temen: 1955

Perwerdehî: Dibistana Amadeyî
Karê wî/wê: Teqawid
Dayîkbûn: Pîroda/ Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji mamê xwe merhûm Kasım Balıkesir

15. Nav Paşnav: Hatem Cankurtaran
Temen: 1939
Perwerdehî: Nexendî
Karê wî/wê: Bermalî
Dayîkbûn: Kerpêl/ Gever
Ji kî guhdar kiriye: Xwe çêkiriye û pê gotiye.

16. Nav Paşnav: Mehmet Uçar
Temen: 1969
Perwerdehî: Dibistana Amedeyî
Karê wî/wê: Belêndar
Dayîkbûn: Bêşebap
Ji kî guhdar kiriye: Ji cîrane xwe Hamît Orhan.

17. Nav Paşnav: Feysel Koç
Temen: 1962
Perwerdehî: Dibistana Sereke
Karê wî/wê: Aşpêj
Dayîkbûn: Bêdkarê/ Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Xwe çêkirîne û gotine

18. Nav Paşnav: Hüseyin Kazak
Temen: 1951
Perwerdehî: Dibistana Sereke
Karê wî/wê: Teqawid
Dayîkbûn: Elbak
Ji kî guhdar kiriye: Ji Hecî Brahîmê Şikakî yê dengbêj

19. Nav Paşnav: Fahri Ücar
Temen: 1979
Perwerdehî: Zanîngeh
Karê wî/wê: Şûnwarnas
Dayîkbûn: Colemêrg
Ji kî guhdar kiriye: Ji mezinan

20. Nav Paşnav: Asım Özcan
Temen: 1983
Perwerdehî: Dibistana Amadeyî
Karê wî/wê: Pişeya Serbest
Dayîkbûn: Gundê Biyadir/ Çelê
Ji kî guhdar kiriye: Ji dapîrka xwe ya Begê

FERHENGOK

Ara	: navber
Bal	: bang
Balîf	: pate, qumaş
Bar	: bahr, pey
Barkey	: li gorî kesê ‘tu’ ‘barkirin’
Begenkir	: ecibandin
Bejî	: parçe
Berakiya wi	: pêşiya wî
Berket	: li xwe kirin
Bêpaz	: binpêkirin, pelixandin, perçiqandin
Biçûk	: zarok
Bihal	: hemle, ducanî
Birsî	: birçî
Bîm (bim)	: kund, bum
Bo çi	: çima
Ca	: wekî ‘ha’
Cab	: bersiv
Can	: delal
Canemerg	: berfîn
Cihêl	: ciwan, tolaz, xort
Cih înanandin	: cih anîn, pêk anîn
Cuk	: co, erx
Cun	: bir, beş
Çalkî	: çal bikî, binaxkirin
Çekêt	: çakêt, saqo
Çi	: tu(tuşt)
Çi kes	: tu kes
Çîte	: kurteya bikaranîna lêkera ‘çûn’ ya dema bê (biçîte)
Çûçik	: çivîk
Çûne jorî da	: çûne hundir de
Çoho	: dengekî gazîkirina sewalan
Da	: ku (da ku)
Da, day	: dayîk
Danandin	: daêxistin
Danişt	: kêlek, tenişt
Derben	: şilîta girêdanê
Destecohnî	: mîrku, serconî
Dev	: cem, nik
Dê êre ve dê wê ve	: bi şikleke, riyek jê re dîtin
Dindil	: dildil (hêstira Hz. Elî), hespê rehwan
Dirum	: rewş, hal
Dûv	: li pey
Edet	: dab
Ersek	: erse, pag, cih
Ertoşî	: navê konfederasyona danzdeh eşîran

Ev e ne	: ev ên henê
Evda Xwedê	: gazîkirina jinê ji aliye mêrî ve
Evdê Xwedê	: gazîkirina mêrî ji aliye jinê ve
Eywank	: şaneşîn
Êk û du	: hejmar ‘yek-du’, hevdû
Êqîn	: yêqîn, bawerî
Fotraf	: wêne
Girtika	: girtigeh
Girka Paganê	: meheleyek e li navenda Colemêrgê
Gurgo	: kurtahiya navê Gurgîn
Haj	: hay ji
Harîkirin	: alîkarî, alîkarbûn
Hebik	: hevokê de wate ya ‘hinek bi lez’
Heçkû	: wekî, qey
Helhelok	: belalok, hilalk
Hesu	: mil, rex, kêrî
Heves	: meyl, daxwaz
Hilquta, daquta, vequta	: lotik dan, teperep kirin
Husa	: wiha
Hûlî	: cureyek alûçe
Ho li te kirin	: xeberek e, dijûnek e.
Înan(-dîn)	: anîn
Îstikan	: perdaq, qedeh
Ji bilî	: ji xeynî
Karşî	: hember
Kever	: belek, reşûspî
Kiran	: navê meheleyeke li navenda Colemêrgê
Kîşk e	: kî ye?
Kilamê qedîm	: qur’an
Kolayî	: hêsa, rihet
Kujkelok	: di devoka Geverê de gotina ‘biçûçik, herî biçûk’
Kulm	: mistî, gulmişk, li vir kûratiya çavan teswîr dîke
Lalê, lalî	: li cem, li nik
Latîf	: xweşik
Leke	: pinî, pîsî
Leq	: gez
Lêj	: lûlav, şilope
Li rast	: li hemberî
Malmidûn	: delal, xweşik
Mehluqek	: afirandî, mahlûkat
Mehsan	: cureyek pêlavên nerm e ji bo nivêjê tên bikaranîn
Mektup	: name
Mêgulî	: kulîlka qesar
Milî	: navê eşîretekê
Mihte	: rihet, li gorî dil
Mihuba	: yar, dost
Mirtîka	: goristan
Miseletbûn	: museletbûn

Mohra reş	: qeder
Navbeyn	: navber
Nehe, nihe	: niha
Nerake	: neyîniya lêkera ‘rakirin’ ê.
Nesax	: nexweş
Neşêt, neşen	: neyîniya lêkera ‘şiyar’ ango ‘kirin’ ê.
Nik	: cem
Nûka, nûke	: ji nû ve, vê demê, vê gavê
Paz	: pez
Perîşe	: bêhal, reben
Pirt	: parçe, pişk, pare, qet
Pişya	: xwarin
Pîroda	: navê taxeke li Colemêrgê ye
Qalê Bêgarê	: derdê ser hewiyê tê kişandin
Qat	: bedle, bedil
Qederek	: bîskek, qasek
Qenber	: köleye Hz. Elî yê balê nediqetiya, yê dilsoz
Qesteman	: navê gundekê ye.
Qibhîn	: qetûn, qetbûn, jêbûn
Qifil	: kilîl, mift
Qiyas	: çiqas
Qisê	: goşe, kunc
Qulupîn	: çilmisîn
Qurma	: parêzvan, muhafiz
Ratib	: diyariya rêwiyan, xwarina wan
Rije	: roje
Sanahî	: hêsa
Simsimîn	: bi qurnazî fikirîn
Son	: dawî
Spêdê	: sihar
Sturuk	: stu, gerden, qirik
Şîbî	: wekî
Şîrêj	: li herêmê tiştên ku bi şîrî tên çekirin ve tê gotin. Wekî mast, dew, penîr.
Şûrhe	: lêf, pesar
Taze	: ciwan, xweşik
Tereqandin	: xarandin
Tiyar	: geliyekê Colemêrgê ye
Tûtirk	: tureşk
Vequtandin	: pelaxtin
Vêca	: ji ber vê
We kirin	: wisa kirin
Wesa	: wisa, bi wî awayî
Xelîla	: gundekê li Colemêrgê
Xemîrok	: şekirok, noqil
Xêr û xêrewat	: bexş û tiştên pê bexş dikin
Xwu	: xwe
Yaş	: temen, emr

Zelam, zalam	: zilam
Ziryok	: zîncîreke bi zîv û belbîk e, têxin poşî û kemeran.
Zivirandin	: lê vegerandin
Ziyan	: baxçeyê dexlî an jî yê oncê.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



Tez Başlığı / Konusu

13/12/2019

DI ÇİROK Ê STRANÊN GELÊRÎ YÊN COLEMÊRGÊ DE NASNAMEYA JIN

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 183 sayfalık kısmına ilişkin, 13/12/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından %2 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı %2 (Yüzde İki) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

13/12/2019

Hatice ÜCAR
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı :Hatice ÜCAR
Öğrenci No :14950001007
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

13/12/2019

ENSTİTÜ ONAYI
UYGUNDUR

13/12/2019

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Anabilim Dalı Başkanı